
Cîhan Roj

Meşa Morîyan



Roman

EVRENSEL
BASIM
YAYIN



EVRENSEL
BASIM YAYIN

Cîhan Roj



Meşa Morîyan



Roman

DOĞA BASIN YAYIN
Dağıtım Ticaret Limited Şirketi
Tarlabaşı Blv. Kamerhatun Mah. Alhatun Sk. No: 25 Beyoğlu/ İstanbul
T: 0212 255 25 46 F: 0212 255 25 87
www.evrenselbasim.com - info@evrenselbasim.com

Evrensel Basım Yayın **419**
Rêza Pirtûkên Kurdî **5**

Meşa Morîyan: Cîhan Roj

Redaksiyon: **Çiya Mazî**

Tashîh: **Cemil Oğuz**

Dîzayna Bergê: **Savaş Çekiç**

Amadekirina Bergê: **Devrim Koçlan**

Xêza Berg: **Avavan Merrdo**

ISBN **978-605-4156-57-3**

© Evrensel Basım Yayın 2011 - Sertifika No **11015**

Çapa Yekemîn Gulan 2011

Baskı: Ezgi Matbaası
Sanayi Caddesi Altay Sokak No: 10 Çobançeşme - Yenibosna / İstanbul
T: 0212 452 23 02 - 654 94 18 - www.ezgimatbaa.net - ezgimatbaa@mynet.com



Meşa Morîyan



Her ku gotinên me di lehiyan de dibûn peqik,
me dilê xwe jî diguvaşt û em dizanin dilê
sivik, piştî guvaştinê jî, biskek ji pembû ye...

1

Li rengê dûr dinihêrî. Bi wate bêwate difikirî. Bi nav xeyalan diket. Li dû xeyalan, pirî caran, bi heman halê sivik, nêzikahî li kevirê piçûk dikir. Bi kevir re diaxivî:

"Tu aîdî min î. Bi tevî rengê xwe… Gerçî halê te jî ne hal e…Baş e ku halê te ne xema te ye; telş li te bikevin, tu parçe bibî, bipişirî ne xema te ye… Dawiya dawî tuyê bibî ax... Çêtir e ji bo te. Hîç nebe wê rehên kulîlkan xwe li te bidin der.

Texmîn dikim; tu aniha bi ser zar û ziman biketiya teyê çi bigota. Ne texmîn e, pê dizanim.

Ax, ku însanan bizaniya bê tu di nav xeyalên min de çawa diaxivî, çi û çi dibêjî ji min re…Ku mirov bizanin bê carna çi gotin ji te dertên…Carna mirovên bêdeng dişibînin te; ev neheqiyek e…

Îca, xwe qure meke kevirê piçûk; behsa rabirdûyê meke. Nebêje wextekê ez jî zinarek bûm! Bi vî halî, niha, tu kevirekî piçûk î. Li ser navê te jî diaxivim. Dizanim, însan wextê li ser navê kevirekî jî biaxive ne baş e. Tişt pê nayê, her ez û tu ne.

Ha, carna xweziya xwe bi te tînim; çi xweş; ne xema te ye bê saet çend e, ji rojan çi roj e… Wê mehek din, saleke din jiyan çawa be…

Baş e ku tu heyî; tu û siya dîwêr ji bo min bûne sebir! Heya baran bibare, hewa sar be wê halê me ev be, dostê min! Kevirê piçûk!

Tu çêtir dizanî, halê min ne tu hal e; bi tenê me, bêrî dikim. Hez dikim. Diayan dikim da ku hezkiriya min jî wekî min ne bi hizin be…

Heya niha, her roj, min xewnên xwe ji te re vegotin. Min kêmaniyên xwe yek bi yek ji te re gotin. Tu saxlem î ji alî sir û razan ve! Carna dişibim te, ne bi bîr tînim, ne difikirim. Xeyal li min sar dibin. Dilê min dibe kevirek di nav bedena min de.

De ka van pirs û dengan jî ji min bibihîze; ez kî me? Çi karê min heye li vir? Kê ez şandim vir? Dil û jiyana min li deverekê, ez li vir, ma ezê karibim bextewar bim? Ka newayên kûr? Ka dengê şîrîn? Ka gotinên xweş ên yara min?

Ji min re dibêjin, wextekê, li van deveran, bi tevî eşqê her tişt hebûye. Ev gund û Heskîf ciyê eşqê bûne. Însanan bi bêhnên rezan re hev û du maç kirine… Tu zanî, pirî caran jî bextewar im li vir; hêviyên van însanan hene. Bi tevî her tiştî ew bi henek in.

Di şevên dirêj de ez wan jî difikirim. Însanên min in lê ez li jiyaneke din digerim! Hezkiriya min maye li ciyekî din… Nabe, ez neaxivim çêtir e! Ev tevlîhevî… Ev hal, nabe, qet nabe!..

Bibêje kevir, tu ji min re peyvan bêje. Ez dixwazim du hevokan lê bikim. Bi tenê du hevokan…”

Piştî bi kevirê li pêş xwe re axivî, xweşhaliyekê xwe lê da der. Enîşka li ser çonga xwe bi cî kir. Dest da ber rû. Bi destê rastê jî li çîpa xwe dida. Ji aliyekî ve jî bi peyv û hevokan re mijûl bû; du sal bû daliqibû serê Mîralî yê bîst û sê salî; dixwest du hevokan lê bike û ew hevok bibin navê jiyana wî!

Hew du hevok! Ji bo wan hevokan her carî li peyvan difikirî. Pirî caran bi awayê rastgele peyv dibijart. Di xweşhaliya xwe de peyvên sivik dibijartin. Peyvên ku zarokan bikar dianî her wext bala wî dikişandin. Ger bi awayê cidî li meseleyê bifikiriya wê çaxê jî peyvên di jiyana wî de şop hiştibûn dibijartin.

Ew hal ji lîstikê bêtir ji bo wî bûbû mijûlahî û hobiyek. Bi her peyvekê re jî xeyal dikir. Dîsa bi dehan peyvê re mijûl bû. Bi nav xeyalan ket. Xeyalên xweş û sivik. Pirs ji xwe kir: "Gelo jiyana min bi du hevokan tê derkirin?"

Jiyana xwe fikirî. Diya xwe, bavê xwe, herî zêde jî keçikê, keçika ku dibû sedem ku Mîralî her xem bixwe. Bi tevî xeman, keçik dibû sedem ew her şev xewnan bibîne. Xewnên sar. Xewnên xweş.

Wextê di xewnan de nedigihişt asîman, dibû çivîk û li ser daran datanî. Lewre jî ji çivîkan gelek hez dikir. Wêneyên xweşik yên çivîkan saz dikirin.

Dîsa bi nav xeyalan ketibû. Çivîkek hat. Hinek dûrî wî, bi çîveçîv, bi wan deveran ket. Erd dida ber nikulan. Mîralî hinekî li halê çivîkê nihêrî. Çiqas hewes dikir ku çivîk hîç ji wir neçe. Nizanibû ji ber çi bû; çi wext çivîk bidîta, bayê hênik bihata an jî sewtek kilaman dibihîst diya wî bi bîra wî dihat.

Kenekî şîrîn xwe li wechê Mîralî da der. Her ku diya xwe bi bîr dianî li derdora xwe dinihêrî da ku jinekê bibîne û bi ser halê wê de bifikire. Peyvên ku xwe di hişê wî de bi cî kiribûn 'dê' û 'jin' bûn. Serî rakir, nihêrî. Tu jin nedît.

Ji Mîralî bi qasî sî metreyî dûr keçikeke pênc salî li ber derî bû. Bi derî digirt bi çîzeçîzek bi rîtm derî vedikir û dadida. Halê keçikê ê berêvarî her roj wanî bû; heya bavê wê ji alî rezan de xuya bikira wê wanî dikir.

Piştî bavê xwe didît, bi heyecan û dilxweşî direviya. Bavê wê hejîra herî rengteyîsok û guşiyekî tirî dida dest wê. Wî wextî keçikê li Mîralî dinihêrî. Mîralî dest ji bo wê dihejand. Bavê keçikê wekî her carî ji Mîralî re digot:

"Xoce, ez bi gorî, hindik ma, wê Siltan bibe telebeya we, ne?"

Mîralî, "Belê, ger Siltan wanî fêkiyan bixwe wê keçikeke delal û jîr be. Jixwe bes bedew e. Wê hevalên wê jî gelekî jê hez bikin." digot bi kurmancî. Keçikê dest pê dikir hejîr û tirî

dixwar. Bavê keçikê xwest hinek fêkî bide Mîralî. Rabû ser piyan Mîralî, ber bi zilam ve meşiya, bi dengekî nizm sipasiya wî kir:

"Malîava keko, li lojmanê pir e, her kesê ji rezan tê dixwaze fêkî bide min. Hin jê jî bi israr in. Ez neçar dimînim bigirim. Heyf e; ez bigirim wê birize. Bibe mal. Soz didim ger xilas be ez ê ji te bixwazim."

"Bavê keçikê, binihêre, gunehê te li stûyê te. Gerek şerm tunebe ha", got û çû.

Mîralî dîsa li ser kevirê li bexçeyê dibistanê rûnişt. Jê re bexçe dihat gotin lê tu dar tê de tunebû. Mîralî soz ji gundiyan girtibû ê darên mêweyan biçandina.

Çi kesên ji nava rezan dihatin silav li wî dikirin. Bi kurmancî li halê wî dipirsîn. Dixwestin fêkî bidin wî. Mîralî sipasiya wan dikir, ew diçûn. Wê rojê kesî israr nekir. Wextê israr nekirin Mîralî kêfxweş dibû; car hebû israra wan Mîralî bêzar dikir; hin kesan wextê fêkî didan wî ji her kesî re behsa qenciya xwe dikir, dayîna fêkiyan dibû mijara sohbetê.

Mîralî li heman hêlî kûr û dûr dinihêrî. Gelek wext bi wî awayî dima. Dixwest rihê wî ji bedena wî derê û bifire. Hukmê bê yê hênik ku ji geliyê rez û fêkiyan de dihat ew mest dikir. Ew hal dibû sedem hinekî bêhn li wî fireh bibe.

Bi tevî bedena westiyayî bi xeyalên kûr de diçû. Nizanibû ji ber çi bû, bedena wî ew qas bêhal dima, wate li westa bedena xwe nedigirt. Dixwest li erdê vezele.

Bi xeyalan re westa bedenê ji bîr dikir. Lê carna xeyalên wî êş dida wî. Wê çaxê dixwest di navbera xwe û xeyalên xwe de dîwêr lê bike; radihişt darikekî û erd xêz dikir. Ger we ji wî bipirsiya bê ew bi çi xeyalî re mijûl e, wî ê navê dildara xwe ji we re bigota. Ji bilî wê ê bigota, ez dizanim, ez her bi xeyal im. Çi heyf e ku nikarim xeyalên xwe bi nav bikim!

Halê Mîralî bi gundiyan bi seyr dihat. Halê wî şîrove dikirin:

“Ev çi hal e, qey derdê xoceyê me heye?”

“Xort e, belkî jî ditirse. Melûm e, şer e. Beriya çendekê mamosteyekî esilkurd hate kuştin.”

“Ma bitirsiya ji bo çi heya qatê şevan li derve, bi wî awayî, wê rûnişta.”

“Her roj halê wî ew hal e. Piştî ji dersê dertê bi xortan re gogê dilîze. Li ser wî kevirî rûdine û bi alî şikeftê ve dinihêre.”

“Mîna li benda tiştekî be.”

“Xeyalên xortanî ne, ne ji ber tiştekî ye, normal e heyra.”

Tarî ketibû erdê. Çardeh cerdevan hatin li pişt dibistanê bi cî bûn. Li gorî zagonên wê çaxê, ger hejmara cerdevanan ji bîstî kêm bûya gerek leşker jî bihatana. Bi qasî deh heb leşker jî ji qereqola Heskîfê ji bo nobedariyê hatin. Mîna neçar bin, silav li Mîralî dan û çûn paş dibistanê.

Mîralî çû lojmanê. Ji bo çay av kir demlikê û da ser tûpa piçûk. Dem avêt avê. Bêhn li xweşiya wî çû. Henaseyek kûr kişand û bêyî hemdê xwe, oxxx, got. Di wê navberê de hinekî nan û tirî xwar. Ji bo tehm ji çay werbigire loqa nan a dawî bi penîr xwar. Dengê cerdevanan bi ser Mîralî ket. Gef li Mîralî dixwarin. Qaşo di navbera xwe de diaxivîn lê bi qestî deng bilind dikirin:

“Însanê meaş ji dewletê bigire gerek karibe ji me hez bike!”

“Em ji bo hinan kuştinê didin ber çavên xwe. Ji dilê wan nayê carê şûşeyek çay bidin me.”

“Heyra mamosteyê me yê beriya du salan çi zilamekî qenc bû; bi me re bi kêf û bi henek bû. Bi me re bi kaxizan dilîst, çay dida me... Ew jî kurd bû lê hema însan bû ha!”

“Osman ne tê de ha! Osman ji me hez nedikir. Baş bû ew cehimî û çû Heskîfê.”

“Ka dev ji me berdin. Hin tenezul nakin biçin mala mixtêr jî. Mixtar hem bi nav û deng e, hem jî sercerdewan e!..”

Mîralî gelek şevan gotinên wanî dibihîstin. Hîn bûbû. Xem jî nedixwar. Bi ser guh ve dikir. Wextê cerdevan wanî diaxivîn wî bi halê xwe ê bêxem difîkand. Fîkandina wî bêtir kîn û nefret dikir dilê cerdewanan. Xwe bi xwe," Tişta tu dikî ne mêranî ye, kuştina însan li van deveran, bi qasî pênc qiruşan erzan e. Tu êdî mezin bûyî, dev ji rika xwe a zarokatî berde" digot. Mîna bi awayekî li benda mirinê be," Mirin ji dînbûnê çêtir e, ger ez her şev li mirinê bifikirim ez ê dîn bim." digot. Dida ber dilê xwe.

Şevên bi wî ne sar bû ne jî germ. Şevên bi wate, bê wate. Şevên bi deng, bêdeng. Şevên bi xeyal... Carina hîs dikir ku şev hew ji bo wî heye. Ji bo her kesî roj e. Şevê ji bo wî dinya-yek din ava dikir. Şev hebû xem dixwar. Şev hebû bêxem bû. Mînder xist navbera stûyê xwe û dîwêr. Nebû. Mînder xist bin çengê xwe û bi serkêlekî vezeliya. Hinek wext çû. Ew hal jî li xweşiya wî neçû. Mînder rastgele avêt erdê. Serî danî ser û serpiştî vezeliya. Xew bi çavên wî nediket. Xwest xwe li xewê şîrîn bike. Di wê kêliyê de sako bi ber çavê wî ket. Sakoyê kevn û reng lê qimitî, li hember wî, li dîwêr hilawêstî bû. Li sako nihêrî. Sakoyê ku Esmayê ji bo wî kirîbû. Sakoyekî gewr bû.

Rojekê Esma, di tariyê de, dest avêtibû sakoyê wî da ew neçe. Mîralî ranewestiya bû. Li ber dara mandalîn, Esma bi awayekî zexm, sako vekişandibû û sakoyê wî çiriya bû. Roja mayîn, Esma bêyî dê û bavê xwe ji wî re ew sako kirîbû.

Her ku li sako nihêrî xem xwar, qehirî. Hêdî hêdî kelxwêdan bi ser wî ket; çend sal bû çîrokek di bêrîka sako de bû. Diqehirî, ji bo çi ew çîrok xweş lê nekiribû, goya dikaribû bi awayek serkeftîtir lê bikira! Halbûkî dizanî hew ew qas ji dest wî dihat lê dîsa jî diqehirî, ji bo çi çîrok bi wî halî lêkiribû. Bi tevî qehirînê jî ew çîrok ji bo wî bi qedr û qîmet bû. Hewl da ku rabe, ji bêrîka sako çîrokê derîne û bixwîne. Ji dil nehat. Esma, mîna li ber çavên wî be. Xem xwar Mîralî. Ji dilê wî nedihat ji bilî xeyalên ji bo Esma tiştekî din bike.

Esma bi şikil û şemala xwe hê jî li ber çavên wî bû. Mîralî mînder ji ber serê xwe rakir, da ser çonga xwe ê rastê. Enîşka xwe li ser bi cî kir. Dest da ber rûyê xwe. Bi xeyalan de çû. Kûr û dûr difikirî. Dixwest çîroka xwe û keçikê lê bike lê destê wî nediçû defter û pênûsê. Piştî çîroka di bêrîka sako de lê kiribû nema dixwest çîrokan lê bike; dizanibû wê dîsa bi sernekeve. Çi cara ku hewl dida lê bike, gotinên diruşmeyî û sayakî xwe didan der. Xwe bi xwe, de here lo, te jidil û bi mereq çend pirtûk xwendine ku tu yê karibî çîrokeke normal lê bikî.

Çîroka ku di hişê wî de diherikî bi halê nenivîsandî bêtir li xweşiya wî diçû. Wî ew hal ji bo xwe dikir hewînî û xwe ji fikra nivîsandinê dikir.

Keçik, çîroka di bêrîka sako de, peyva “mirin” û peyva “dînîtî” û “peyam”di wê kêliyê de hukum li wî dikirin.

Di qoziya odeyê de beton şikênandibû da wextê odeyê bişo av bi rihetî biherike derve. Morî di qulikê de dihatin. Ber bi tirî û hejîran rê didan xwe. Mîralî ji bo rê li wan bigire tu tevdîr negirtibû; ew halê gêreyan li xweşiya wî diçû. Carna jî êvaran rê li gêreyan digirt da ew nikaribin biçin derve û di odeyê de biçin û bên. Bi wî hawî jî hewîniya xwe dianî. Di odeyê de dîsa morî diçûn û dihatin. Mîralî mîna bi gêreyan re biaxive dest bive gotinê kir.

2

"Ez çardehsalî bûm. Di sala hezar û nehsed û heftê û heştan de bavê min em birin metropolekê. Li welêt, bavê min bi sîyasetê re mijûl bû. Wê çaxê sîyasetmedarên kurd hevudu dikuştin. Bi bîra min tê, bavê min şevekê bi wate, kûr û dûr, bi fikar li min nihêrî. Ji nişka ve, em ê bar bikin, em ê biçin metropolê, got. Diya min, hem metelmayî ma, hem xemgîn bû û hem jî dilşad bû. Piştî wê bi heftiyek du hefte em çûn metropolekê.

Ez di nav heyecanekê de bûm. Bi bejn û bala xwe beled bûm. Wê derfet biketa destê min da ez jî bibim artîst. Minê bi Turkan Şoray re di fîlmekê de cî bida xwe. Çavên wê ez dihelandim; dizanibû bi her hawî binihêre; nêrînên sert ên bi şewl, ên bi rehm û peroş. Wexta bi hêrs diket ew çav dibûn topa asîman. Ku bi hezkirî dinihêrî însan dixwest ber bi perdeyê ve bimeşe û wan çavan li ser perdeyê ramûse.

Li metropolê, em di askorekê de bi cî bûn. Li hemberî xaniyê me qubeyeke bê "çan" hebû. Xaç xuya dikir. Qube xerabe bû. Li pêş qubeyê dara qajê û darek mandalînê hebû. Qadek piçûk wek beyar bû.

Bavê min her ji min û diya min dipirsî bê ew dever li xweşiya me diçe an na. Me, mîna kesên ji bayê felekê ne haydar, her carî, belê, gelek xweş e, digot. Hê ji rojên pêş de xuya bû bavê min xem dixwar û ne kêfxweş bû. Carna dida der, min

hevalên xwe li cî hiştin, ez ne ew kes bûm da bêbextiyê li hevalên xwe bikim. Ji bîra min naçin. Ez ji bo berjewendiyên şexsî reviyam, digot. Ku li min dinihêrî, hinekî bêhn bi wî diket, min çi kir ji bo te kir delalê min, digot û kitêb dixwend. Carna heya destê sibehê jî kitêb dixwend.

Rojeke şemiyê bû, bi peroşî ket hundur. Bang li diya min kir, Amîne, çawa ez heya niha nefikirîm keçê, çawa… Diya min ew hal wekî ku bavê min karekî çêtir dîtibe şîrove kir. Min dizanî da tu karekî çêtir bibînî gote bavê min. Bavê min, na, xema min ne kar e, çi kar be ez ê bixebitim. Keçê, ma heya dil û hişê însan bi derd û kul be însan dikare dilşad be?

Min ji te re behsa rûspîyekî kiribû, bi bîra te hat? Pirsî. Diya min, belê, got. Bavê min dom kir, wî îro ez birim mala xwe. Ew bi salan e li vir bi cî bûye. Ew bi Soranî dizane. Di meseleya "Çil û Nehan" de ew li Mûşê li Varto mamoste bûye.

Wan çaxan, di nav gel de, wekî kesekî têkoşerê ziman û çanda kurdî hatibûye nasîn. Rayedaran, ji ber tesîra gengêşiyên derbarê wî de, wekî tevdîr ew sirgûnî Bodrûmê kirine. Bi salan, her roj, çûye îmze daye. Piştî teqawit bûye, hatiye li vir bi cî bûye. Li mal pirtûkxaneya xwe rê min da. Ji Hawarê bigire heya çend hejmarên Tîrêjê, helbestên Seyda, Mem û Zîn û gelek weşanên din rê min dan. Dû re, ji min re got, li van deveran xwe bêyî mijûlahî nehêle. Bi ziman re mijûl be. Ji destê te tê binivîsîne. Ez êdî kal im. Bi dehan bîranînên min hene, di demên pêş de lê bike. Ev e, Amîne, xemên ku ez bixwim siviktir in êdî. Bi saya wî camêrî.

Bavê min kêfxweş bû. Bi kêfxweşiya bavê min re per û bask bi me ve hatin. Zeman diçû. Rojekê me dît malbatek hat di xaniyê kêleka xêniyê me de bi cî bû. Heman êvarê diya min û jinika ku êdî bûbû cîrana me a bi navê Edûl hevudu nas kirin. Keçikeke wan hebû. Esma.

Êvarî wexta bavê min hat, diya min behsa cîranên me ên nû kir. Bavê min çawa pê hesiya ku ew kurd in pekiya ber

derî, bi coş, rabe Amîne, em biçin li halê wan bipirsin, got. Ez jî bi wan re çûm.

Bavê min bixêrhatin da wan. Li ser piyan pirsî bê tu hewcedariyên wan hene an na. Edûl nema li benda mêrê xwe: "Mala we ava, ma wê kî karibe hewcedariyên me bi cî bîne; ev hal e, em ji welatê xwe koçber bûn. Mala wan ne ava. Nehiştin mêrê min li wir bijî... Hê jî nizanim doza çi dikin, guleya bira di kezeba birayê din de ye. Herdu alî jî kurd in, hê nikarin derdê xwe ji hev re bêjin..."

Li dû gotinên Edûlê, serê bavê min, ê zilamê wê, serê diya min ket ber wan. Kêliyekê fikirîn. Dû re bavê min û zilamê Edûlê hin tişt ji hev pirsîn. Mîna bi kod û şîfre bin axaftinên wan. Ji nişka ve herdu ketin halekî nebaş. Mad li wan tirş bû!

Bavê min, bi dilsarî, "ka em biçin" got û xwe li derî girt. Mêrê Edûl çûyîna me ji bo xwe nekir xem û tişt negot! Li mal, bavê min bi awayekî cidî, gerek hûn neçin mala wan. Ew kes dijmin e, ne ji sîyaseta me ye, got!

Diya min û Edûl her ku fersend didîtin diketin nav sohbetê. Ez û Esma jî diçûn bin dara qajê û dara mandalînê. Ji bilî me herdu malbatan tu malbatên kurd tunebûn li wir. Diya min û Edûlê şîret li min û Esma kiribû. Me tu car behs nekir ku em bi sohbet in.

Piştî wextekê ez û Esma bûn dildarên hev. Çend caran diya min xwest bi bavê min bide hîskirin. Agir ji wechê bavê min barî. Wext derbas bû hê Esma haya min jê çê kir ku bavê wê jî heman bertekî rê daye, gelek qehiriye. Bavê min û bavê Esma hê jî du "welatparêz in" û nahêlin em bizewicin, sond xwarine ku ez û Esma bizewicin ew ê tiştên wanî bikin ku kesan nebihîstine! Îja ez hê jî naxwazim xwe li rê û rêçikên bavê xwe û bavê Esma bigirim; aniha, li van deveran, ez dibim şahid ku hin tiştên bavê min gotibûn jî ne belesebep bûne, lê wan nehişt evîna min û Esma Şîn were.

Esma. Esma ya ku ez niha gelek bêriya wê dikim. Çiqas ji

min hez dikir. Di êvarên hênik de bi dengekî şîrîn û heya hûn bêjin nizm û melodîk peyvên xweşik digot ji bo min. Çiqas bi xeyal bû. Her carî em bi tirs bûn. Hezkirina bi tirs bû evîna me. Tirsa bavan nahêle ez û ew, deng bi xwe bixin. Dengê hezkirinê. Nizanim, ez ê karibim carek din wê maçî bikim. Ê henaseya wê ji şewata kezeba min re bibe hênkayî. Nizanim. Qey belesebep e ez her bedewiya wê bi bîr tînim…

Dizanim ew jî aniha bi daran re diaxive. Li bin darên ku cara pêşî me hevudu ramûsa bû. Aniha li wir, belkî jî bi hêviyên xweş û gotinên xweş diaxive. Esma ne wekî min e. Ew bêtir bi hêvî û bi biryar e. Esmaya henûn, bi biryar. Esmaya delal û bedew. Wê sond xwar ku ew ê her dildara min be. Min tu car ji bîr neke lê tu car jî evînê li xwe neke derd û kul.

Ev e, min li xwe kiriye kul û êş. Îjar mirin peyvek xerab e qey? Ez li van deveran bimirim wê Esma mêr bike, bextewar be! Ez nemirim jî ezê dîn bibim."

Rawestiya. Mîralî mîna ku rê li ber xwe bixe, dîntî, belê dîntî tişta herî li rê ye, got. Ma hewce ye ku însan bira bira dîn bibe? Ezê karibim xwe li dîntiyê deynim! Mîna dînekî tevbigerim. Bi wî awayî wê pêsîra min ji her tiştî xilas bibe! Lê ezê bibim dînekî çawa?

Mîna xwe qanih nekiribe hinek bêdeng ma. Rabû ser piyan. Qutîkek piçûk a lekî ku tê de hejîr hebû vekir û danî goşeyê odeyê. Çend heb jê bi tevî hinekî nan rastgele avêtin erdê. Dixwest morî her xwe lê bigirin. Li hejîran bicivin.

3

Dil li xwe xweş kir da biçe Heskîfê. Êdî dereng bû. Hinek bi metirsî çûyîna Heskîfê fikirî. Biryar da. Elektrîk vêxistî hişt. Hêdîka derî da cî û meşiya. Li navbera gund dengekî bi hêrs û qube ê bi emir bi ser wî ket: "Raweste!" Mîralî fam kir ku leşker ên nobedar in. Meşiya. Deng carek din bi serket: "Raweste, tu kî yî?" Mîralî dizanibû leşker in, bi qestî wanî dikin lê dîsa jî, "Karê wan belî nabe", got û rawestiya. Tîqîn bi leşkeran ket. Hatin cem Mîralî. Pirs ji wî kirin bê ewê bi ku de biçe. Mîralî gote wan ewê biçe Heskîfê. Leşker, "Berpirsiyarî bi aîdî te ye; di van şertan de tu ew qas bêxem î, ecêb e!" Mîralî mîna guh nede wî bi rê ket.

Bi qasî deh deqîqeyan meşiya. Li ser riya asfaltê bû. Li rawestgehê ma li benda erebeyan. Erebe nedihatin. Di wê wextê de hatina erebeyan jî zor bû. Kes newêribû di tariyê de bi rê bikeve.

Bi awayekî neçar bi hêvî ma li benda erebeyan. Ji ku bi bîra Mîralî hat wî jî nizanibû; jina cerdevanekî bi bîr anî! Carekê çûbû mala wan. Jinik yeka ew qas bedew bû Mîralî fedî kiribû ku li rûyê wê binihêre. Wê çaxê mîna heyfa xwe bi jinikê bîne, "ev zilam û ev jin", gotibû di dilê xwe de. Dû re haydar bûbû ku cerdewanî ew keçik bi darê zorê ji xwe re kiriye jin.

Her ku behsa cerdevaniyê dihat kirin ew jinik dihat ber

çavê Mîralî. Heman hal; jinik bi bedewbûna xwe li ber çavên wî bû dîsa. Mîralî nizanibû ji ber ku gunehê wî bi jinikê dihat lewre ew bi bîr dianî an nikaribû ew bedewtî ji bîr ve bikira. Xeyal dikir, di xeyalê xwe de didît jinik xwe dişo. Porê xwe şeh dike. Cil û kincên modern li xwe dike… Wextê jinikê bi halê wanî difikirî hem xemgîn dibû hem jî xweşhalî xwe di rihê wî de dida der. Ew jinik û gelek jinên bedew ên hunermend û bi nav û deng dida berhev. Dilê wî di nav wan jinan de ew jinik dibijart. Li dû xeyalan hew axîn bi wî diket. Axîn kişand. Ma bi dîmenên jiyanê û dîmenên xeyalî re.

Ciyê rawestgehê kaş bû. Erebeyên dihatin jî bi bar bûn. Barê wan neft bû. Ku şofêran bixwestana jî nikaribûn rawestiyana. Erebeyên bê bar jî, ji ber şerê diqewimî, newêribûn rawestiyana. Mîralî wekî çare elektrîka destan bi xwe re dibir. Wexta erebe dihatin, Mîralî elektrîka destan vêdixist û ditemirand. Mîna îşaret bide! Şofêr ji neçarî radiwestiyan. Wextê hay jê çêdibûn ku Mîralî mamoste ye wê çaxê bêhn li wan fireh dibû û wanî digotin, “Min dizanî tu mamoste yî, ne werê be, bi şev, em kesî nagirin.”

Erebeyek ji çivê de derket. Mîralî bi elektrîka destan dîsa îşaret da. Erebe çawa rawestiya bi qasî deh leşkeran dor li wî girtin. Li alî pêş serbazek hebû. Bi dengekî bi hêrs, “Tu kî yî?”pirsî. Ez mamoste me, got Mîralî.

“Ger tu mamoste bî ez ê te bibim?”

“Belê, ez mamoste me.”

Leşkerekî bi destûr, “Rast e serbazê min, ew mamoste ye, min ew li dibistana gund dîtibû.” got. Serbaz, xwest şîretê li Mîralî bike:

“Ev tiştê ku tu dikî ne rast e. Siwar be!”

Mîralî li Heskîfê çû mala hevalê xwe. Mala hevalê wî li ber serê pira nû bû. Di qatê duyemîn de rûdinişt. Hevalê wî Batmanî bû û beriya Mîralî ew li wî gundî xebitî bû. Li dû sohbetê hevalê wî xwest tiştekî ji wî re bêje. Xuyabû bêqirar

bû. A di dilê wî de tebatî nedida wî. Bi Mîralî beled bû. Xwe ranegirt:

– Mîralî, dibe ku ez xeletîyê bikim lê gerek ez ji te re bêjim…

– Te xêr e Osman? Ger muhîm be ji min re nebêje.

– Belê muhîm e, yaw ma ez ji te re nebêjim ez ê ji kê re bêjim; zilamek heye, te jî ew dîtiye, li qehweyê carna bi me re lîstikê dilîze, ew kesê bi bejn gelek dirêj, ew qas jî bi heybet e.

– Ew kesê ku her bêdeng e.

– Belê. Wî teklîf li min kir da ez bi rêxistinê re bixebitim. Ev çend roj in min tu tişt ji wî re negot. Ne şev bi min şev e, ne jî roj bi min roj e.

Mîralî bêdeng ma. Nizanibû çi bêje. Li ber şibakeyê rûnişt. Guhdariya dengê Dîcleyê kir. Bi qasî deh deqîqeyan wanî ma. Osman jî tiştek negot. Mîralî, li gorî xwe, gotinên herî li rê dît:

– Osman, ev tiştekî cidî ye. Ger tu nikarî wî barê hilbigirî rasterast bêje ji wî re, ez nikarim.

– Mîralî, em heman tiştî difikirin. Ez dizanim ji ber dirustiya min, wî ew teklîf li min kir lê dirustî di karên wanî de bi tena serê xwe ne bes e. Biryara min êdî zelal e, got Osman.

Mîralî, bêdeng, guhdariya dengê Dîcleyê dikir. Carna jî li lingê pira kevn dinihêrî. Osman pirsa Esma ji wî kir. Mîralî, heman hal e, got. Osman, de rabe em biçin lokalê, got.

Her du meşiyan. Ji ber ku li wî cihî bîra dihat firotin lewma jê re, lokal, dihat gotin. Ji gel tu kes nediçû wî cihî.

Rûniştin. Poşmaniyekê xwe li Osman da der; li quncika lokalê sê kes rûniştibûn. Bi devkenî û mîna hurmet li Osman bigirin dest bilind kirin. Osman mîna halê neçaran silav li wan da. Wan bîra vedixwar û bi dengê bilind diaxivîn. Osman bi kurtahî çîrokên wan kesan, ên ku li wan deveran gelek erzan bûn, ji Mîralî re vegot:

– Ê bi şebqe kes nizane ji ku ye. Çi gotinên şîrîn hene ew dikare bike. Çi xirabiyên sosret jî hene ew di nav de ye. Ê din beriya Donzdehê Îlonê xwe li doza kurdî girtî ye. Niha ji bo qirêdiya çewlikê bi dest bixe her şelafî û sosretî dike. Ew jî gundiyek e. Ê mayî di saziyek dewletê de karker e. Ev her sê kes li Heskîfê, ji alî her kesî ve têne nasîn! Ji bo bi qehpikan re razên heya Dîyarbekir diçin. Bi qasî bi ber guhê me ket, ew bi şev li derdora Silîva tevlî operasyonan jî dibin. Li vî ciwarî, hew her sê bûne nîşana nerindiyê. Ew kesê nenas pirî caran li malên herduyên din dimîne. Her sê jî însanên binkî ne. Mîralî, min fam nekir, got. Osman, yanî çi tiştên xirab û nedîtî hene ji bin serê wan der tên.

Ji wan jê yek, di dest de bîra, hat li cem Osman û Mîralî rûnişt. Deng li garson kir da bîra bîne ji wan re. Osman nehişt. Ew kesê ku beriya Donzdehê Îlonê xwe li sîyasetê girtibû çi gotinên bijarte hebûn digotin. Osman jî mîna hîç wî nenase tevdigeriya. Ew halê Osman li xweşiya wî diçû. Bi awayekî sohbet anî ser mamosteyekî. Ji Osman re got:

– Osman, ez gelek ji mamoste Mehmûd hez dikim. Ez haydar im ku wî beriya donzdehê îlonê bi çek şer kiriye. Bi çek li derdora Qoserê gund bi gund gerîya ye. Di Donzdehê Îlonê de nasekî wî yê leşker hebûye. Bawer dikim leşker nasê xanima wî bûye. Wî leşkerî nehiştiye tişt bi serê wî were.

Osman, “Ez nizanim, hayê min jê nîn e, bê çi kiriye çi nekiriye.”

– Ez dizanim misilman, ez wî baş dinasim, lê ecêb e ew niha nimêj dike!

Osman bi wateya van gotinan dizanî; ev kes bi dû ketibû da di derbarê mamoste Mehmûd de agahî berhev bike. Osman hewl da, bi awayekî, şika wî bi avê de bibe axivî:

– Însan e, normal e.

Wî gelek gotinên din jî kir. Dît ku wê tiştekî bidest nexe, êvarbaşî li wan da û çû.

Kesê bi şebqe her carî li Mîralî dinihêrî. Her ku dinihêrî mîna merhemet û şewqet xwe li rû wî bide der. Çend caran Mîralî nêrînên wî zevt kir lê xwe li wan nêrînên biwate nekir xwedî.

Osman û Mîralî nedixwestin sohbetê xweş bikin; piştî çay vexwarin, rabûn û çûn. Li nêzî pirê qereqol hebû. Piştî pêncê êvarê konvoy hebû; çi wesayît bihatana dihatin rawestandin. Dû re, bi leşkeran re, ew konvoy diçû Batmanê. Erebeyên ji hêla Batmanê ve dihatin jî bi awayê konvoy heya Mîdyadê diçûn. Osman behsa serbazên qereqolê kir:

– Serbazekî tirk e, ê din kurd e. Kesê kurd pirî caran şofêrên hemwelatiyên xwe dibe qereqolê û li wan dide. Ji welatiyên xwe nefret dike! Beriya çendekê, bavê wî hatibû serdana wî. Digotin bavê wî bi tirkî nizane.

Mîralî axînek kişand û hew.

Li mal, Mîralî li ber şibakeyê rûniştê. Çav li lingên pira kevn, guh li dengê Dîcleyê bû dîsa. Esma, xemên ji bo Esmayê û lêgerîna çareyan. Osman, haydarî halê wî bû, xwest wî ji xem û xeyalan bike:

– Mîralî, çer çawa be sibe û dusibe betlane ye, ka em pîlanên xwe bikin.

– Tu çêtir dizanî.

– Em sibehê wextekê biçin cem kesekî ku mayîndeyan difroşe. Piştî nîvro em ê goşt û zebzeyan bikirin. Mam Adil bila amade bike û biavêje firinê. Em ê bibin li keviyê Dîcleyê bixwin.

– Ê ji bo min baş be. Ez gelek aciz im.

– Te xêr e lawo, ev hê salek e te dest bi mamostetiyê kiriye?

– Nizanim, aciz im û ez ê nikaribim mamostetî bikim!

– Ev serboriya me gişan e, em giş mîna neçar bin vî karî dikin, li çareyên fantastîk digerin lê wext jî dibore û em bi heman halî dijîn.

– Ka bila sibeh li me bê ez ê xemên te li te sivik bikim.

Mîralî li ber şibakeyê ma. Bi yekcarî gotin birî. Dengê Dîcleyê lorîkên dayika wî bi bîra wî dianîn. Mîna di zarokatiya xwe de, serî danîbe ser çongê diya xwe, diya wî jê re behsa warên xeyalî bike, dilrihet û bêxem bû. Bawişkek bi wî ket. Dixwest xew bi wî heram be. Li xewnên xwe, li bîranînên xwe û li xeyalên xwe vegeriya.

4

Herduyan saet di donzdehan de taştê xwar. Ji mal derketin. Qereqol li hember mala Osman bû. Ji derenceyên qereqolê de kesek dadiket. Mîralî bi metelmayî û bi wate li wî kesî nihêrî. Heya kes daket, Mîralî û Osman jî gihîştin ber derenceyan. Ew û kesê ku dadiket bi poz ve pêrgî hev hatin. Kes bi awayekî bi metirsî û bi xem li Mîralî nihêrî. Xuya bû ew rasthatin li xweşiya wî neçûbû. Xem xwar ku Mîralî dîtiye ew ji qereqolê de dertê. Ew kes beriya li halê Mîralî bipirse, mîna xwe neçar bibîne, sedemê çûyîna xwe a qereqolê vegot:

– Serbaz hemwelatiyê min e, çendî car, bi israr, dixwest ez çayekî wî vebixwim. Êdî ez neçar mam.

Mîralî, bi halê normal, li hember wî tevgeriya da ew xeman nexwe:

– Normal e… Tu li kîjan gundî kar dikî?

Ew kes minmin î. Nedixwest navê gundê ku kar lê dike bêje. Ew halê wî ê bi weswese, dibû sedem da Mîralî ji wî bikeve şikê. Mîralî nexwest dirêjahî bide dîyalogê:

– De baş e, em ê hevdû bibînin.

Wî kesî bi lezûbez rojbaşî da wan. Çû û ma li benda erebeyê.

Di rê de, Osman pirs ji Mîralî kir:

– Tu wî dinasî?

– Belê. Li zanîngehê bi navê rêxistinek çepgir a radîkal

sîyaset dikir. Mîna kesekî no be tevdigeriya. Carê du caran xwest bi min re jî têkiliyê lidar bixe. Min ew fersend neda wî.

– Rewşa wî balkêş bû. Wextê çavên wî bi te ket mîna şok be. Bi metirsî tevgeriya.

– Bala min jî kişand, lewma min xwest dîyaloga me kurt be.

– Hatina wî a qereqolê qey tirs bi ser wî xist.

– Rast e.

– Atmosfera şer çi atmosferek tevlîhev û nedîyar e.

– Çawa?

– Ew kes dê êdî bi metirsî be. Tu jî li hember wî ketî şikê; tuyê wî kesî bi her hawî şîrove bikî… Ew ê jî bi te bawer nebe û te bi her hawî şîrove bike! Bawer bike dê ew tu şev bi rihetî ranezê êdî!

– Çi eleqeya wê pê heye, ew dizane ku ez li zanîngehê kesekî dilsoz bûm. Ê xirabiya min negihîje kesekî?

– Tu kurd î. Di nav şertên şer de normal e ku ew ji te bi şik be.

– Li zanîngehê wî behsa biratî û rizgariya hemî gelan dikir.

– Şer ne gotinên li ser maseyan e.

Mîralî bêdeng ma. Li wan deveran ew jî bûbû şahidê gelek rastiyên şer. Lewre bêdeng ma û nexwest şîroveyan bike.

Meşiyan. Çûn dikanê. Li dîwêr cil û xalîçeyên destan. Dikandar li ber dezgeh tûrikan çêdikir. Li pêş dezgehê mesayek hebû; pel û pûl, fer û folên dîrokî li ser maseyê hatibûn teşhîrkirin. Osman û Mîralî ketin hundur. Dikandar bêyî zêde li wan binihêre, bi dengekî xweş, bixêrhatin da wan. Bi nêrînan kursiyên piçûk rê wan da. Osman rûniştˇ. Kursiyek li kêleka xwe bi cî kir da Mîralî li ser piyan nemîne.

Osman:

“Mamo, ka tiştên dîrokî ên nû li ser maseyê nîn in.”

Dikandar:

– Kes nayne. Ên bi qîmet jixwe nayên ber destê min. Ên din

jî pere nakin. Ev e, ji bo hewîniya min were, mîna sûs li wir in.

– Hizûr didin însên, ne?

– Çawa, piştî min dest avêt vî karî, got dikandar, dest ji kar kir, li Mîralî nihêrî, dirêjahî da axaftina xwe. Her wext ji devê min gotinên sivik û xweş derdikevin. Ev tiştên dîrokî dil li min sivik dikin. Êvaran, wextê diçim mal, çi gotinên şîrîn û xweşik hene dibêjim ji xaltîka te re.

– Heskîf û Dîcle jî hizûrê didin însan.

– Belê, dinya însan piçûk be derdê însan jî piçûk dibin.

Mîralî û Osman bi hurmet guhdariya wî dikirin. Mîralî tî bûbû. Rabû. Ji misîn î dîrokî av dagirt, ji bo dikandar û Osman kerem kir. Wan sipasiya Mîralî kir. Mîralî, bi carekê ve av bereda bedena xwe. Dikandar, mîna henek bi wî bike, axivî:

– Te av tehm nekir! Avê fesîh vebixwe. Tehma avê ne ji bo zimanê me ye, gerek beden karibe tehmê ji avê werbigire!

Mîralî bi halek sivik ê metelmayînî, “Ez ê bi a te bikim Mamo, tişt pê nayê.” got.

– Eferim ji bo te. Min ji te hez kir. Însanê rastiyê zû têbigihijin û xwe ji xeletiyên xwe bikin biaqil in.

– Ev ne xeletiye mamo, ez hînbû me, got Mîralî, pirsek ji wî kir:

– Mamo, niha gelek kesî di dikanê de ev kar kiriye, ne?

Zilam dîsa dest ji kar kir. Li Mîralî nihêrî. Bi dengekî fesîh got:

– Ger ez serê we neêşînim ez dixwazim çîrokekê ji we re vebêjim.

Mîralî û Osman, na, em ê kêfxweş bin, gotin. Zilam pê de çû:

– Ez nizanim we bihîstiye an na. Mala Bedirxaniyan wexta li hember Osmaniyan serî hildane şerekî xedar dest pê kiriye. Piştî têkçûnê, malbatê dişînin sirgûnê.

Wê çaxê, li Cizîra Botan, bi navê Keja Cizîra Botan, keçike-

ke heya hûn bêjin bedew hebûye. Mala ewantiyê xirab be, yek diçe, ji mirovekî Osmanî re behsa keçikê dike. De îjar keçik dildara şerwendekî Cizîrî bûye. Çi serê we biêşînim, piştî çavê kesê Osmanî bi keçikê dikeve hiş û aqil di serê wî de namîne. Kesê Osmanî pir dilşad dibe. Dibêje ger ez vê keçikê bibim haremê wê paşa min hem bi malê dinê hem jî bi peywirdariyek bi rûmet bi xelat bike.

Keja Cizîra Botan dibin Serayê. Wext diçe. Bedewbûna keçikê di nav cariyeyan de nav û deng dide. Hayê paşê jî jê çêdibe. Xeber dide da keçikê bibin hizûra wî. Keçikê dibin hemamê. Çi bêhnên xweşik hene pê wer dikin. Qeyde bi qeyde cil û kinc li wê dikin. Keçika ku her bi hesreta evîndarê xwe ye, bêhal e.

Wexta dixwazin wê bibin hizûra paşê, keçik ji ser hişê xwe diçe. Axayê heremê doxtor tîne. Li gorî adetan, gerek doxtor kûr li çavê wê nenihêriya. Doxtor wexta li çavên wê dinihêre xwe ranagire, bi matmayî li çavên wê ên bedew dinihêre. Axayê haremê doxtor ji wir dibe. Kesî nizanibûye bê çi ceza dane doxtor. Em dîsa werin çîroka xwe. Bi wî halî, newêrên keçikê bibin hizûra paşê. Hay paşê jê çêdikin ku keçik nexweş e.

Her diçe keçik dihele. Ew halê bedewbûnê li wê namîne. Keçika bîst û du salî dikeve dilqê jineke navsere. Tu çare ji bo keçikê nabînin. Wê çaxê, jin û keçikên nexweş şandine keviyên Egeyê. Ên pîr, ên kotî… Dibêjin li wan deveran gund ji bo wan avakirine. Dixwazin keçikê jî bişînin wir. Rojekê keçikê bi tevî çend jinên pîr û nexweş bi rê dikin. Keçik bi qasî salekê li gundekî dimîne. Her diçe halê wê bêhtir xirab dibe.

Li gundekî nêzî wî gundî malbateke kurd ku hatiye sirgûnkirin hebûye. Ew malbat mezinên malbata me bûye. Xortekî çeleng û ew qas jî bi wijdan hebûye. Ew xort bavê kalikê min bûye. Bi keçikê re dizewice. Keçik hêvî ji wî dike da wê bibe Cizîrê. Bi rê dikevin. Heya vir tên. Wexta çavên keçikê bi Heskîfê dikeve naxwaze biçe Cizîrê. Ne tenê ji bo xweşikbûna Heskîfê bûye, Keja Cizîra Botan fikiriye; ger biçin

Cizîrê hem zewaca wê hem jî heyata evîndarê wê, ê rabirdûyê, bibe êş.

Li Heskîfê dimînin. Bavê kalkê min wê çaxê dest bi vî karî kiriye. Keja Cizîra Botan jî her çûye ber keviyê Dîcle. Çîrokên seraya Osmanî û cariyeyan vegotine. Digotin wê ji guhdarkirina dengê avê pir hez dikir. Carê, li wir, ji hevaleke xwe re gotiye, êşên ku ne belîye ji ku de tên, a ew êş, êşên mezin in. Ew êş dişibin mirinê, her wext mîna mirinê nêzî me ne. Mîna mirinê gerek em ji bo wan jî amade bin.

Lê şensê wê hebûye; mêrê wê pir bi rehm bûye. Tu car ew neêşandiye. Welhasil, Keja Cizîra Botan di temenekî ciwan de dimire. Bavê kalkê min jî, li dû mirina wê, zêde namîne li heyatê. Ev e, ji wan çaxan de ev dikan maye.

Çi tiştên hatî gotin hebû li ber çavê Osman û Mîralî dibû dîmenên fîlmekî. Atmosferek mîstîk û trajîk bandor li rihê wan kiribû. Di ciyê xwe de, bi halê zarokan, bêdeng û bi nêrînên bi wate mabûn. Halê wan bala zilam kişand. Wî jî dixwest bi wan re wext derbas bike. Pirsî ji wan: "Qey çîrokên wanî li xweşiya we diçin?" Osman û Mîralî bi hereketên serî, erê kirin. "Baş e, ez ê vêca yeka ku tê de ders hene ji we re vebêjim." Bi şêweyek wanî vegot ku mîna ew jî bûbe şahid:

"Li Çiyayê Şengalê wê salê bereket hebû; çandinî yek bûbû heftê heştê. Çend begên kurd ên misilman dexesî dikin û li dû fen û fûtan dikevin.

Rojekê du qasidên Osmanî hatibûn. Begekî kurd ê Êzdî, bi heyecan û xof çû pêşiya wan. Şekal di lingan de tunebûn. Ji qasidan jê yekî," Tu ji bo çi pêxwas hatî?"pirsî. Beg, dizanibû hatina wan ne ji bo xêrê ye, bersiv da:

– Meqamê Osmanî we şandî ye. Ev jî nîşan e ê ji vir bi şûn de bereketa Osmanî bi ser me de bibare!

Dû re Beg haydar bû da kesên hatî ne sivîl in. Beg pêşbîn bû. Fam kir ku hatine wî bibin. Mîna bêminetî bike, ji wan re got, "Destê min kelepçe bikin!" Qasidan destên wî kelepçe

kirin. Serî dan riya Ezirganê. Sî û çar rojan bi rê de meşiyan. Rû û simbêl ketibûn nav hev. Çarix di lingên wan de peritîn. Ling li wan qelişî.

Beriya herin dîwanê, Begê Êzdî dizanibû ê çi bi serê wî de bê! Difikirî bê çawa xwe ji xezeba paşê xilas bike. Wekî ku ew fikirîbû tevnek ji bo wî hatibû lidar xistin. Çend serekên êlên Kurd yên misilman giliyê Canpolatê Êzdî, bi paşê de kiribûn. Ew serek jî li dîwanê bûn. Mişir Paşa ji wan began re gotibû, ez wî nakujim hûn bi destê xwe wî bikujin.

Beriya Beg bikeve dîwanê ji qasidan re got, "Min qemeyek heye, min ji bo cinawiran anî ye. Ez naxwazim bi tevî qemeyê biçim hizûra paşê. Ji paşê re bêjin bila destê min vebike. Ez naxwazim bi vî halî bikevim dîwanê." Qasidan daxwaza wî ji paşê re gotin. Paşê qebûl kir. Beg ket hundur. Serê begên Kurd yên misilman di ber wan de bû. Begê Êzdî çawa ket hundur bi dengekî qube axivî:

– Esselamûn aleykum, ya şivanên mihan!

Hinek midet qediya. Paşê Beg neda kuştin. Ji silava Canpolat meseleyê fam kir. Ew bi rê kir! Beg wexta ji hundur derket bi vî awayî xatir xwest:

– Bi xatirê we, ya gavanên dewaran!"

Osman, "mala te ava mamo", got. Dikandar kêfxweş bû. Mîna bêtir karê wî li xweşiya wî biçe bi destsivikî kar kir.

Osman nedixwest biçe. Adil bi bîr anî. Bi destûr rabûn. Beriya ku rabin, Mîralî pirsek ji dikandar kir:

– Mamo, ger tu jiyana xwe bi du gotinan bêjî me, tuyê çi bêjî?

Zilam rawestiya. Li wan nihêrî. Keniya. Wekî din tiştekî negot. Hinek bi alavên tevnê re mijûl bû. Dît ku Mîralî li benda bersivê ye bi dengekî fesîh, jidil û bi şîret axivî:

– Gotinên we bila mîna firo be. Hûn dizanin bê firo çi ye?

Osman,"belê", Mîralî, "na", got.

– Firo, şîrê pêşî ye. Di her zayînê de bi carekê tê bidest xistin. Ew şîr şîfa ye. Îjar dora pirsa te, ava zelal, tê de xuya ye xem û xeyal!..

Osman, li ser piyan, bi dengekî fesîh û bi hurmet, sohbeta we ji bo me bû şifa, malî ava, got. Dû re, mamo, emê xwarinê çêkin, tu dixwazî bi me re were keviyê Dîcle, got.

– Helal be. Helalê can û bedena we be.

– Wê çaxê pariya we em ê bînin vir.

– Na, ê xaltîka te xwarin bîne vir. Ger ez wê nebînim ez ê bêriya wê bikim!

– Mamo, ma tu ew qas ji wê hez dikî?

– Ma hewceyî gotinê ye, hê min halê rûyê wê ê sar û tirş nedîtiye. Qey te kalkê bavê min ji bîr ve kir, ne min got wî çiqas ji Keça Cizîra Botan hez kiriye…

Osman bi halekî zirav ê fedîkar keniya. Mîralî di cîyê xwe de rawestiya û kêliyekê fikirî. Osman meşiya, ew jî meşiya.

Goşt li Heskîfê meşhûr bû. Goşt û zebze kirîn. Çûn cem Adil.

Adil li firinê xwarin di dîzê de bi cî kir. Xebatkarê firinê dîz avêt firinê.

Her sê li pêş firinê rûniştin. Bi awayekî, gotin anîn ser rewşa xizaniyê. Mîralî wekî çareseriyê destnîşan bike got, çend febrîqe hebûna bes bû. Adil bi kenekî sivik.

– Febrîqe heye, li Kercewsê ye lê ji bo hestîşikênandinê ye, got.

Mîralî bi çîroka febrîqeyê dizanibû. Ew febrîqe ji bo şekal bêne çêkirin hatibû avakirin. Febrîqe wekî baregeh dihat bikaranîn. Piştî gotinên Adil, bêdeng ma. Osman jî bêdeng ma.

Xwarin amade bû. Hinekî li bendê man da ku sar bibe; nedixwestin bi wî awayî bibin. Piştî dîz hinekî sar bû bi kaxizekî zer ê hinekî stûr dîz rapêça. Dû re di poşetekî de bi cî

kir û meşiyan. Adil her ku, ne hewce ye, xwarin e, ma ê çi be, got jî Osman bi a xwe kir, sedem jî wanî der bir:

– Bêhna xwarinê wê bi ser kesan bikeve, ê dilê wan bibije, nabe.

Li keviyê Dîcle bûn. Li ser qûmê rûniştin. Mîralî geh li lingê pira kevn dinihêrî geh jî li riya avê a di zinarê asê de. Carna jî dev ji xwarinê ber dida, diçû dest dixistin nav avê û bi wî halî dima. Adil deng li wî kir:

– Mîralî, pirsan ji avê meke, tu hê xort î. Kesên mîna min dikarin pirsan ji avê bikin. Em û av dikarin ji hev fam bikin; av jî pîr e ha!

Mîralî û Osman li hev nihêrîn. Mîna bixwazin Adil baş binasin li Adil nihêrîn. Bêhn û tehma xwarinê nehişt ew zêde bifikirin. Mîralî jî bi xwarinê ket. Li dû xwarinê bawişk bi Adil ket. Bedena qelew û hewa ya hênik xew bi wî dixist. Mîralî xwest wî halî li wî biherimîne:

– Mamo, ger ez ji te re bêjim jiyana te çi bi bîra te tîne tuyê karibî bi du gotinan der bibî?

Adil, li çavên Osman nihêrî. Osman jî bi metelmayî li Mîralî dinihêrî. Di wê kêliyê de Osman jî bi dû gotinên wanî ket. Neaxivîn. Her sê jî bi xeyalan de çûn. Piştî wextekê

Adil gotin bi alîyek din ve bi ber kir:

– We çi ji Heskîfê fam kiriye?

Osman:

– Bajarekî bi raz e.

Mîralî:

– Her carî tiştan bi bîra însan tîne.

Adil mîna tecrubeyên xwe rê bide axivî:

– Kuro, Heskîf dişibe keçikeke bedew. Nahêle, ji bilî wê, hûn tiştekî bifikirin. Hûn neçar in, her wext, bi wê re bin. Lê eşqên keçikan hinekî bi jan in ha. A wijdanî, Heskîf jan naxe dil. Hûn xort in, tiştên sivik ji jiyanê re dibin bask. Ma ji derd û kulan bask çê dibin. Eşq bask e…

Osman xwe li mînakên dîrokî girtin:

– Belê keko, rastiyên van deveran hene; her carî hin rastiyên dîrokî bi bîra min tên. Wê çaxê ez jî wekî te difikirim ku eşq li van deveran zor e. Cihê text lê hebe însan nikare hêviya bext bike. Textên li van deveran tu car nehiştiye bext hebin. Eşq û hezkirin hinekî jî bext e.

Adil piştî ku axînek kişand pê de çû:

– Lê dîsa jî ên xort hûn in, xwe li hezkirin û eşqê bigirin.

Gelek wext bihurî. Osman, em biçin, got. Mîralî, tu û Mam Adil biçin. Ez ê hinekî bigerim, got. Dilê Osman bi cî nehat. Her ku nexwest Mîralî li wir bi tenê bihêle jî Mîralî bi a xwe kir. Ji bo Osman xem nexwe, kekê, ez ê zêde nemînim, piştî nîvsaetekê ez ê werim, got.

Osman û Adil çûn. Bi rê de Adil ji Osman re got:

– Qey Mîralî dildar e?

– Belê.

– Te hay jê hebe ha, eşqên li Heskîfê, însan dikin muptela ha!

– Me evîn ji bîr ve kiriye heyra.

– Te Mela seh kiriye?

– Na!

– Li vir, hin kalepîr, behsa eşqa Mela û Selma dikin, eşqek meşhûr e. Tu çîroka eşqa mele seh bike, wê çaxê, tuyê bizanibî xortanî û dil çi ne.

– Tu ji min re vebêje.

– Ez jî baş nizanim. Lê ez ê ji bo te hîn bibim. Yekî gelek bi temen heye, ez wî dinasim… Tu dizanî, ez her ku beriya dia bikim dengê dilê xwe dibihîzim. Ber êvaran, tav çawa reng li xirabeyên Heskîfê reng xweş dike, a, ez her carî dixwazim bi wî awayî dil li însanan xweş bikim.

Mîralî li keviya avê ma. Wekî adetek govendan, wextekê, qedeh tije av dikirin û datanîn ser serê govendgeran; ger qedeh neketa an jî av nerijiya ew kes govendgerek meşhûr bû… Wê

kêliyê, li hemberî Mîralî, av mîna ava di qedeha govendger de bû. Li avê dinihêrî; bi qasî ava ker û lal, bêtevger û sivik û serbest bû bedena wî.

Tenêtî li xweşiya Mîralî diçû. Şekal û gore ji xwe kirin. Lingên xwe di nav qûmê de bi cî kir. Serê xwe li ber avê bi cî kir. Serê wî gelek nêzî avê bû. Carna guhê wî ê alî rastê şil dibû. Çavên wî li zinarê asê bû. Ji dil dihat, ji zinêr, hêza hezkirinê bixwaze. Dixwest zinar kêfxweşiyê bide wî, mîna dengê avê. Bêriya dildara xwe dikir. Hîs dikir ku bedena wî aramî û bêdengî dixwaze. Bedena xwe serbest hişt.

Bi xew ve çû bû. Xewa kêliyekê. Mîna kesên bi xem, zû şiyar bû. Xewna sivik dîsa jî hinekî aramî dabû wî. Ji nişka ve cizdan ji bêrîka xwe derxist, avêt ser qûmê. Delingên şapik hil kir. Di nav avê de hinekî meşiya. Ji dil dihat ku xwe bispêre Dîcleyê û av bedena wî bibe. Êdî heya ku bibira!

Paşepêlî hat, ji avê derket.

Xwe li geliyê kelehê girt. Meşiya. Çend caran li şikefta wekî xênî dihat bikaranîn nihêrî. Mala ku di berhemên hemî wênekêşan de cî dabû xwe balkêş bû. Xanî û jiyîna malbatê a li wir çiqas bi kesan otantîk û bi seyr dihat ew qas jî kesên ji malbatê zîvêr dikirin. Malbat pirî caran ji ber kişandina wêneyan zîvêr dibûn; her cara ku jinên malbatî didîtin wêneyên wan tê kişandin, ber bi hundur ve direviyan. Bêtir havînan; pirî caran heya êvarî dernediketin derve.

Mîralî ji otantîkiya şikeftê zêdetir halê wan însanan fikirî. Li ber şikeftê dîwar lê kiribûn. Tûpek mezin ê hêşîn û leganeke lekî ê sor xuya dikir.

Mîralî piştî hinekî meşiya li ber kevirekî rûnişt. Darikek di dest de erd xêz kir. Dengê kuxikek xapînok bi ser wî ket. Mîralî ji nişka ve rabû ser piyan, wesle li wî sar bûn. Bi tirs li xwedî kuxikê nihêrî. Kesê kuxiya bû jî bi heman halê sar li Mîralî dinihêrî. Ji rûyê zilam xuya bû ku halekî sar, di heman demê de, ê karibe hinek şewqet jî der bike. Mîralî mîna biminmine, “Hûn… li vir…” got.

Kesê ku do di lokalê de rûniştî ê bi şebqe li hember Mîralî bû! Li Mîralî dinihêrî. Her ku dinihêrî xwêdan bi ser wî diket. Xwêdan bi ser Mîralî jî ketibû. Ew dever xalî bû. Kes ne diçû ne jî dihat. Destê xwe ber bi kêlekê ve bir. Mîralî demançe dît. Taqet bi Mîralî re nemabû. Ji dil hat baz de. Ew fikir bî wî ne fikrek rast hat. Dixwest fam bike bê zilam çi ji wî dixwaze.

Ew dever di wê kêliyê de bi zilam bûbû mîna qada dadgehê; her ku lawê xwe bi bîr dianî tevlîhev dibû. Nizanibû çi bigota. Mîralî li benda wî bû. Zilam biryar da û dest pê kir:

– Ez bi qurban, tu xortekî hêja û şîrîn î!

Mîralî bi wan gotinan kêfxweş nebû! Li bendê bû bê li dû wan gotinên xweşik ê çi biqewime. Zilam berdewam kir:

– Xwezî tu li min bihata însafê û min çîrokên xwe ji te re vegota!

– Çi çîrok? Tênagihîjim, hûn li vir, li çi…

– Heqê te heye tu vê pirsê ji min bikî. Helbet niha derbarê min de gelek tişt ji te re jî gotine. Lê ez ji te rica dikim guhdariya min bike.

Mîralî dît ku zilam naxwaze dev ji wî berde lewre xwe li çareyan girt:

– Belkî rojekê… Aniha hevalê min li benda min e… Ma ji bo çi ez?

– Ji bo ku tu gelekî dişibî lawê min. Ne min got, bi qasî kişandina çend cixareyan guhdariya min bike. Ji êvar de dil li min dikele. Çawa min te dît, lawê min bi bîra min hat û min bêriya wî kiriye. Her ez ê nikaribim çîrokên xwe ji lawê xwe re bêjim, bihêle, ez çîrokên xwe ji te re vebêjim.

Mîralî nedixwest bi pirsan rê bide sohbetek kûr û dirêj. Dîsa hincet da ber:

– Fam dikim, hûn dagirtî ne lê hevalê min ê mereqa min bike.

Dengê zilam bi gazind bû. Halê nezaketê jî dabû aliyekî:

– Ma çi wext kesên wekî we wê çîrokên me mereq bikin?

– Ma dost û hevalên te nîn in? Çîrokên xwe ji wan re vebêje.

– Dost û heval! Baş e, xwezî tu ew qas neşibîyayî lawê min. Xwezî tu nebûyayî sedem da ez dest bi fikirînê bikim. Te doh şev li min herimand.

Mîralî bêdeng, hinek jî bi xemek sivik û veşarî li wî dinihêrî. Pirs ji zilam kir:

– Ger hûn bixwazin jiyana xwe bi du gotinan vebêjin hûn ê çi bêjin?

Zilam metelmayî ma. Fikirî, bêdeng ma. Mîralî hinekî ji wî bi dûr ketibû di wê kêliyê de. Zilam li ser kevir rûniştˇ. Mîralî bêyî biaxive, rewşa heyî wekî keys dît û meşiya. Zilam li dû wî got," Lawê min jî mîna te…"

Mîralî bi dengekî bilind got:

– Ez naxwazim derbarê lawê te de pirsan bikim. Ger te ji lawê xwe hez bikira, tuyê li van deveran ne di vî halî de bûya; ê xelkê bizanibûya tu ji ku yî! Tu kesekî tarî yî.

Zilam xwe bi xwe got: aqlê sivik barê giran e lawo. Ma min çi zanibû ev tişt bi serê min de bê. Ma qey ez dizanim serê min li ser çi kevirî ye, got û li ber xwe nihêrî.

Mîralî meşiya. Xwe li riya kelehê girt.

Li ber deriyê kelehê mîna bixwaze pirsa du hevokan ji deriyê kelehê bike rawestiya. Ji nişka ve çavên wî bi wêneyê li ser deriyê dîrokî ket. Cara yekem bû li wêneyê li ser derî ew qas bi baldarî dinihêrî.

"Ez ê nema vê pirsê bikim. Bersiva keleh û derî ew wêne ye. Wêneyek dikare ji bo jiyanekê bibe bersiv û derbirîn. Lê du hevok nikarin jiyanekê bi nav bikin. Belkî jî her kes nikare bibersivîne." got û meşiya.

Li serê kelehê, li alî Dîcle û riya avê mexzenekî hebû. Di kulekê de li mexzenê nihêrî. Kir qîrîn," Esmaaa! Esmaaaaaa!"

5

Li nav rezan bû Mîralî. Rengê tirî û rengê kevirên deverê li hev dikirin. Bi hewes li rengê tiriyê şimayî dinihêrî. Hebekî xist destê xwe. Bi tiliyan paqij kir. Tirî avêt devê xwe û mijand; hew hebek tirî bi deqîqeyan dimijand; ew elimîn ji zarokatiya wî de pê re mabû. Li gund, ji bo şekirê wî zû bi zû xilas nebe û qarê hevalên xwe bîne, bi awayekî wanî şekir dimijand da wextek dirêj nehele.

Li derdor nihêrî. Ger ne ji rezan bûya ê payîza wir û payîza gundê wan bişibiya hev. Li gundê wan, di piçûkatiya wî de, her ku dibû payîz, kalikê wî digot, ev heyam mirinê bi bîr tîne. Li dû axînekê kilama Dewrêşê Evdî diminminî.

Li gundê ku Mîralî lê dixebitî, rez û mêweyan nedihişt mirin bi bîra gundiyan werin. Ew bi kêf û henek bûn.

Henek, tişta ku Mîralî her carî dixwest bike û nikaribû bike henek bû. Carinan ku xwe li henekan digirt, dixwest henekên herî xweş û sivik bike lê jê nedihat. Di kêliyên wanî de, bi tîqînî xwe bi henekên kesan kêfxweş dikir.

Gundiyan li bexçe henek dikir û ew jî bi tîqîn bû. Hem bi tîqîn bû hem jî li darên mêweyan dinihêrî da ku dar çareyek ji bo halê wî û Esma jê re bêjin! Carna pirsên sayakî ji gundiyan dikir. Pirsî bê ew ji tirî û hejîran çi dikin. Yekî rûspî bi bêhnfirehî jê re vegot ku ew bi qasî hewcedariya xwe terxan dikin, ên mayî jî an dibin Batmanê an jî Midyadê difroşin.

Her carî dilê wî, çavên wî bi alî şikeftê dixistin. Sebir nedikir; goristaneke kevnare ku wekî mayînde hebû li şikefta li hember. Wextekê şagirtên wî ew biribûn goristanê. Goristana ku di şikeftê de mîna xeml bû bûbû sedem Mîralî bi nav xeyalan bikeve.

Di zinêr de cihê hilkişînê hatibûn çêkirin. Zarokan bawer nekiribû ku dê Mîralî bi zinar ve hilkişe. Mîralî bi rihetî hilkişiyabû. Zarokan bi wate li hev nihêrî bûn. Çawa mamosteyek dikaribû wekî wan bi zinêr ve hilkişe!

Bi xeyalan re heyraniyekê xwe di dilê wî de dabû der. Bûbû heyranê kevir û tirbê. Dû re li halê xwe ecêbmayî mabû, "Ev çi hal e, ma însan dibe heyranê tirban".

Biryar da, ê biçûya şikeftê.

Bi a xwe kir. Rojbaşî da gundiyan. Di nav rez û bexçeyan de meşiya. Nedixwest kes bizanibe bê ew diçe ku.

Li geliyê piçûk, li ber dara hejîrê, rûnişt. Diya xwe bi bîr anî. Wî diya xwe mîna şîrê pêşî ê jiyana xwe bi nav dikir. Bi bîr dianî ku diya wî ji bo ew bi Esma şîrîn be ketibû nav çi hewldanan. Piştî diya wî hay jê çêbû ew û Esma ji hev hez dikin, her car ji bo Esma, delala taxa me, digot. Mîna li taxa xwe, li ber dara qajê rûniştî be, li benda kenê Esma ên di şibakeyê de be xeyal kir.

Tarî ket erdê. Dixwest xwe ji bandora metirsiyan bike. Dizanibû mayîna wî ya li wan deveran, di wan wextan de, talûke bû. Êdî ketibû halekî wanî, ji her tiştî çare hêvî dikir; ji kevirekî, ji av, ba, tariyê, tenêtiyê... Birçî bûbû. Xem nekir. Xwe li şikeftê girt. Hilkişiya. Li ber kêlekî rûniştt.

Saetek du saet bi wî halî ma. Ji dil hat biçe mal. Tirs bi ser ket. Di tariyê de îhtîmal bû cerdevanan ew bikuşta. Xem xwar ku ê gundî mereqa wî bikin. Bi awayê, "Her ewê bêjin xoce çûye Heskîfê" da ber dilê xwe. Mîna miriyekî zindî xwe li ser tirbê dirêj kir. Wêrekî û xofê her carî cî diguherî. Xewn

didît, şiyar dibû. Xewn didît şiyar dibû. Kêliyekê êdî nema xew bi çavên wî ket.

Carna jiyana miriyê di tirbê de difikirî û dixwest texmîn bike, bê kesê di tirbê de çi û çawa jiya ye. Carna jî ji dil dihat ji tirbê, ji şikeftê û heta ji Xwedê pirs bike. Atmosfera di şikeftê de, halê bi raz ê tariyê bi wî xweş dihatin. Bi xeyalan de çû:

"Xwezî ba bibûya dengê dilê min. Bibûya hubir û halê min li ser destê Esma bikira wêneyek. Dengê dilê min li ber guhê Esma bikira newayek... Gelo beriya av û axê eşq hebû; eger tunebûya ê av û ax bihata çi wateyê? Ger ne ji eşqê bûya ê bengîtî hebûya; belkî jî ax û av du evîndar bûn lê bayî nehişt ew li her deverî pev şad bin. Belkî jî ba ye nahêle temen li evînan dirêj be... Na, ma ne ji bayê bûya ê kulîlk biketana çi halî... Ez nizanim ez çi ji xwezayê dixwazim, problem ji me însanan de ye, çi qebhetê xwezayê heye... Em însan carna dikevin halê sosret."

Heya destê sibehê bi xeyal, pirs û şîroveyan re mijûl bû. Destê sibehê gotinek ji devê wî derket:

– Ne henek e!

Gotin dubare kir:

– Ne henek e.

Li xweşiya wî çû. Li tirbê nihêrî. Peyvekê li gotinê zêde kir:

– Evîn ne henek e!

Bal li wî sivik bûbû. Ji birçîna zikê wî bi pişta wî ve zeliqî bû. Dîsa jî mîna kilamekê bêje,

– Evîn ne henek e! got.

Roja şemiyê bû ku gundiyan jê re roja septê digotin. Ji mal derneket û her raza. Roja yekşemê jî bi gundiyan re çû nav rezan.

Roja duşemê li dibistanê, di polê de, ji xwendevanan pirsekê kir:

– Zarokno, hûn ji yekê gelekî hez bikin hûn ê çi bikin?

“Ez ê pê re bi lîstikê bilîzim.”

“Ez ê pêlîstoka xwe bidim wê.”

“Ez ê wê bi hêrs nexim.”

.....

Zarokekê deng li xwe bilind kir:

“Ez ê li cem wê negirîm.”

Zarok giş keniyan. Mîralî li zarokê nihêrî. Peyva “girî” li ser dil û hişê wî rûnişt. Rabû. Li ber texteyê rawestiya. Îşaret û xêzên bêteşe li texte dikirin. Ji zarokan dixwest ew texmîn bikin bê ew nîşanek û xêz dişibin çi. Dû re, bi fîkandinê çend newayên bi kurdî da der. Zarok dikeniyan. Ji zarokan jê yekî, bi nêrînên şîrîn,

Mamoste, ez bi wê kilamê, ya ku tu dibêjî dizanim, got. Mîralî ber bi wî ve çû. Bi awayê henekî bi hinarikên rûyê wî girt û bi du tilîkan mis dan.

Di polekê de, zarokên her pênc polan dixwendin. Nêzî nod zarok bûn. Mîralî derket derve.

Mamosteyekî din jî li gund peywirdar kiribûn. Ew mamoste û mixtêr li hewşa dibistanê bûn. Mixtêr navê wî mamosteyî got. Mîralî jî xwe bi wî da nasîn. Piştî sohbetek kurt Mîralî xemên mamosteyî têgihîşt. Mîralî, ji bo dil li mamosteyî fireh bike, xema cî meke, lojmana ji bo kesên zewicî amade ye. Ez di odeyê de dimînim, got. Mamosteyê nû kêfxweş bû. Bi eslê xwe tirk bû. Li gundekî gelek ji Heskîfê dûr kar dikir. Zewicî bû. Zarokeke wan jî hebû. Mamosteyî li Enqere torpîl bi dest xistibû. Lewre ew dabûn wî gundî.

Roja mayîn mamosteyî hema mala xwe anî û di lojmanê de bi cî bûn. Mîralî zêde bi wî re mijûl nedibû. Carê, li ber dîwêr, mamosteyê nû zaroka xwe a pênc salî rê Mîralî da û pirsî:

– Mîralî xoce, li gorî salên wê, bejna wê bi te çawa tê? Ne kin e, ne?

Mîralî hinekî xemgîn bû. Ew mamoste û jina xwe bi bejnên xwe gelek kin bûn. Fikar dikirin ku ê keçika wan jî kinik bima. Ew rewş mîna alozî di dilê mamoste û jina wî de mabû. Mîralî bi dengekî xembar gotê:

– Xem nexwin, normal e.

Bang li keçika wî kir û pê kêfxweş bû.

Halê Mîralî gelek li xweşiya mamosteyî çû; dizanibû Mîralî kurd e. Xwe bi xwe digot, ger Mîralî ji me kêfxweş be ê kes li vir qarişî me nebe. Her carî fikrên xwe ên netewe-perest vedişart. Bi hêla însanî nêzikahî li Mîralî dikir.

6

Mîralî, çend caran, dil kir da xeber bide Esma. Dixwest Esma jî were Heskîfê. Ê bi dilê hev şad bûna. Xemên wî nehiştin. Roj derbas dibûn. Destê Mîralî li pîşeyê wî jî sar dibû. Dil li wî ditengijî. Her ku diçû, xwe bêhal hîs dikir. Rojekê baran bariya. Barana roj û şevekê dom kir bû sedem da kalepîr temenê xwe û serpêhatiyên xwe bi bîr bînin," Me tu car baranek wanî nedît." digotin.

Piştî du rojan Îsmaîl bi tirs û bi xem hat lojmanê cem Mîralî. Îsmaîl, ew kes bû ku kêm diaxivî. Tu xisara wî nedigihaşt kesî. Ew û tezbiha di dest wî de bûbûn hêma di serê gundiyan de. Bi Mîralî re, bi halek ecêb û bi guman, diaxivî. Ew halê wî ê fesîh tunebû. Pêşî mîna bixwaze Mîralî ji alî baweriyê ve, ji bo tiştekî, amade bike axivî:

– Xoce, tu jî dizanî, ev gund çi dewlemend e.

– Belê, rez û bexçe bes in.

– Ne wilo lo. Ez ji bo tiştên xerîb ên bi pere dikin, dibêjim. Li dû baranê, her kes bi nav gund ket. Bê ka pere û tiştên kevn bi ser erd ketine an na.

– Ha, belê min bihîstibû; ev gund mîna defîne ye.

– De îja ez bêjim xezîne ye ha. Min bi xwe jî, çend caran, tişt dîtin lê zêde pere nekirin.

– Wa! Çi baş.

– Tu zanî, gelek kes tiştên dîrokî dibînin lê ditirsin. Halbukî însan dikarin ji yekî wekî te re bêjin!

Mîralî bêdeng ma. Ji hêlekê ve jî heyecaneke sivik xwe li Mîralî jî da der. Li benda Îsmaîl bû. Îsmaîl bi halekî fedîkar,

– Ger tu karibî soz bidî min, ez ê tiştekî ji te re bêjim. Êdî tu û wijdanê xwe, got.

– Kerem ke.

Heyecan û xeyalên hukum li Îsmaîl kiribûn, bûn sedem ku Îsmaîl ji nişka ve, ji bêrîka sako a hundur tiştekî derîne. Îsmaîl peykerekî piçûk ji bêrîka xwe derxistibû. Di dest xwe de bir û anî. Peyker da dest Mîralî. Peykerê ku li gorî piçûkbûna xwe gelekî giran bû, di hişê Mîralî de bû sedema tevîheviyê. Mîralî peyker da Îsmaîl û wiha got:

– Xuya ye bronz e. Çi dibe kêfa wê ye lê ev bi aîdî we ye. Ji bo beledbûna te sipas lê mafê te ye. Kerem ke û bi xwe biryar bide.

Îsmaîl li hember tewra Mîralî hem metelmayî ma ku Mîralî çawa derfetek wanî ji dest dida. Hem jî kêfxweş bû. Tewrê Mîralî wekî nîşana beledbûnê hesiband. Lewre jî bi dilrihetî ji Mîralî re got:

– Xoce, bawer bike, tuyê xwedî li peykerî derê; ev e, ez dihêlim li cem te. Êdî tu û Xwedayê xwe.

Mîralî û Îsmaîl bi saetan derbarê peyker û rewşa gund de axivîn. Derengî şevê bû. Îsmaîl xatir xwest û çû.

Xew bi çavên Mîralî nediket. Bi xeyalan re bû:

"Sibeh ez ê Esma haydar bikim... Na, nabe, ma problema bavê wê û bavê min ne pere ne. Ez ê ji bo çi hêvî bidim Esmayê... Ger ev peyker bête firotin, pêşî, ez ê dev ji vî karî berdim... Ez ê biçim welatekî wanî ku haya tu kesî ji min çênebe..."

Xew bi çavên wî neketibû. Sibehê ji dil nedihat taştê bixwe. Çavên Mîralî li sako bû. Çîrok ji bêrîka sako deranî.

Beşek ji çîrokê xwend. Piştî xwend, hem keniya hem jî girî xwe da der; di çîrokê de pesnê bedena Esma û çend bîranînên wan hebûn. Bi zimanê xortaniyê hatibûn lê kirin. Di çîrokê de, bi diruşmeyan, eşqa xwe der biribû.

Çîrok di dest de, peyker li hember wî bû. Peyker carna dibû sedem bask bi wî ve werin. Xwe zevt dikir. Ji wan xeyalên xweş ditirsiya. Şik di dilê wî de hebû:

– Ger ez wanî bawer bikim û rojekê her tişt bi avê de biçe ez ê çi bikim? Li dû vê pirsê her tişt bi wî sar hat. Dîwarên xênî, li ber çavên wî, mîna qalibên qeşayê bûn. “Eh, halê min halê rebenan e, wekî din ne tişt e” got, xwe li bêdengiyê girt.

7

Wê çaxê, li herêmê, çend mamoste hatibûn kuştin. Wan rojan du kesên çepgir û du heb jî ên oldar hatibûn kuştin. Di nav mercên şer de, her kesî bûyerê şîrove dikir. Dipirsîn, "ji bo çi kesên çepgir û oldar? Di vî karî de tiştekî heye."

Ji tirsan gelek mamoste nediman li herêmê. Midûrê Perwerdehiya Milî, ji mamosteyan re, bi awayekî ne fermî gotibû, ji nav sînorên Mêrdînê derneyên, hûn neçin gundan jî ne xem e. Ji derî dibistanên li Heskîfê û li Kercewsê, dibistanên gundên qereqol lê hebûn û çend dibistanên gundên li devê rê vekirîbûn.

Mîralî bi tevî dikaribû gund biterikanda jî bi nîyeta, zarokan ji bo jiyanê amade bike, gund neterikandibû. Mîna mercên normal hebin dixebitî.

Wê rojê biryar da:

"Ez ê çendekê biçim. Çerçawa be, mamosteyê î din dê karibe li zarokan xwedî derbikeve."

Çû Heskîfê. Peyker di bêrîka wî de bû. Êvarî, wî jî mîna Îsmaîl kir; bi armanca ku Osman amede bike, behsa çêkirina pira nû kir. Osman jî bi meseleyê dizanî. Wexta pir li wir hatiye çêkirin, bi kepçeyan, zêr hatine dîtin. Piştî sohbetekê, Mîralî peyker derxist û ji Osman re hal û mesele got. Osman jî di nav kelecanekê de bû. Soz da Mîralî ku ê bêbextî li wan nekiriba.

Osman ji xwe bawer diaxivî:

– Hevalekî min heye. Rojnameger e. Ji ber ku nûçeyek balkêş, di derbarê bûyerek di şer de qewimî, çêkir gelek navûdeng da. Ew, rojnamegerên Ewropî dinase. Ez ê wî haydar bikim. Wî, carê di derbarê meseleyên mayîndeyan de bi min re sohbet kiribû.

Mîralî û Osman piştî du rojan çûn Batmanê. Li wir rojnameger dîtin. Peyker nebiribûn. Rojnameger bi dehan senaryo lidar xistin. Di her senaryoyê de riyek dida pêş wan. Gerek bi awayekî, di zûtirîn demê de, wan peyker bigihanda wî. Osman û Mîralî ew fikir li cî nedît. Rojnameger dît ku çare nîn e, nikare wan qanih bike," Baş e. Ka sebir bikin ê çibe." got. Hinekî fikirî. Dirêjahî axaftina xwe, "Ger rojekê ez û rojnamegereke Frensî werin Heskîfê, ji niha de, bihesibînin ku em ê bi navê lêkolînê hatibin. Jixwe dê Osman di nav gel de belav bike ku ez û wî, ji mêj ve, heval in. Osman, "Ew rihet e, xem nexwe." got.

Osman û Mîralî çûn Heskîfê. Êvarî Osman li qehweyê bi awayê sohbet bike got, ê hevalekî min û rojnamegereke Frensewî werin Heskîfê. Wextekê li vir bimînin. Piştî du sê rojan gelek kes haydar bû.

Osman diçû kar. Mîralî gelek wext li mal dima. Li ber şibakeyê li lingên pir ên kevn dinihêrî wekî her carî. Carna jî diçû kelehê û li ber mexzenê kûr û dûr difikirî. Hêvî dikir ku rojekê ê Esma bîne Heskîfê. Wê bibe ber lingên pira kevn. Heya derengî şevê li wir bimînin. Di qatê şevan de wê ramûse, heyfa çendî wextan bigire.

Hefteyek borî bû. Rojnameger ê hevalê Osman û rojnemavana Frensî ya bi navê Alîta hatin. Li mal, pêşî bi sohbetek sivik hevudu nasîn. Alîta, carê du caran navê Yilmaz Guney û Kamîran Bedîrxan bi bîr anî. "Bavê min carê bi Kamîran Bedirxan re sohbet kiribû. Wî, gelek pirsên bavê min bersivandibû. Yilmaz Guney jî çend caran dîtibû. Pir ji Yilmaz Guney hez dikir. Bavê min, bi qasî salekê beriya Yilmaz Guney mir", got.

Rojnamegera Frensî devliken bû. Cilên li ser wê ên otantîk û rengên herêmê bi bîr dianî ew bi kesan şîrîn dikir.

Çend caran ji dilê wê hat baş û xweş li Mîralî binihêre. Hestekê, xwestekekê xwe li Alîta dabû der! Tu tiştî fam nekir. Tênegihîşt. Xwe bi xwe, ev çi ye, got. Her ku dixwest çavên xwe bide aliyekê, hîsekî şîrîn dilê wê xweş dikir.

Ji serpêhatiyên xwe dizanî, bi dilê xwe dizanî, halên wanî pirî caran ew bi ser rê dixist. Kêliyekê ma di nav tevlîheviyê de.

Çay vexwarin. Rojnameger ê hevalê Osman, ji Osman xwest peykerî rê wan bide. Osman:

– Niha ne amade ye, sibeh em ê bînin!

Hevalê Osman zîvêr bû. Bi dengekî bi xeyd axivî:

– Mesele çi ye?

– Ne muhîm e, ê sibeh amade be. Ma ne cixare ye ku însan di bêrîka xwe de bigerîne!

Alîta bi tirkî dizanibû. Gelek kêm jî bi kurmancî, ya rast bi hin peyv û çend gotinên rojane ên bi kurdî dizanî. Alîta, ji rojnameger ê hevalê Osman re, “Ne xem e, leza min nîn e.” got.

“Lê leza min heye, gere ez biçim Batmanê û heya sê rojan jî karê min ê muhîm heye.”

– Bila be, tu xem nexwe, ez ê çareser bikim. Tu dixwazî rabe biçe. Ez ê biçim kelehê. Çendî caran ez çûme kelehê. Ez ê wêneyan bikişînim. Êvarî ez ê jî werim Batmanê. Sibehê ez ê carek din werim Heskîfê. Bila wê çaxê Osman û Mîralî peyker amade bikin, got Alîta bi dengekî nerm û xweşhal.

Bi wî awayî li hev kirin. Hevalê Osman fam kir ku ê ew êdî nikaribe tiştekî bêje. Bêdeng ma. Xatir ji wan xwest. Alîta jî xatir xwest. Wextê bi destê Mîralî girt ji derî îradeya wê, destê wê li ser destê Mîralî xiş bû. Keniya bi navê kûbariyê. Mîralî wate li halê wê negirt. Lê haydar bû ku sorahî xwe li rû Alîta da der.

Ji mal derketin. Hevalê Osman ji Alîta re, “Em ê hev u du bibînin.” got, ber bi rê ve meşiya. Di dengê wî de rengê gazinan xuya dikir. Bi hêrs bû ku Alîta li hundur bi a wî nekiribû. Alîta, bi axaftina bi ken re, xwest dil li wî xweş bike. Bi zor be jî hinekî ken bi wechê zilam ket.

Alîta ber bi kelehê ve meşiya. Hişê Alîta hê li ser wê kêliyê bû. Çend caran bi awayek siruştî û ji nişka ve bûbû evîndar. “Min li van deveran jî eşqekê heq kiriye. Ya ku bi serê min de bê ger hezkirin û eşq be, bila were, li ser çavan… Gerek bi awayek, ez ê wê xemê di dilê xwe de nehêlim.” got xwe bi xwe. Hişê xwe ji bo hêviyê amade kir, hîs kir ku bedena wê bi wê gelek sivik tê. Ji dilê wê dihat bêtir wê kêliyê xeyal bike, şîrove bike. Nêzikahî li kelehê kiribû. Bi van gotinan xwest êdî dev ji halê xwe berde û dîmenan temaşe bike:

– Keça min, hinekî guh bide dilê xwe; hişê te her bi aliyê demê yê fireh û bêdawî re mijûl e. Kêliyên demê carna reng didin demê. Belkî ew kêlî destpêka gelek tiştan e. Guh bide dilê xwe, dilê însan beleseb deng li însan nake! Ne zû ye, ne jî şîrove bike; di kêliyekê de, te ji wî hez kir, ew qas! Nemîne li benda demê, bêbextiyên demê jî hene!..

Êvarî, Osman savar amade dikir. Mîralî çû têlefonê diya xwe kir. Piştî li halê hev pirsîn Mîralî gotin anî ser Esma. Diya wî gote wî, “Nizanim lawê min, bar kirin û çûn. Kes nizane bi ku de çûn. Bavê te dibêje belkî jî wekî penaber çûne Ewropa.” Mîralî bi dengekî kelegirî xatir ji diya xwe xwest û çû mal.

Li mal, Osman henek li wî digirt da moral bide wî:

– Ê lawe min, ma êdî xema te Esma ye. Peykerek û jineke Frensî, kêf kêfa te ye. Li ciyek wekî Heskîfê…

Mîralî xwe li gotinên wî nekir xwedî. Her ku ji savara Osman amade dikir hez dikir jî nexwar. Hew selateya pîvaz û bacanên sor xwar. Bi qasî nîvqedehekê jî dew vexwar.

Osman mesele anî ser peyker. Ji Mîralî re got:

– Mîralî, bawer im te fam kir ku ji bo çi min hema nexwest em peyker rê rojnamegeran bidin.

– Nizanim.

– Bila bizanibin em cidî ne û li xwe miqate ne; binihêre, ew rojnameger dostekî min ê baş e lê dîsa jî xeyalên pereyandike û pere bixwe bêîman e.

– Ma em ê sibeh rê wan bidin, çi ferq dike?

– Gelek tişt... Binihêre, sibeh hew tu û rojnamegera Frensewî bin. Ne hewceyê min e.

– Çawa?

– Tu peykerî rê wê bide. Dû re em ê bazara xwe bikin. Çi wext pereyên me anîn da me wê çaxê em ê peyker bidin wan.

– Baş e. Ez ê li mal bidim wê.

– Na. Bibe gund, li ciyekê rê wê bide.

– Tênagihîjim?

– Em bi her hawî xwe biparêzên. Bila nizanibe peyker li ku ye.

– Li gund, ê kes li wê bikevin şikê.

– Na, tuyê bêjî rojnameger e. Wêneyan dikişîne û derbarê cîwarên kevn de lêkolînan dike.

– Baş e, got Mîralî.

Di wê kêliyê de şikeft û tirba li gund bi bîra wî hatin. Ez ê wê bibim, bêyî hayê gundiyan jê çê be, got xwe bi xwe.

Bejna Alîta bi ber çavên wî ket. Carek din li xwe mukir hat ku bê ew cil û kincên di rengê xweliyê de û cî bi cî jî qehweyî xwe dida der, çawa li bedena wê hatibûn. Ew reng bûbûn sedem Alîta û rengê Heskîfê li hev bikin. Şalpeya li dor stuyê wê jî bi rengê gewrek vekirî, dişibiya rengê axa riya kelehê. Rengê wechê Alîta ê sor hat ber çavê wî. Xwe bi xwe, "De xeyal li xwe şîrîn neke, tevnan ji bo xwe li dar nexe, karê derewan!", got.

8

Dotira rojê, Alîta hat Heskîfê. Mîna bi salan be li mala Osman mabe, bêxem, derket mal. Osman çûbû kar. Mîralî ew pêşwazî kir. Alîta, "Bonjour, merheba heval" got bi kenekî sivik. Mîralî silav li wê vegerand. Ew li ser nivînên Osman da rûnişxandin. Bi xwe jî li ser kanepeya kevn a li ber şibakeyê rûnişt. Mîna bêhn li Alîta teng bibe, rabû ser piyan, wê jî li Dîcleyê û li lingên pirê ên kevn bi tevî turbeya Mîr Zeynel nihêrî. Hinek bi wî halî man.

Mîralî ji Alîta re got ku ji bo peyker rê wê bide gere ew biçin gund. Saw û xofekê xwe li Alîta da der. Alîta piştî metirsîyan fikirî. Çend carên din li çavên Mîralî, li wechê wî nihêrî. Xemên di dilê xwe de da aliyek. Ew fikir qebûl kir. Mîralî ji Alîta pirsî bê birçiye an na. Alîta, "belê" got. Daketin, piştî xwarin xwarin li erebeyek ji Batmanê diçû Midyadê siwar bûn û çûn gund.

Neketin riya gund. Rê li xwe averê kirin. Di gelî de meşiyan. Mîralî ew bir şikeftê. Ji bo ku Alîta jî hilkişe jor, gelek têkoşiyan. Ciyê hildikişiyan dişibiya pêxirîkê. Ciyê dest û piyan pişirî bû, zor bû însan hilbikişiya. Her cara ku Mîralî bi destê wê digirt, lingên Alîta dişemitî. Cara dawî, Alîta bêyî bi destê wî bigire ji nişka ve hilkişiya. Piştî hilkişiya ew û Mîralî hatin pêşberî hev. Henaseya hev hîs kirin. Xalekî şîrîn li ber xamzeya Mîralî bû. Alîta bi awayekî normal û ji dil, dest li xalê da, çi şêrîn e, got. Mîralî bêdeng ma.

Bi qasî sê gavan meşiyan, çavên Alîta bi tirbê ket. Bi awayê ku heyran mabe li tirbê nihêrî. Wekî refleks, rahişt makîneyê û bi dehan wêne kişand. Mîralî li wê dinihêrî. Li ber kêlekê tirbê rûnişt û ma li benda wê. Alîta tî bûbû. Serî bilind kir û av bi ser xwe de kir. Mîralî rabû ser piyan. Xwîna Alîta bi wî şîrîn hatibû. Mîna hevalekî wê ê bi salan be axivî:

– Alîta, ez şevekê li vir razam.

– Çawa? Ji bo çi?

– Ez jî nizanim ji bo çi lê şevekî gelek xweş bû.

Alîta mîna bikeve nav şikê. Saw ew girt. Mîralî fam kir ku Alîta gotinên wî şîrove dike. Hema xwest bide ber dilê wê:

– Na, tiştên xirab nefikire. Çi zanim, tu hizûrekê didî însan. Xwîna te bi min şîrîn hat lewre min ew bîranîna xwe ji te re got.

Alîta bi xwe ve hat. Cixare kişand. Hîs dikir ku dilê Mîralî jî deng li Mîralî dike. Bi nefesên kûr cixare dikişand êdî. Dihat hişê wê da ku halê xwe ji Mîralî re bêje. Xwe bi xwe, "Ka sebir bike." got.

Di wê navberê de, Mîralî xwest bêyî hay Alîta jê çêbike peyker ji bêrîka xwe derxist. Peyker xistibû destê xwe. Hinek jî ber bi dîwarê şikeftê ve meşiya bû. Peyker da Alîta. Peyker di dest Alîta de bû lê mîna ne xema wê be tevdigeriya; di bandora cih û tirbê de mabû. Tu tişt negot. Bêdeng ma. Mîralî jî bêdeng bû. Alîta peyker da dest Mîralî û rûnişt. Mîna wate li gotinên Mîralî ên wekî, ez şevekê li vir razam, bigire:

– Mîralî, mereq li min xwe da der, gelo xewna li şikeftekê çawa ye, belkî rojekê ez jî li cihekî wanî razêm. Mîsal li Heskîfê, got. Mîralî kêliyekê li çavên wê nihêrî. Tişt negot. Alîta xwe li henekekê girt:

– Mîralî, kesên xwe li şikeftan bigirin dibin xwedî peyaman. Te çi peyam bi dest xist?

– Hûn hew kêliyekê bêdeng man.

– Min fam nekir?

– Mantiq nehişt hûn bedena xwe hinekî rihet berdin; hûn Ewropî di her tiştî de li mantiqekê digerin!

Alîta ne li benda şîroveya halê xwe bû. Cara pêşî bû ew qas kûr li çavên Mîralî dinihêrî. Mîralî serî ber bi jêr kir û mîna Alîta ne li wir be tevgeriya. Alîta hê jî wate li xwe, li halê xwe, li sedema rawestîna li wir nedigirt. Xwestek her diçû li wê zêde dibû. Ji nişka ve dît çend hêsir ji çavên Mîralî de barî. Alîta şok bûbû. Mîna aliyek dilê Alîta nerm bibe, pirsî "Mîralî, çi bû?" Mîralî, te pirsa peyamê ji min kiribû, got.

– Belê Mîralî. Li van deveran rastiyên çiya û şikeftan peyam in. Lê ew henekek bû.

– Henek. Belê. Alîta, peyama ku min piştî razana li vir bi dest xist ev bû, evîn ne henek e.

– Qey tu evîndar î?

– Belê. Lê evîndara min çû.

– Ku de çû?

– Ez hew dizanim çû û nema wê were. Ez doh hay jê çêbûm.

Alîta ber bi wî ve hat. Ew hembêz kir. Mîralî bêtir giriya. Alîta dixwest bigirî lê mîna bedena wê hîn nebûbe, nikaribû bigiriya. Dîsa li cihê xwe rûnişt. Cixare pêxist. Bi gotinên mantiqî dixwest bide ber dilê Mîralî:

– Ev rastiyên jiyanê ne Mîralî. Gerek eşq xisarê nede bedena te. Ez jî çend caran bûm evîndar. Aniha, carna bi bîra min tên. Bi hurmet bi bîr tînim hew, got bi dengê jinanî.

Mîralî hinekî bi xwe ve hatibû. Li çavên Alîta nihêrî. Bi axînek sivik re axivî:

– Alîta, gerek hûn bikaribin carna bigirîn, hinekî hînî girînê bibe. Girîn bi tenê ne ezab e.

– Baş e Mîralî. De tu jî bêtir bi mantiq bifikire. Xwe neêşîne, baş e?

Herdu keniyan. Mîralî pirs kir, em ji bo peyker hatin vir lê we tu tişt negot, hûn çi difikirin?

– Ka bila niha peyker bimîne. Em biçin.

Mîralî hinekî jî bi awayê xeyalşkestî rabû. Nizanibû, Alîta ji peykerî bêtir halê wan ê li wir û halê wî difikirî. Alîta du gav avêtin. Nedixwest biçe. Zivîrî. Li Mîralî nihêrî. Vê carê bi halekî hezkirî dest da xala li xamzeyê. Mîralî li wê nihêrî. Gotinek bi bîr anî. Gotina pêşiyên kurdan wanî bû, "dilê newêrek nikare bi sîngê gewr şad bibe". Mîralî bi destê wê girt û da ser dilê xwe. Alîta,

– Ecêb e lê mîna girîna we li xweşiya min çû be, got. Guh da dilê xwe. Dilê wê bi tepetep bû.

Heyecanê xwe li herduyan dabû der. Mîralî bi destê wê girt. Ew da rûnişxandin. Peyker xist bêrîka xwe. Alîta hê jî li xala li xamzeyê dinihêrî. Mîralî ew ramûsa. Alîta bi lêvên wî ket. Kêliyekê dîtin herdu li kêleka tirbê şilfîtazî ne.

Li dû pevşadbûnê bêhal, bi dilek sivik û xweşik rabûn. Mîralî hewl da cil û kincên xwe li xwe bike. Alîta mîna fikrekê bi dest xistibe Mîralî bi dûr xist û xwest wêneyên cilên xwe û ên Mîralî ên li erdê û li ser tirbê, ên belawela, bikişîne. Mîralî nehişt. Alîta heyirî. Mîralî makîne ji destê wê girt. Rengê rûyê wê kişand. Ew rengê ku belkî Alîta tu car nedîtibû. Mîralî hewl da cil û kincên Alîta lê bike. Alîta dîsa bi metelmayî û dilxweşî li wî dinihêrî. Li derketinê Alîta çend wêneyên tirbê kişand. Daketin jêr.

Li pêş derê şikeftê li rez û bexçeyan nihêrîn. Alîta xwe avêt hembêza Mîralî û ew ramûsa. Mîralî ew ji xwe bi dûr xist. Alîta mîna bi lêborîn axivî:

– Pevşadbûna li ciyên wanî bi min xweş tê, got.

Mîralî, ê kes me bibînin, ev jî ne baş e, got.

Tu kesî ew nedîtibû. Li Heskîfê, çûn xwaringehekî piçûk. Piştî xwarinê li kelehê geriyan. Halê wan ê li şikeftê ji ber çavên Alîta nediçû. "Bedenên şilftazî" got Alîta. Mîralî li wê

nihêrî. Alîta, “Bedenên şilftazî dibe sedem ez bêtir rastiya xwe û mêran şîrove bikim… Bedenên şilftazî, li ber çavên min dibin av, dibin pelg… Halê însan yê herî sivik bi bîra min tînin,” got. Mîralî bêdeng ma. Di dilê xwe de, gelo bedenên tazî çi bi bîra min tînin, got. Bedena Esma bi halê tazî nedîtibû. Baş bala xwe nedabû bedena tazî a Alîta jî. Lê hîs kiribû. Mîna tiştekî bidest xistibe kêfxweş bû. Ji Alîta re, “hîs kirin” bedenên tazî hîskirinê bi bîra min tîne, got. Alîta bi xweşhalî li wî nihêrî. Wext dereng bû. Mîralî gote wê:

– Alîta, dereng e, tu êdî biçe.

– Ez naxwazim biçim! Însan her ku tê kelehê naxwaze dev jê berde û biçe. Ciyek bi raz e. Însan dixwaze her li vir be. Em heya derengî şevê bimînin li vir.

– Cî, cî tune ye. Tuyê bişev li ku bimînî. Ne otêl heye ne jî ciyê tu lê bimînî.

– Mala we, got, hinek rawestiya, ji a xwe poşman bû. Na, nabe. Ez bi adetên van deveran dizanim. Baş e, ez ê biçim.

Ji kelehê de daketin. Bi rê de Alîta got:

– Ez ê ji rojnamegerî re bêjim ew peyker bi kêr nayê.

– Baş e, ji bo çi?

– Na, ne ku bi kêr nayê, lê bila ew nemîne di navbera me de.

– Lê Osman û kesê xwedî peyker?

– Tu ji wan re jî bêje bi kêrî tiştekî nehatiye!

– Nabe.

– Mesele ne ew e, ez çi dibêjim tu wanî bike.

– Baş e.

Hatibûn ber pirê. Bi qasî saetekê man li benda erebeya ji Mîdyadê de bê. Li wir, Alîta behsa Fransayê, jiyana li wir kir. Wesayît hat. Mîralî ew bi rê kir. Alîta, em ê di demek kin de hevudu bibînin, got û li erebê siwar bû.

9

Mîralî zûbizû ne li benda Alîta bû. Heta fikirî ku belkî êdî ew neyê jî. Hal mesele ji Osman re gotibû. Osman bi şadimaniyên wan kêfxweş bûbû; hîç nebe ê ev ciwan hinek karibe xwe ji wê êşê bike, got xwe bi xwe.

Osman çûbû dibistanê. Saet deh bû. Dengê derî hat. Dilê Mîralî lê da. Mîralî derî vekir. Alîta bêyî silav li wî bide ket hundur û mîna mizgîn bide, bi heyecan, axivî:

– Mîralî, ez doh bi şev girîyam, ez jî mîna te girîyam!..

Mîralî nizanibû çi bêje. Bêdeng ma. Alîta xwest li ser nivînên Osman rûnê. Mîralî bi destê wê girt û ew bir ser genepeyê. Bi hev şad bûn. Bi awayê westiyayî rûniştin. Li lingên pir a kevn dinihêrîn. Mîralî,

– Li lingên pirê baş binihêre Alîta. Te dîtiye, însan dibêje qey av dixwaze wan biparêze!

– Rast e.

Alîta bêyî sebir bike, Mîralî, min biryar da, ez ê wextek ne dîyar li Heskîfê bimînim, got.

– Ev ji ku derket?

Bi ken,

– Te bi serê min de anî!

– Tu baş fikirî?

– Belê.

– Tuyê rojekê evîna min û xwe jî hew bi hurmet bi bîr bînî?

Alîta mîna li xwe girtibe bêdeng ma. Wextekê bi wî awayî ma, got:

– Ez carekê be jî hînî girînê bûm, de ka tu jî her ne bi girî be! Binihêre, min gotineke pêşiyên we kurdan bihîst, dibêje, "însan bi peyvekê dihere cinetê bi yekê dihere cehnemê." Îja, ger bihuşta te ez bim, li peyvên xwe miqate be!..

Mîralî ji dil û can keniya. Alîta lîsteyekê çêkir û da Mîralî. Hemî sebze û sîparîş amade bûn. Alîta xwarinên ji hevaleke xwe a Fethîyeyî hîn bûbû dixwest amade bike.

Dolmeyên îsota sor amade kir. Îsota bi goşt û bi cûrbicûr bi baharatan amade kirin. Bêhn bi mal xist. Li ber jî gihayê sîrmastkirî amade kir. Nîvroyê Osman jî hat. Hem li hev pirsîn hem jî hewl dan li ser sifreya amadekirî rûnên. Osman pesnê xwarinan da. Ji wan pesnan rû li Alîta şîrîn dibû, xwîn bi rûyê wê ve dihat. Alîta hew selate û gihayê sîrmastkirî dixwar.

Piştî xwarinê Alîta fikra mayîna li Heskîfê ji Osman re jî got. Osman,

– Ger tu bixwazî, xanîyek heye li kêleka xaniyê me. Zilam wekî xêniyek tûrîstîk amade kiriye û dide kirê.

Alîta pir kêfxweş bû. Çûn cem xwedî xênî. Xwedî xênî piştî hin pirs kirin û bersivên li gorî dilê xwe wergirt, qebûl kir. Alîta heqê kirê da. Mifte girtin û çûn.

Xanî bi şelak bû; her alav tê de hebû. Her tişt hebû. Tu kêmanî tunebû. Osman û Mîralî alîkariya wê kirin. Alîta xwarin û ava amade kirî. Osman xwest biçe. Mîralî, ez ê jî biçim, got. Ew fikir li xweşiya Alîta neçû. Bêdeng ma. Osman, tuyê biçî ku, Alîta bi tenê nehêle, got. Osman çû.

Mîralî û Alîta bi kêfxweşî xwe bi awayekî serbest avêtin ser karyolayê. Xwedî xênî ji bo li xweşiya tûrîstan biçe xênî bi awayekî otantîk xemilandibû. Her şelak otantîk bû. Ji tasên sifir bigire heya etamîn ê li dîwêr ku bi şahê maran hatibû neqişandin. Atmosfera di odeyê de aramî dida wan. Alîta xwe li sohbet û pirsan girt:

– Mîralî, bi tevî hin rastiyên Rojhilat ên tirsnak, hêlên gelek otantîk, hêlên mîstîk însan cezb dikin.

Mîralî hin sohbetên bavê xwe û hevalên wî bi bîr anîn. Bavê wî û hevalê bavê wî jî gelek caran derbarê Rojhilat û Rojava de sohbet kiribûn. Mîna fikrên wî bin, gotinên wan got:

– Alîta, di rastiyên tirsnak de pariya we jî heye?

Alîta mîna vebiceniqe, bi halek metelmayî,

– Çawa, ma em dibêjin neguherin?

– Belê!

– Ev ne rast in. Ji zanîstê bigire heya hunerê rastiyên me bandor li her deverê dinyayê dikin. Hûn ji wan ders nagirin!

– Text, şûr nahêlin.

– Ev e, tu bi xwe dibêjî text û şûr nahêlin. Baş e, ma em ê karibin çi bikin?

– Hûn dibêjin bişibin me. Ji bilî xwesteka ku her kes bişibe we wekî din tu çareya we nîn e. Bi awayekî hûn bi van deveran ne beled in. Li gorî we ê kesên rojhilatî nikaribin jiyaneke modern bijîn!

– Belê Mîralî, piştî min jiyana li van deveran dît hay min jî ji hin rastiyan çê bû. Hîç nebe ez êdî dizanim jiyana şaristaniyan, bi awayekî sayakî, ne gengaz e bê derbirîn. Lê canêm, ev dawiya dawî dîsa tê li ser we dimîne. Ji wexta ez hatime vir ve û beriya ez bêm vir jî min gelek roman, pirtûkên lêkolînî xwendin. Şîrove di çanda we de ne bi hukm e. Herwiha afirînerî jî. Tew xeyal û honak, gerek ne wanî be. Ha, ev ne tawan e lewre çandên we rê nadin van tiştan. Zagon û tiştên sibûtbûyî ku însan nikaribe îtîraz bike henin.

Binihêre mînakek piçûk, ger Heskîf, Bexçeyên Babîl an jî Efes li Ewropa bûna heya niha ê bi dehan, sedan roman, çîrok, helbest li ser wan bihata nivîsîn. Ê wêne bihatana sazkirin. Şano bihatana lîstin. Gilgamêş bi tenê dikare bibe çavkaniya edebîyateke gewre. Li qisûrê nenihêrin lê we jî riyek rihet dîtiye, her xeletiyê biavêje stûyê ên din û deşarj be! Ha, ev gotin halê însanên van deveran baş bi nav dike, deşarjbûyîn!

Mîralî bêdeng bû. Zîvêr bû. Li çareyan digeriya da rê li gengeşiyê bigire. Xwe sûcdar didît bê ji bo çi pirtûk nexwendine. Xwe bi xwe, ê min jî înadek beleseb bû ye, min xwe li sîyasetê negirt. Ma ji bo çi min nexwend, got. Xemgîn bû, sohbet li xweşiya wî diçû lê nedixwest tiştan ji ber xwe de bêje. Bavê xwe bi xwezî bi bîr anî. Ew bi wan tewrên xwe ê hişk bi xelet bû lê sohbetên wî ên kûr, pirtûkxwendina wî, tespîtên wî... Ev e, ez êdî dizanim çiqas tiştên muhîm in, got di dilê xwe de. Sîyaset li dera ha, ma ji bo çi min bes pirtûkên edebî nexwend.

Alîta nema li benda bersiva Mîralî. Nedixwest sohbet bibe sedemê nakokiyan. Ji tecrubeyên xwe dizanibû û bûbû şahid ku hin kesên bes entelektuel nikaribûn deh rojan bi eşq bijiyana. "Ev jî rastiyek e" got xwe bi xwe Alîta. Ma ez ê ji bo çi bi Mîralî re bikevim gengeşiyê. Ew hezkirin û hîskirina wî bes e da ez dilşad bim. Ew hê di hin babetan de nekemiliye.

Bi destê Mîralî girt. Xwest wî ber bi sohbetên sivik ve bibe:

– Mîralî, tu hîç bi destan, çîrok an jî vegotinên mîtolojîk dizanî, belkî te jî di zarokatiya xwe de guhdarî kiribe?

Mîna Mîralî xwe ji barekî kiribe, beden bi wî sivik bû. Xweşhaliyek nazik xwe li wechê wî da der. Bi kêf, belê, ez dizanim, got.

– Çi baş. Tu dizanî hewcedariya rih carna bi tiştên ji rêzê, ên sivik ku karibin însan bi per û bask bikin, heye. De tu vebêje ez bibim guhdara te. Alîta şeraba anîbû bi bîr anî. Mîralî raweste, min şerab anî bû, got. Şerab anî. Du tasên sifir jî li ser sehpayek bi xesir çêkirî, bi cî kir. Şerab vexwarin. Alîta serê xwe danî ser çongên wî. Li wêneyê şahê maran dinihêrî. Mîralî jî bi dengekî sivik, jidil û bi hîs vegot.

Piştî Mîralî çîrokeke gelêrî vegot Alîta ew ramûsa. Wê jî behsa evîna xwe û yekî kurd kir:

– Mîralî, ew evîn ne ew qas kevn e. Sala çûyî, riya min bi ciyekê ket. Hin kurdên entelektuel li wir rûdiniştin. Ji ber xatirê hezkirina bavê min a li hember Yilmaz Guney ez carna diçûm wir. Li wir, min yekî kurd nas kir. Ew kesekî sîyasî bû.

Wî çiqas xwest xwe ji evînê biparêze jî ez bi rik bi ser wî de çûm! Piştî wextekê hevaltî û evîndariya min û wî dest pê kir.

Rojekê ez û ew digeriyan. Ha, min navê wî ji te re negot, navê wî Bedrî bû. Bedrî ji min re got, gundîyekî me bi awayê fîrarî hatiye Îtalya. Gerek ez biçim bi texsiyekê wî bînim. Em bi texsiya min çûn. Me ew anî Fransa. Gundiyê wan ne sîyasî bû. Ji bo debara xwe hatibû. Piştî wextekê, Bedrî behsa wî ji min re kir:

– Alîta, ew lawik ji alî cinsî ve ecêb e. Êdî kî jê re çi gotiye ez nizanim, ji wî wetir hema jin giş li benda wî ne! Derûniyek ecêb bi wî re heye. Hema çavên wî li ser jinan e!

Min û Bedrî bi henekî behsa, kampa şilftaziyan kirn. Bedrî, ez ê wî bibim wir, got. Roja mayîn Bedrî wî dibe wir. Navûdilê lêwik diqulibe. Naxwaze li wir bimîne. Ligel demê lawik xwe ji halê xwe ê hişk dike.

Mîralî keniya. Xwest sedem der bike:

– Li gundan, kalemêr li hev dicivin, henek li hev dikin. Pirî henekên wan jî pornografîk in, însan nikare bêje pornografîk jî; bi awayek wanî ew henek dihatin kirin însan hew kêfxweş dibû. Alîta, jiyana li gundan ne henek e, ne perwerdehî, ne derfet û bi ser de jî jiyana feodal. Bindestî sedema sereke ye. Baş e ku çandeke kûr a şaristaniya Mezopotamya heye. Mîralî, peyva bindestiyê carek din di dilê xwe de dubare kir.

– Ne hewce ye tu ji min re bêjî. Bedrî gelek tiştan ji min re gotibû. Lêkolînên bavê min jî derbarê dîroka kurdan de hebûn. Carna ji me re jî digot. Kurd, çivîkek di qefesê de, bi bîr tînin.

Her ku dubarekirina navê Bedrî êdî li xweşiya Mîralî nediçû jî gotinên dawî ên Alîta ew xist bin bandora hestiyariyê.

10

Alîta her ku bîst û heftsalî bû jî, însan salên wê tê dernedixist. Bi tevgerên sivik alavan, li gorî xwe, bi cî kir. Li aliyekê jî axivî:

– Mîralî, belkî jiyan tiştekî wanî ye, ji nişka ve û bi awayê însan nikaribe bawer bike, riyên wanî balkêş dide pêş we. Hûn jî metelmayî dimînin. Heya beriya çendekê jî çi pîlan û pûşnameyên min hebûn. Niha, pîlan bi min wekî tiştên ji rêzê bin.

– Ka li halê min bipirse, hewl didim Esmayê û evîna xwe û wê, wekî hurmet bi bîr bînim. Nizanim ez ê biserbikevim an na. Biherhal zor e.

– Bihêle, bihêle bila bi halê xwe bimîne.

Alîta pirs ji wî dikirin wî jî derbarê jiyana xwe de, tiştên, di jiyanê de, şop li rihê wî hiştibûn vedigot. Bêtir jî behsa xwe û Esma dikir.

Mîralî jî ji wê xwest behsa xwe bike. Alîta dest pê kir:

– Ez li Parîsê, li Evry ji diya xwe bûm. Bavê min însanekî entelektuel bû. Ez di zarokatiya xwe de bi bapîra xwe re her diçûm keviyê avê. Rojekê, dê û bavê min biryar dan da bapîra min bibin mala kalepîran. Piştî bapîra min birin, her carî, ez diçûm bi avê re diaxivîm. Li mal û di jiyana me de, her tişt xwedî sedemek bû. Gerek em bi qaîdeyan tevbigeriyan. Qaîde

û fikrên girgîn, qaîde û fikrên girgîn; belê ne tiştên ew qas xirab in lê wextek tê însan bi tevahî bi dil û hest sar dibe.

Belkî ji ber vê ye ku ez wekî rojnamegerekê hatim vî welatî. Çerçawa Rojava bi hin hêlên xwe, bi we Rojhilatiyan, balkêş tê, bi wî awayî, erdnîgarî û çanda we jî ji ber hin hêlên xwe bala me dikişîne. Ez bi şens im ku dikarim hêlên xweş ên her deverî bijîm. Bawer im te ji ber vê rastiyê ji min re got, hînî girînê bibe.

Mîralî, tiştên di zarokatiyê de ji me re tên gotin bandor li me dikin. Bavê min çend cara, bi pesin, behsa Yilmaz Guney kiribû. Bavê min, carê du caran, ew dîtibû. Ez wextê hatim van deveran, her ku min li însanan dinihêrî, min dixwest ez kesên dişibin Yilmaz Guney bibînim.

Axaftina Alîta û dengê wê ê gelek nerm û bi rîtîm li xweşiya Mîralî diçû.

Alîta rabû, şibake vekir. Xwe li dengê Dîcleyê girt. Bangî Mîralî kir, "Min hembêz bike" got. Mîralî ji paş ve ew hembêz kir. Alîta ez aniha xwe û te mîna du çivîkan xeyal dikim. Binihêre em ber bi daran ve difirin, li wir bi hev şad dibin. Aniha jî em li ser ewrên bihara dereng ên mîna pembû ne. Li wir, em hem bi hev şad dibin hem jî diqîrin, got. Li xweşiya Alîta diçû. Alîta jî peroşên xwe der kir:

– Aniha em dîsa li şikeftê ne. Piştî em bi hev şad dibin û gotinên herî xweş ji hev re dibêjin, deng bi tirbê dikeve. Ji me dixwaze ew halê me her berdewam be…

Rih li wan sivik bûbû. Mîralî pirsî, ev xwîna jinan ji bo çi ew qas şîrîn e? Alîta, bi gelemperî wanî ye lê hin jin bi destê xwe xwînê li xwe tirş dikin, got. Mîralî dom kir, di çîrokekê de, dêwek her roj diçû xwîna keçikekê dimêt. Ew sehne tu car ji bîra min naçe. Alîta li wî ziviri, xwîna lêvên min bimête, got. Mîralî bi halê xwe ê bihestîyar û sivik lêvên wê maçî kir. Bêdeng man wextekê. Mîralî bi henaseyek kûr re, baş guhdariya Dîcle bike, bê çi ji te re dibêje, got.

– Mîralî, tu mîna zarokekî yî!

Pêşî her ku gotina zarok bi Mîralî sar were jî nexwest bê bersiv bihêle:

– Di jiyanê de bi tenê tiştekî heye ji eşqê hêjatir e, ew jî dilê zarokan e.

– Na na, ew halê te li xweşiya min diçe, tiştên sivik û zarokane bi bîra min tîne… Tu zanî ez dizanim ji bo çi te ez birim şikeftê!

Mîralî hem metelmayî ma hem jî mereq kir:

– Ne ji bo tiştekî, ji tirsan min peyker li wir veşartibû!

Alîta bi kenekî sivik û vehewîner li wî nihêrî. Ew maçî kir û axivî:

– "No" Peyker di bêrîka te de bû. Te xwest ez wanî bifikirim. Tiştekî din jî heye, te ji peyker bêtir xwe li min girtibû. Tu li kesekê li hevalekê digeriyayî. Dilê te li min germ bûbû. Ez jin im û min ew halê te hîs kiribû. Ne welê bûya ez ê çawa bi te re heya wir bihatama!

Mîralî, hew bi nêrînên şîrîn, xwest wê piştrast bike. Alîta piştî wan nêrînan xwe bêtir di hembêza wî de bi cî kir. Çavên xwe girt û bû guhdara dengê avê. Xew bi çavên wê ket. Cixare vêxist. Xem mabû di dilê wê de, bi axînek sivik re got:

– Vê havînê komek hevalên min hatin Heskîfê. Piştî gelek geriyan, westiyan. Dixwestin bikevin avê. Hewz li vir nîn e. Wan xwest bikevin ava Dîcleyê. Min ew şiyar kirin ku ew fikir ne baş e lewre ê mirov bi çavekî baş pêşwazî nekin. Tu zanî, ew xem bi min re jî maye. Dixwazim çemê diherike hîs bikim. Hinek rawestiya Alîta. Henek kir. Mîralî, belkî herikîna avê peyamekê bide min, tu çi dibêjî?

– Ger tu bixwazî, sibeh, em biçin ciyek ku kes me nabîne. Li wir, em bikevin avê, lê av niha sar e.

– Ez aniha dixwazim. Bila sar be.

– Vê şevê!

– Belê. Em hînî girînê nebûne lê tiştên em jiya ne û çîrokên jiyana me li xweşiya me diçe!

– Tu û kêfa xwe!

Rabûn û derketin. Xwe li sikaka ku rê dida ber bi kelehê ve negirtin. Deriyek xanî li alî Dîcle vedibû. Xwe di kaşî de berdan. Bi awayê ku kes wan nebîne meşiyan. Li keviyê Dîcleyê meşiyan. Çûn li ber zinarê kelehê rawestiyan. Alîta hema kinc ji xwe kirin û ket avê. Mîralî nedixwest bikeve avê. Alîta her ku çend caran teklîfatî lê kir jî ew neket avê. Metirsiyên xwe derbir:

– Alîta şev e, çi dibe çi nabe, ez bi xem im.

Alîta mîna gef li wî bixwe:

– Ger tu neyê ê tu wate nemîne. Were. Binihêre, tu neyê ez ê bikim qêrîn!

– Ku tu bikî qêrîn ez ê bimeşim û biçim.

– Were. Gelek xweş e. Ez naxwazim tu ji vê xweşiyê bêpar bimînî.

Mîralî kinc ji xwe kir. Hêdî hêdî ber bi wê ve meşiya. Alîta bi destê wî girt. Her du mîna du pelên li kokekî asê mabin sivik û li ciyê xwe man.

Bi qasî bîst deqîqeyê man di avê de. Ji avê derketin. Bedenên wan dilerizîn. Alîta rahişt pêjgîra mezin. Mîralî hembêz kir û bi pêjgîrê herdu bedenan rapêça. Çend caran xala li xamzeyê maçî kir. Rûniştin. Mîralî diya xwe bi bîr anî. Di ber xwe de keniya. Alîta pirsî:

– Çi bû?

– Diya min bi bîra min hat. Wê her carî ji min re digot, emrê te emrê avê be.

– Çi diayek xweşik. Bila temenê evîna me temenê avê be.

– Tu bawer dikî?

– Mîralî, tişta ku evînan, bi temen dike ne dem e, şopên evînê ne.

Mîralî li hember gotinên wê keniya. Alîta fam nekir bê ew ji bo çi dikene:

– Ken ji bo çi?

– Alîta, bala min dikişîne; tu min xort dihesibînî. Ev baş e lê di her axaftinê de mîna tu ders bidî min. Ez zanim ji nîyeta baş e lê…

– Lê?

– Rica ji te dikim, dersa evînê nede min. Li van deveran, em di çardehsaliya xwe de bi evîn dibin. Bi ser de jî evînên ku şop dihêlin.

Alîta keniya û ew maçî kir. Bêdeng ma. Li dû gotinên Mîralî bi ser jiyana xwe de fikirî. Çû demên çardehsaliya xwe. Cara pêşî ku ew bi eşq bûbû diya wê her carî xwestibû dersên cinsî bide wê. Kesî behsa lêdana dilê wê nekiribû. Ew tîna ku wê çaxê xwe di dilê wê de dabû der ji bo kesî nebûbû xem. Diya wê her jê re behsa têkiliyên cinsî kiribû. Xwestibû rê li ber wê bixe da gere ew heya çi radeyê xwe li şadbûnê bigire. Xwe ji hin kêliyên bi şehwet biparêze. Gotinên Mîralî bi bîranî. ' Hûn di her tiştî de xwe li aqil digirin '.

Hinek li ser têkiliya evîn û mantiq fikirî. Pirs ji xwe kir. Gelo mantiq û evîn dikarin li hev bikin? Wextê mantiq were, cî dimîne ji bengîtiyê re?

Dîcle pêl vedida. Mîralî, em biçin kelehê, got. Ew fikir li xweşiya Alîta jî çû. Xwe li kelehê girtin. Mîralî ew bir cem mexzenê. Hinek li wir rûniştin. Alîta bi destê wî girt û ew bir riya di zinêr de hatî çêkirin. Heya ciyekê însan dikaribû bimeşiya. Alîta û Mîralî li cihekê ku karibin rûnên rawestiyan. Alîta pirs ji Mîralî kir:

– Te hay jê heye ne, ji niha de, behs dikin dê Heskîf di bin avê de bimîne.

– Belê. Gundî û nişтecihên Heskîfî behs dikin.

– Hêdî hêdî însanan hînî wê fikrê dikin. Ditirsim ku wê rojekê ev bajar di bin avê de bimîne. Ger ev cî li Ewropa bûya dê însan bi her hawî xwedî lê derketana.

– Tu rojnamegerek e, niha hevalên te jî hene. Binivisîne.

– Carna em dinivîsînin lê ne bes e. Ez ji te re tiştekî bêjim. Ne xema desthilatiyên Ewropî ne ku Heskîf di bin avê de dimîne. Hay ji rastiyê hebin. Çi wext dengên qube hilbin ê wê çaxê ew ê bifikirin. Mîralî, heya min te nas kir jî a rast mayîna Heskîfê a di bin avê de ew qas min eleqeder nedikir. Belê, wekî jinekê cihekî wanî li xweşiya min diçû lê hew bi halê xwe ê otantîk bandor li min dikir.

– Alîta, tu dibêjî qey bi mehan e em hevudu dinasin! Di demek ew qas kin de, min çi bandor li te kir?

– Meseleya peyaman. Ji bo peyaman, demên dirêj navê. Ew şikeft, beriya çendekê, halê me ê di avê de… Halê girînê… Di rihê min de cî dan xwe. Aniha ez bi çavekî din li Heskîfê dinihêrim.

– Bala min jî dikişîne. Tu hîç behsa peyker nakî. Qey tu gelekî dewlemend î?

– Ji alî aborî ve jiyaneke min a xweş heye lê ez ne dewlemend im. Piştî axaftinê, hinek fikirî. Xwest êdî meseleya peyker bi awayekî hel bike. Mîralî, ez dibêjim peyker hê di bêrîka te de ye, ne?

– Belê.

– Ka bide min.

Mîralî peyker da wê. Alîta, peyker xist destê xwe. Carê du caran lê nihêrî. Peyker maçî kir. Bi halekî heweskar peyker li ser memikên xwe û sîngê xwe gerand! Bi awayê ku bi peyker memikên xwe mis bide tevgeriya! Mîralî bi wate lê bi madekî tirş li wê nihêrî. Alîta dû re peyker da ser xala li xamzeya Mîralî û ji nişka ve peyker avêt riya di zinêr de!

Mîralî kir qêrînî û bi dû peykerî ket. Alîta deng li wî kir:

– Meçe Mîralî. Tuyê heya cihekê biçî, rê li zinêr wenda bûye. Meçe.

Mîralî teng zivîrî. Bi hêrs bû:

– Te ji bo çi wanî kir?

Alîta bi destê wî girt. Ew ji rê derxist û bir li ber Seraya Piçûk da rûniştin. Dilê wê cixare dixwest lê wekî tevdîr pênexist. Nedixwest ji ber çirûskên cixarê kes wan bibînin. Bi dengekî nerm xwest bide ber dilê Mîralî:

– Ew peyker ji alî pereyan ve ne ew qas bi nirx bû. Ger binirx bûya jî gere me biavêta; Mîralî, ger te peyker bifrota çi ferqa te û kesên dixwazin Heskîfê di bin avê de bihêlin bima? De bêje delalo!

Alîta peyva, delalo, bi kurmancî got. Mîralî di ber xwe de çû. Alîta dirêjahî da axaftina xwe:

– Ma zor e ku ew riya di zinêr de bê restorekirin, na. Ger bihata restorekirin ew rê bi tena serê xwe bibûya heyecanek di dilê însanan de. Ew rê bi tenê ê bibûya sedem ku însan tu carî Heskîfê ji bîr ve mekin. Lê restore nakin. Nîyeta wan kifş e. Ê Heskîf di bin avê de bimîne. De bi awayê ku tu peyamekê ji Heskîfê bi dest bixî binihêre… li ber peyker mekeve. Ew çû cihê xwe. Jixwe ê li cihekê asê bimîne. Ger rojekê Heskîf di bin avê de bimîne jî bila ew peyker nekeve destê însanên ku hew cihên wanî ji bo berjewendiyan difikirin.

Mîralî bêdeng ma. Bi awayê ku fedî bike pirsî:

– Te peyker li xamzeya min da. Min ew fam kir. Te ew maçî kir min ew jî fam kir. Lê te ji bo çi bi peyker pêsîrên xwe mis da?

– Tu xort î, rast e, gere min texmîn bikira bê tu hê jî nafikirî bê pêsîr xwedî çi wateyan in.

– Her carî xortaniya min li rû min nede.

– Delalo, ez ji te hez dikim. Xortanî tiştekî pir bi qedr û qîmet e. Ha, min ne ji bo ku şehwet li te xwe bide der wanî kir. Bajarên wanî û mayînde mîna pêsîrên jinekê ne. Heta em dikarin bêjin pirtûkên bênav in. Xwezî riya Tolstoy, xwezî riya Voltaîre, riya Sartre, riya Kafka, Vîctor Hûgo bi Heskîfê biketa. Xwezî delalo, yek ji wan kesan bi qasî çend hefteyan

li Heskîfê bima. Xwezî Heskîf mekan bûya ji bo kilasîkek rojava…

Hinek bi xem bi dilek hestîyar serî danî ser sîngê Mîralî. Bi dengekî nermtir xweziyên xwe zêde kir:

– Xwezî riya Îsa, Mûsa bi vî bajarî ketibûya.

– Alîta, Osman ji min re got, helbestvanekî kurd li vî bajarî bi eşqê ketiye. Evîndarekî mezin bûye.

Alîta nexwest dil li wî bişkîne. Li gotinên wanî geriya ku Mîralî zîvêr nebe:

– Ez nizanim. Belkî jî. Kes hê we kurdan baş nas nake. Îja helbestvanên we, wêjevanên we… Mîralî, bala min kişand, kurd aniha bi sîyasetê ketine li vê herêmê. Lê tu hîç behsa sîyasetê nakî?

Mîralî bi kûr de çû. Nedixwest behsa bavê xwe û bavê Esma bike ku bê wan çi bi serê evîna wan de aniye. Xwest bi gotinên sayakî bersiv bide:

– Ez li metropolan mezin bûm. Sîyasetê hîç bala min nekişand. Ez jî li van deveran dibim şahidê gelek tiştan. Pirs xwe di serê min de didin der. Li bersivan digerim. Nizanim.

Alîta mîna ji pirsa xwe poşman bûbe xwest bala Mîralî sivik bike; Alîta wê çaxê dibihîst ku rojê bi dehan xort û keç berê xwe didin çiya. Tirs bi dilê wê ket ku ger zêde behsa sîyasetê bike îhtîmal bû ku Mîralî jî ji dest wê biçûya. Mîna îhtîmalek dûr be jî tirs bi dilê Alîta ket:

– Kesên wekî te, bi vî halê xwe jî, dikarin xizmet ji însanan re bikin. Tu mamoste yî û zarok li ber destê te mezin dibin.

– Ez ji pîşeyê xwe hez nakim. Dixwazim bi awayekî serbest bim.

Ew gotin li xweşiya Alîta çû. Mîna hêviyek dûvdirêj di dilê wê de xwe bide der. Bêdeng man. Mîralî, ez dixwazim ji bo Heskîfê tiştekî bikim, got. Alîta, ez jî, ez jî dixwazim. Em bifikirin, got. Mîralî bi henek,

– Em bi navê Heskîfê peyaman bidin însanan, got!

Alîta, carna tu ne mîna xort bî diaxivî, got.

– Baş e ku li xweşiya te çû.

– Fikrek baş e. Ji niha de em li peyaman bifikirin.

– Baş dibe.

– Mîsal, aniha hemî şêniyên bajêr derkevin derve, di dest wan de meşale hebin, li her deverê Heskîfê belav bin dê çi xweş be.

– Ne şevekê.

– Heya ku dinya hîsdar be. Heya ku dengekî bilind xwe bide der, her şev hemî însan bi meşaleyan bigerin…

– Em ji însanan re bêjin.

– Nabe, ger hay hikumeta we jê çêbe ê min jî te jî biqewirînin.

– Wê çaxê?

– Em ê li riyan bigerin. Ev dever ne cihekî mezin e; em bi dehan kaxizan lê bikin û bi şev li zinar, minare, qube û ciyên din ve kin.

Heyecanekê xwe li Mîralî da der. Alîtayê ramûsa. Piştî ramûsanê Alîtayê fikir li fikrê zêde kir:

– Ger însan xwe li çalakiyê bigirin ez ê jî hemî rojnamegerên nas bînim vir û ê Heksîf bikeve ser zar û zîmanan.

Ber bi bajêr meşiyan. Di rê de jî bi fikran re mijûl bûn.

11

Roja dîn dereng şiyar bûn. Mîralî ji ber ku nediçû kar mîna wijdanê wî ji bo zarokan nerihet be. Li hêlekê jî nedixwest dev ji Alîta berde. Di nav nivînan de difikirî. Geh Esma geh jî Alîta û tiştên bêyî bi destên wî diqewimîn.

Alîta jî şiyar bû. Bi heweskarî li Mîralî nihêrî. Li saetê nihêrî. Bi lez, ji nav nivînan derket. Du hêkên xav bi tevî du qedeh av anî. Hêka xav vexwar û bi ser de av vexwar. Xwest Mîralî jî vexwe. Navûdilê Mîralî lihevket. Bêxatiriya wê nekir. Piştî vexwar mad li xwe quliband. Alîta keniya.

Alîta bêyî bi Mîralî re mijûl be tiştin nivîsî. Kêliyekê ji Mîralî re got, de tu jî peyaman lê bike. Mîralî rahişt kaxiz û qelemê. "Îro gotinek şîrîn ji zarokên xwe û hezkiriyên xwe re bêjin." lê kir. Ji bo diruşmeyan bêtir fikirî. Bêhn li wî fireh bû; rahişt pênûsê, "Ka îşev bi destê hezkiriyên xwe bigirin û gotinên herî sivik ji wan re bêjin" lê kir.

Li Alîta dinihêrî. Piştî nîvsaetekê Alîta defter xist çenteyê. Li kaxizên ku Mîralî nivîs lê kiribû nihêrî. Xwend. Tîqîn bi wê ket. Li dû tîqînê nema li benda Mîralî da ew tiştekî bêje:

– Mîralî, wê çaxê em li vir dest pê bikin. Keremke, bi destê min bigire û gotinên sivik ji min re bêje.

– Tu mîna ava şevê yî.

Alîta ew da ber ramûsanan. Mîralî hembêz kir.

– Tu jî rengê pêsîrên min î, got.

– Rengê pêsîran!

– Belê, em jin, ji we mêran bêtir, ji pêsîrên xwe hez dikin.

Herdu keniyan. Alîta pirs ji wî kir:

– Delalo, min got derbarê Heskîfê de peyaman lê bike. Ka me ê lêbikira da ew meşaleyan bigirin û bi şev li her deverî belav bin?

– Em pêşî ji jiyana wan de dest pê bikin. Bila bi seyr be. Em bala wan baş bikişînin, hê.

– Baş e.

Mîralî çû. Topek kaxiz anî. Bi qelemên stûr lê dikirin. Li pêncî kaxizî,"Îro gotinek şîrîn ji zarokên xwe û hezkiriyên xwe re bêjin" lê kirin. Êvarî kaxiz bi cihên balkêş ve kirin.

Dotira rojê, rojeva Heskîfê ew afîş bû. Alîta çû Batmanê. Li Batmanê ji bo kovarek edebî çîroka xwe bi rê kir. Nûçeyekê jî di derbarê Heskîf de lê kir.

Êvarî gomlekekî di rengê asîman de, bi tevî fanêreyekî sor ê vekirî kirî. Dageriya Heskîfê. Mîralî bi heyecan jê re got:

– Heskîfî bi afîşên me re mijûl in. Leşker ketine nav lêpirsînê. Însan afîşan şîrove dikin.

– Her ku bi min wekî macerayekê dihat jî xuya ye rojên rengîn li benda me ne.

– Lê ez ji bo te fikaran dikim!

– Ji bo çi?

– Bi awayekî ê li te bikevin gumanê.

– Tişt pê nayê. Ez rojnameger im.

– Ê te ji vir biqewirînin û pîlanên me jî bi avê de biçin.

– Tu pîlanan ji xwe re dikî xem an min?

Mîralî keniya.

– Pêşî tu, dû re pîlanên me.

– Tişt pê nayê. Êvarî em peyamên din lê bikin. Sibehê ez ê biçim Batmanê. Çend rojan ez ê neyêm.

– Çûne dikana ku min kaxiz jê kirî bû. Xwedî dikanê tu agahî nedane serbaz.

Êvarî yek bi yek peyam lê kirin:

“Îro navekê li jiyana xwe bikin.”

“Îro roja şûştina dil e.”

“Îro, heya êvarî, Heskîfê hîs bikin.”

“Sibe êvarî saet di dehan de rahêjin meşaleyan û li her deverî belav bin.”

Biryar girtin. Ê Mîralî bi awayê ku kes şik nebe, peyder pê, wan afîşan daliqanda. Afîşa dawî ê di yekê mehê de bihata daliqandin. Alîta bi tevî gelek rojnamegeran ê li wir amade bana.

Heya sibehê bi sohbet, şadimanî û pîlanan re mijûl bûn. Destê sibehê Alîta çîrokek ku ji kovarekê re bi rê kiribû xwend ji Mîralî re. Navê çîrokê, Dojeha Nivîskaran, bû. Çîroka li jêr ji ber babeta xwe û ji ber bêxewiyê nebû sedem da Mîralî şîroveyan bike. Mîralî hew, baş e, got.

“Pirtûk dixwend. Bi qasî sî rûpelî mabû biqede. Biryar dabû dê bi dubareyî heya destê sibehê pirtûkê bixwîne. Pirtûk qedand. Nîşe wergirt. Li dû nîşeyan çend pirs lêkirin.

Destê sibehê xew bi wî gelek şîrîn bûbû. Serî da xewê. Piştî şîyar bû, “Ez ê bi awayekî pirsên xwe arasteyî nivîskar bikim” got. Piştî çend rojan haydar bû nivîskar kesekî miriye. Bêçare ma.

Rojekê du roj hefteyekê bi berdewamî di pirtûkê de li bersiva pirsan geriya. Pirsên wê bê bersiv man! Ew kaxiza nîşeyan ma di bêrîka wê de.

Rojekê bê hay ew kaxiz avêt sergo. Her tişt bi nivîskarên mirî eyan e! Lê hew problemek heye ew jî ew e ku bi tenê nivîskarên mirî nikarin hay ji pirsên xwendevanan çê bin! Nivîskarên mirî hay ji pesnên xwendevanan dibin. Hay wan ji her halê xwendevanan ê wextê xwendinê dibe lê ew tu car nikarin hay ji pirsên xwendevanan bibin.

Wextê pirsên keçikê li ser sergo tê dîtin nivîskarê mirî dikeve nav liv û lebatê. Ji ber ku li welatê nivîskarên mirî fort, fen û fût û ezitî nîn e. Nivîskarê mirî hewarî digihîne hemî nivîskarên bi zimanê wî dizanin. Civatekî giran tê gerandin. Bi şev û rojan tê mitalekirin, şêwr tê kirin. Her nivîskar texmîn dike û texmînên xwe ên di derbarê wan pirsan de vedibêje.

Dawiya dawî biryar tê dayîn. Ji nivîskarî tê xwestin bê naveroka berhema wî, têmayên berhemê çi bûne. Nivîskar naverok û têmayên berhemê dibêje. Bi sedan nivîskarên mirî di derbarê heman babet û têmayan de berhem lêdikin. Piştî salekê heman civat tê gerandin. Bi dor her nivîskar berhema xwe dixwîne. Û nivîskarên din hewl didin pirsan bikin. Bi wî awayî hemî berhem tên xwendin. Bi hezaran pirs xwe didin der lê dîsa jî dilê nivîskarî bi cî nayê. Bi xem dimîne.

Giş bêçare dimînin. Xwezîya xwe bi nivîskarên di bihuşta nivîskaran de tînin; çi nivîskarên gewre hene piştî mirinê bi xwendevanan re têne bi cî kirin. Çi nivîskarên bi qebhet hene wan dişînin dojeha nivîskaran. Li dojeha nivîskaran, bi tenê, nivîskar, hene!

Wext derbas dibe. Li bihuşta nivîskaran nivîskarek qebhetek dike. Wî nivîskarî dişînin dojeha nivîskaran. Çerçawa diçe, nivîskarê bixem tê cem wî û hal û meseleyê ji wî re vedibêje. Nivîskarê ji bihuşta nivîskaran hatiye, dikene. Wiha dibêje:

"Ger bersivên te hebûna dê keçikê bi dubareyî pirtûka te nexwenda. Tu nivîskarekî mezin bûyî lê hay te ji te tunebûye. Ger li dinyayê tu bi xwe beled bûya dê tu nehatibûyayî dojeha nivîskaran. A rast, keçikê pirs ji te nedikir. Pirsan ji xwe dikir; berhema te bû sedem ku ew pirs ji xwe bike.

Wê dest pê kir rihê xwe deşîfre bike. Pêşî mîna pirsan ji te bike tevgeriya lê mesele ne wanî bû. Ger ne wanî bûya ê bi rihetî kaxiz ji bîr ve nekira û neavêta ser sergo. Tu, hê jî, ji xwe ne beled î. Dixwazî xwendevan her û her bi berhema

te re eleqedar be! Halbukî, ne wanî ye. Xwendevan piştî berhemekê dixwîne hew bi carekê bi tenê jî bikene bes e,ew berhem berhem e."

Nivîskarê bixem li asîman nihêrî. Li halên xwendevanên xwe nihêrî; ji xwendevanan jê hinekî dikeniya, hinan jê pirs dikir, gelek jê jî difikirî... Nivîskarê bixem mîna hay ji xwe çêbe axivî:

– Ez hatim dojeha nivîskaran. Rast e lê mesele bi tenê ne bêbeledbûna min e. Min li dinyayê rê da xwendevan da rihê xwe deşîfre bikin lê meseleya deşîfrekirina rihê min ji bo min nebûbû xem. Min her taloq kir û rojek hat mirinê bang li min kir."

Alîta poşman bû ku çîrok ji Mîralî re xwend. Xwebixwe:

– Ev çîrok ê çi bala Mîralî bikişîne. Xwezî min çîrokekê derbarê xwe û wî de lê bikira, ji wî re bixwenda. Ji nişka ve, "Ma ez ê ji bo çi çîroka xwe û wî nekim roman. Romanek bi navê, "Peyam" ê balkêş be.

Mîralî ji wan fikir û xeyalên Alîta bê hay, serî danî ber şibakeyê. Alîta jî li cem wî rûnişt.

12

Sibehê bi ava mêweyan bi tevî hêkên kelandî taştê xwarin. Mîralî, mîna bixwaze dilê wî baş bi cî bibe, pirs ji Alîta kir:

– Alîta, fikra te çi ye, em ê karibin dengekî bi Heskîfê bixin?

– Li derdorên mabedên Bûdîstan bi her hêlî ve ben hilawêstî ne. Li ser benan bi sedan alên diayan hene. Li gorî baweriyên wan ên kevnare, dia bi saya bê digihîjin her deverî. Her ku baweriyek kevnare be jî çendek ji wan gelek guhê xwe didinê. Îja tiştê em dikin ne baweriyek kevnare ye. Êdî bi min jî balkêş tê û bi bawer im ê dengekî xweş bide.

Alîta jî êdî di derbarê hezkirina xwe û Mîralî de her ji xwe pirs dikir. Xwe bi xwe," Aniha gelek xweş e û xweş diçe, piştî wê dê çi bibe?"

Alîta çûbû Batmanê. Êvarî, Mîralî hal û mesele ji Osman re got. Osman hinekî li xwe girt bê ji bo çi haya wî jê çênebûye. Hewlên wan mîna çalakiyên zarokan bi nav kir. Mîralî her ku xwest wî qanih bike jî Osman tu cidîyet lê negirt. Mîralî, tu dizanî, ez ê her bidomînim, got.

Çend şev borî. Mîralî, şevekê hemî afîş daliqandin. Hew afîşa dawî mabû. Ew jî ji bo dîroka destnîşan kiribûn hişt.

Gengeşiyên li Heskîfê gihîştibûn gund û navçeyên din jî. Osman, nedixwest ji a xwe bê xar. Rewşa Osman jî xemgînî dixist dilê Mîralî. Gotinên Osman ên wekî, tu li halê me

binihêre, tu li çalakiyên sivîl ên me binihêre, êş didan Mîralî. Wekî xortaniya xwe diqehirî û gazin dikirin Mîralî:

– Ev ne çalakî ye. Me xwest jiyanê bi bîra însanan bixin. Ger bêwate bûya ê ji bo çi însanan ew qas şîrove bikira?

– Tiştên ji rêzê li xweşiya girseyan diçin.

– Baş e, tu her carî behsa jiyaneke ku rojek bê dikî. Ev xweş e lê jiyanek jî diherike. Ma însan nikare ji niha de hem jiyanê li xwe xweş bike hem jî têbikoşe?

– Ya rast ji niha de ne hewce ye em şîroveyan bikin. Bila wext ji bo her tiştî bibe bersiv.

Dev ji gengeşiyê berdan.

Mîralî bi heyecan bû. Kêliyên daliqandina afîşan, ya rast pêvekirina kaxizan a bi dîwar û zinaran ve bi bîr anîn. Her carî xweşhalî û hêviyekê xwe di dilê wî de dabû der. Di dilê xwe de digot:

"Ger bavê min hay jê çêbe ku ez ji bo Heskîfê di nav têkoşînê de me ê çiqas kêfxweş be." Mîna ne bawer be ku bavê wî şa be; halê bavê xwe ê di Donzdehê Îlonê de, wexta derbeya leşkerî bibîranî. Wê çaxê ku şanzdehsalî bû bavê wî her kêliyê bi tirs bû. Her carî şîret li wî û diya wî dikir. Digot, ger min bigirin, hûn nemînin li van deveran, biçin welêt. Ew kî bigirin bin çav, wî perîşan dikin.

Bavê wî her ji wî re digot, "kurê min, radîkal nefikire, eman lawê min, radîkalîzm hinekî jî dibe sedem da însan çavan li gelek tiştan bigire." Carna Mîralî dixwest pirtûkên ku ew dixwîne bixwîne. Bavê wî nedihişt. Hin pirtûk ji wî vedişartin. Gelek pirtûk jî çawa haya wî ji derbeyê çêbûbû şewitandibû.

Mîralî bi pirsên di dilê xwe de mijûl bû. Pirs li ser pirsê. Gelek ji wan pirsan bê bersiv diman. Sebra wî nedihat. Çendek wext bû gotinên kesên navdar li kaxizekê dikir û ew kaxiz her di bêrîka wî de bû. Bi awayekî kûr û dûr dixwest wan gotinan şîrove bike. Kaxiz ji bêrîka xwe derxist. Ev

her du gotin xwend. Gotina pêşî Davîd Hume, a li dû wê jî Martîn Lûther gotibû:

"Tu tişt bi qasî hêza xeyalên însan ne azad e…Her însan bi mêweyê xwe tê nasîn." Gotina pêşî li xweşiya wî diçû lewre ji alî xeyalan ve tu problema wî tune bû. Lê carna pirs jî ji xwe dikir, ma xeyalên bi vî awayî ê xwedî çi wateyî bin? Bêtir di bin bandora gotina Martîn Lûther de dima. Ka mêweyên min? Ka, digot pirî caran bi dengekî bi hêrs û bi gazin. Wî jî nizanibû bê gazinên xwe ji kî û kê dike.

13

Şeva afîşa dawî hatibû. Hem bi heyecan bû hem jî bi mereq. Nizanibû ji bo çi bû lê pişt li wî germ dibû! Carna xwêdan bi ser wî diket. Afîş di poşetekê de bi cî kir û di tariyê de meşiya. Bi tirs, bi xem û lezûbez. Hayê wî ji tiştekê tunebû. Sê kes li dû wî bûn. Wan kesan ew dişopandin. Wexta afîş bi minareya camîyê de zeliqand wan kesan ji dûr ve xwe amade dikir. Ji wan yekî, eman, hûn gule bera wî nedin, ez ê wî bikujim, got. Ên din meselê fam nekirin. Zilamî sedem wiha der kir:

– Ger em her sê pev re gule bere wî bidin ê deng bêtir derê û xelk me bibîne.

Herduyên din qebûl kirin. Zilam nîşan li Mîralî girt. Xwêdan bi ser wî ket. Nedixwest guleya wî li minareyê jî bikeve. Bi qestî gule bera erdê da. Mîralî reviya paş minareyê. Herdu kesên din xwestin xwe li çekan bigirin. Mîralî ji dîwêr de xwe avêt. Di wê kêliyê de şewqeyê yekî ji wan xuya kir.

Mîralî di nav xwêdanê de mabû. Çû mal. Serpêhatiya xwe ji Osman re got. Osman pekand ser wî:

– Tu xwe çi dihesibînî? Ev macera ê heya kengî bidome. Her kesekî xwe li macerayekê bigire ê çi bibe. Ev bila a dawî be!

Mîralî bersiv neda wî. Bêdeng ma. Behsa wî kesê bi şewqe nekir ku kesî nexwestiye gule bera wî bide. Di nav xeyal, metirsî û biryaran de diçû û dihat.

Bi xem bû. Hemî afîşên wî hatibûn berhev kirin. Sibeh ê Alîta û hemî rojnameger li wir bana. Biryar da. Bi qasî sed û pêncî kaxizên piçûk amade kir," Êvarî rahêjin meşaleyên xwe û li her deverî Heskîfê belav bin" nivîsî.

Roja mayîn, Alîta û hemî rojnameger hatibûn. Li ber serê pira nû, li pêş qehwexaneyekê rûniştin. Mîralî çû cem wan û meselê ji Alîta re got. Tirs bi Alîta ket, "tişt pê nayê, ez ê bi awayekî meseleyê hel bikim, em dev ji vî karî berdin." got. Mîralî, "Hûn li vir bin, ez ê bi qasî saetekê werim" got û çû.

Di nav saetekê de Mîralî hemî kaxiz li qehwexaneyan belav kir. Wexta gihaşt çayxaneya Alîta û rojnameger lê rûniştî leşker hatin. Mîralî kaxiz avêtin hewa. Kaxiz belawela bûn. Gelek kesan ew kaxiz girtin. Leşkeran Mîralî birin.

Leşkeran ew birin, deng li nav Heskîfê belav bû. Osman xeber da nas û dostên xwe. Her kesî biryar da dê ew di dehê şevê de rahêjin meşaleyan û li her deverî belav bin.

Êvarî gelek leşker jî ji Kercewsê hatibûn. Gelek hewl dan lê Heskîfiyan qanih nekirin. Dawî de destûr dan da gel hew bi meşaleyan bigerin.

Li kelehê, li nav rezan, li devê şikeftan meşaleyan şewq didan. Rojnamegeran ew didan kamerayê û wêne dikişandin. Her yekî ji wan ji bo ku ê nûçeyek balkêş bidest bixin kêfxweş bûn. Alîta jî rahêşt meşaleyekê. Pêşî di nav ava Dîcle de hinekî meşiya. Çû li ber lingê pira kevn rawestiya. Ew nûçe belav bû. Bi tevî rojnamegerên biyanî gelek kes jî hatibûn ber lingê pirê. Osman meşale ji bîr ve kiribû. Bi çeqmaq tevlî wan bû. Kes neçû mala xwe.

Mîralî di bin çav de bû. Derengî şevê hemî rojnameger bi tevî Alîta çûn Batmanê. Nûçe li her deverî belav bûbû.

Dotira rojê Alîta ji bo Mîralî vegeriya Heskîfê. Ji wê re gotin ku ew birine Mêrdînê.

Alîta çû Mêrdîn. Di rê de êdî pirsên bi wate derbarê kurdan de ji xwe dikir. Li derdor, li mayîndeyên dîrokî dinihêrî.

Çand û olên li wan deveran jiya bûn difikirî û halê heyî difikirî, hiş bêtir li wê tevlîhev dibû.

Ji ber rewşa Mîralî sibehê bêyî serûguhê xwe biedilîne derketibû. Ji nişka ve halê porê xwe texmîn kir. Neynik û şehekî piçûk ji çente derxist. Bêyî xem bike li porê xwe nihêrî. Por li wê gij bûbû. Mîna henek bi xwe bike keniya. Hew çend caran şeh li porê xwe xist. Porê nerm hema teşe girt. Di neynikê de, pê de çû. Li çavên xwe, li wechê xwe nihêrî. Wechê wê ziwa xuya dikir. Xwe bi xwe, ka bila Mîralî were berdan ez ê rojekê ji bo bedena xwe terxan bikim, got.

Li Mêrdîn ji bo Mîralî parêzer girt. Du hefte ma li Mêrdîn. Di nav du hefteyan de carna ji bo Mîralî diçû li Dêrê dia dikir. Bi nasnameya rojnamegeriyê bi du rayedaran re hevdîtin pêk anî. Cara sêyemîn bû dihat Mêrdîn. Bi gerê, wênekişandinê wextê xwe li wir derbas kir.

14

Alîta yeqîn nedikir zûbizû Mîralî berdin. Ji têkiliyên parêzer ên bi rayedaran re ew serbest berda bûn. Parêzer î Mêrdînî di heman demê de lawê dewlemendek bû. Ji rayedaran re gotibû, serê xwe nexin belayê. Ew rojnamegera Ewropî her nivîsan lê bike, ê ev ji bo me û dewleta me ne baş be!

Mîralî serbest bû. Bi çavên xêrê li Alîta dinihêrî. Alîta jî bi dilê şîrîn û bi gotinên xweşik ew vedihewand. Mîralî, te gelek xem nexwar, ne? pirsî. Alîta, bi destê wî girt, na delalo, ez bi hêvî bûm, got. Herdu çûn Heskîfê.

Alîta gelek xem dixwar. Êdî xwe ji xeyal û fanteziyan kiribû. Mîna jiyanê jê re gotibe, heya vir, ew qas! Her carî dixwest xebera çûyîna xwe bide Mîralî lê nedigot." Ez ê roja dawî ji wî re bêjim." difikirî. Ji gotinê bêtir xema wê ew bû ku ê çawa Mîralî bida bawer kirin ku gelekî ji wî hez kiriye lê neçare biçe. Çawa karibe bêje, eşqên wê wanî bi dem in; ew nikare heta hetayê bi yekî re bimîne. Ji fikra zewacê nefret dike.

Ji mal dernediketin. Mîralî çend caran pirs ji Alîta kir bê ew ê çi bikin. Alîta bêbersiv hişt. Carna kêliyên îşkenceyê bi bîr dianî Mîralî. Bêdeng dima. Lê bi awayekî her tiştên diqewimî li xweşiya wî diçû; mîna jiyanekê bi dest xistibe xweşhalî jî xwe li dilê wî dida der.

Ji ber ku Alîta li cem wî bû, kêfxweş bû. Dil û hiş li wî

sivik bû. Alîta her dixwest pevşad bin. Halê Alîta bi wî ecêb dihat. Mîralî,

– Ê bi te ecêb bê lê ez dixwazim biaxivim, şîroveyan bikim!

– Baş e, tu yê zêde negirî!

Mîralî bi ken bû. Pirs ji Alîta kir:

– Alîta, tu ji bo çi bêdeng î? Emê ji vir bi şûn de çi bikin? Heskîf, ez, tu?..

– Sebir bike. Piştî sê rojan ez ê ji te re bêjim.

– Ji bo çi piştî sê rojan?

– Sebir bike delalo.

– Her carî tê bîra min lê ez ji bîr ve dikim da bipirsim. Wateya navê te çi ye?

– Bibaskbûyîn.

– Li te tê.

– Çawa?

– Rihê te mîna bi bask be lê naşibe eylo û bazan.

– Balkêş e, ê?

– Dişibe çivîkekê ku ez wê ji zarokatiya xwe de dizanim.

– Çivîkek çawa bû?

– Min ji kaxizan çê dikir û reng dida wê.

– Em însan wanî ne, îlahîm dixwazin rengê xwe bidin her tiştî.

– Lê eşq? Gelo em dikarin rengê xwe bidin eşqê?

– Eşq ne dihêle em resmê wê çêbikin ne jî dihêle em rengê xwe bidinê; rengê eşqê her bi me şîrîn e.

Êvarî Osman hat cem wan. Osman behsa Heskîfiyan kir ji wan re. Mîna bi Mîralî kêfxweş be diaxivî, “Gavên nû sivik bin jî bi wate ne” got. Mîralî dilxweş bû ku ew gotin ji Osman bihîst.

Osman heya derengî şevê ma li cem wan. Osman çû. Mîralî û Alîta xwe li sohbetê girtin.

Sê roj qediya bû. Destê sibehê Alîta bi awayekî xemgîn Mîralî da hember xwe û axivî:

– Mîralî, ez nizanim ez ê çawa bêjim!

Mîralî li wê dinihêrî. Çi ye, peyamên te hene? pirsî.

– Belê, lê her peyam ne bi wate ye. Ez ê biçim. A rast gere ez ji zû de biçûma. Ji ber ku tu girtî bû ez neçûm. Berpirsiyarên rojnameyê xeber dan min da ez biçim Parîsê. Ji ber ku di heman demê de ez xwe li edebîyatê digirim, ez karê rojnamegerî baş bi cî naynim biherhal.

Mîralî bêdeng ma. Reng li wî spîçolkî bû. Rengê wî û nêrînên wî bûn sedem ku hêsir ji çavên Alîta bibarin. Bi îskîn got:

– Mîralî, ez îjar hinekî hînî girînê bûm. Lê evînên min, bi temen, kurt in. Ez baş dizanim ku ê hurmet ne besî eşqa min û te be. Belkî evîn ew e ku deriyek din li jiyana me vedike; te deriyê nû li jiyana min vekir. Ez ê bi çavekî din, bi dilekî din, bi rihek din herim Parîsê. Ez ê xwe li peyaman bigirim. Peyam zimanê zarokan e, ê jiyan ji bo min zarokane be.

– Belê evînek temenkurt.

– Çîrokên eşqan muhîm in delalo, çîrokên eşqa min û te pir in, got Alîta. Hinek rawestiya. Mîna valahî êdî di dilê wê de nemabe, bi dengekî rihet û bi newa pê de çû. Mîralî, êdî ez dizanim hezkirin ne tiştekî zor e. Belê ji bo kesên nejiyabin zor e. Eşq mîna lûtkeyekê ye; hûn bi çiya ve hildikişin, her zor û zehmetî li ser rê heye. Piştî hûn digihîjin lûtkeyê tu tişta bi we biyan û zor namîne. Valahî di dilê we de namîne. Ez êdî baş dizanim ku çi valahî di dilê însan de hebe ji ber nebûna evînê ye.

Mîralî tu tişt negot. Bêdeng di odeyê de çû û hat. Li nexşên şahê maran nihêrî. Tu hêma û şîroveyê xwe di hişê wî de neda der. Bi hilmên kûr re axînên sivik dikişand. Di wê kêliyê de, hay jê çêbû ku Alîta ne wekî jinekê, mîna hevalekê

ji bo wî pir muhîm bû. Xwe bêçare hîs kir. Gav û wextekê pîyase kir. Li çavên Alîta nihêrî. Ji dil dihat biqîre bê ji bo çi dawiya wan bi wî hawî xwe dide der. Ray li xwe kir. Dîsa li Alîta nihêrî, bi hesret, bi tirs û xem, bi gazin. Bêhemdê wî, destê wî çû bêrîka wî. Kaxiz derxist, gotina Tolstoy bi dengekî bilind, heta bi qîrîn xwend: "Jin babetekî wanî ye tu çiqas lêbikolî jî ew her nû ye."

Alîta bi rehm li wî nihêrî. Mîralî, got, ez hînî tiştekî bûm, kesên ji jiyanê de dest pê dikin bi awayekî fesîh lê kûr û dûr digihîjin. Çîrokeke Yilmaz Guney heye. Bavê min her carî behsa wê çîrokê dikir... Rawestiya Alîta, navê çîrokê baş bi bîra wê nehat. Bi xwe ewle be, na na, baweriya xwe bi dendikê xoxê bîne, bi xwe beled be... Tiştekî wanî bû. Ger rojek te derfet dît, çîrokên wî bixwîne. Bi tevî çîroka bi navê Eyloyê Pîr. Ax Mîralî, ew çîrok bi tenê dikare ji bo hemî çîrokên we bibe kan û referans.

Mîralî pirsî: Tu dizanî bi kurdî bixwînî?

Alîta: "Na, bavê min bi tevî Bedrî behs kiribûn."

Çîrokên Yilmaz Guney, gotinên Alîta ên wekî edebîyata we, çîroka Eyloyê Pîr, giş bi Mîralî biyan bûn û her yek bû pirsek di hişê wî de. Nedixwest tu tiştî bêje Mîralî, ma ez ê çi bêjim, çiyê min heye di derbarê wan tiştan de, got û bêdeng ma.

Lê bavê min, ma ne ew ji her tiştî haydar bû. Temam, xwest min ji sîyasetê biparêze lê van tiştan! Ma bavê min bi tenê, lê Osman, wî ji bo çi hîç behs nekir? Pirsî Mîralî xwe bi xwe. Ez dibêjim bi tevî Osman ew qas dilsoz e jî haya wî jî ji tiştên wanî tune ye, fikirî.

Alîta, bila ev ramûsan ji bo xatirê her tiştî be, got. Xala li xamzeyê ramûsa. Wext hat, em derkevin, got. Çûn mifte dan xwedî xênî.

Mîralî her bêdeng bû. Alîta pirsa xwe a dawî kir:

"Dizanim, ger însan bi tiştekê bizanibe lê dîsa jî pirsan

bike ehmeqî ye. Ez ê ji bo dilê xwe ehmeqî bikim, Mîralî, te bira bira ji min hez kir?" Mîralî sond ên ku di zarokatiyê de dixwarin bi bîr anî û sond xwar bi dengê bi ken:

– Bi agir, bi vî rojê… Min ji te hez kir.

Alîta bi heman halê bi ken li erebê siwar bû. Erebe li ser pirê diçû. Alîta bi îskîn bû. Li Heskîfê nihêrî. Gihîştibûn hemberî kelehê. Li kelehê nihêrî. Ji dil dihat tiştekê bêje, bi sedan gotinan xwe da der. Nikaribû der bibira. Kêliya bi peykerî pêsîrên xwe mis dabû bi bîr anî. Xala li ber xamzeyê a li rû Mîralî li ber çavên wê bû. Çavên xwe girtin. Ew şeva ku li her cihê meşale hebûn xeyal kirin. Pirs ji xwe kir: "Gelo min ew êşand?" Xwe bi xwe bi bersivê re mijûl bû.

15

Heya çend rojan jî Mîralî nedikarî tiştekê bike ne jî ji dil dihat tiştekê bixwe. Li mala Osman dima. Osman her dixwest moral bide wî. Carna henek li wî digirt:

– Lawê min, ez hatim vî temenî, hê jî ez bi tehm û tîna lêvên jinekê nizanim. Tu êdî çi dixwazî; eşqek li Heskîfê, bi serde jî bi yeka wekî Alîta re. Ew çavên wê ên mezin û bi bêvil û bijangan re lihevhatî. Ew bedena mîna şitil û sivik. Tew sîng û berê wê... Porê kej...

Mad li Mîralî tirş bû. Ew awayê pesinandina Osman li xweşiya wî neçû, "Behsa Alîta meke êdî" got.

– Baş e.

– Eşq ne henek e.

– Belê birê min, ên te bûn dudu!

– Osman, tevlîheviyek heye di dil û hişê min de. Halekî mîstik, sivik û zarokane. Xwe mîna zarokekî hîs dikim. Min nizanibû tesadif ew qas bi wate dibin.

– Rast e. Carna tesadif rê li ber me dixin.

– Ditirsim ku ez ê nema karibim ji bo Heskîfê tiştekî bikim.

– Tişta te kir ne hindik bû. Ji vir bi şûn de, tu gavekê jî biavêjî ê îja bira bira te bigirin û ceza li te bibirin. Gav û gotinên li xweşiya xelkê biçin, wan pir aciz dikin.

– Ez ê herim deverekê.

– Kîjan dever?

– Ez jî nizanim lê ez ê çendekî herim.

– Tu çêtir dizanî. Ê baş be.

Mîralî, di riya kelehê de dimeşiya. Kesên wî didîtin silav li wî didan. Kêliyekê çû hewşa mizgeftê. Wan kesan wexta ku gule bera wî dabûn bi bîr anîn. Ger ez neşibiyama lawê wî qatilî ê wê şevê ez bikuştama, got xwe bi xwe. Qey ew gelek çavsor in. Ne wanî bûya ê di hewşa camiyê de gule bere min nedana. Xuya ye ku tirsa Xwedê jî di dilê wan de kêm e, got. Mîna rexne li xwe jî bigire xeletiya xwe bi bîr anî; baş e, min ji bo çi xwest ez kaxizên diruşme lê hatî nivîsîn bi minareyê ve bikim. Gunehkariya min jî heye, got.

Ji wir derket û çû keviya avê. Halê xwe û Alîta li ber çavên xwe bi cî kir. Her tiştî ji nû ve hîs dikir û dijiya. Esma jî dihat ber çavên wî. Mîna bêhalekî bi ser qûmê de ket. Serî ber bi jor kir û li riya avê nihêrî. Xeyal dikir. Ji bo Heskîfê halên nû xeyal dikirin.

"Ku rojek bê, navê Heskîfê bibe, Bajarê Evînê, ê çiqas xweş be. Her şikeftek mîna odeyek evîndaran were neqişandin û terxankirin. Na, gerek ji bilî evîndaran nivîskar, sînameger, şanoger jî werin vî bajarî. Helbestvanên şîrîn û dilsoz..." piştî van gotinan mîna ew nav ne bes be fikirî û bi xeyalan de çû: "Navê bajêr bibe, Bajarê Huner û Evînê, wê çêtir be. Rez, bêhna mêweyan, av, mayînde, gotinên sivik ên hunerî û evînî. Ken, ê her ken rengê xwe bide bajêr. Kenê mîna kenê Esma ji kûr de û mîna kenê Alîta sivik û şîrîn."

Dengekî ji kûrahiya dilê xwe û xeyalên xwe de dibihîst. Guhdariya deng kir. Deng êdî bi wî biyan bû; mîna însanekî ji wî re biaxive:

"Ez dengek im. Dengê ku ji dengan mayî. Dengekî veşarî. Dengê ku nehat bihîstin. Dengê koroyekê me. Ez Heskîfê bi vî awayî xeyal dikim:

Heskîf, li cîhanê, wekî welatekî di statuya azad de difikirim. Xwedî Heskîfê bi tenê evîndarên li rû dinyayê ne. Evîndarên bi nav û deng tên li Heskîfê zagona ne bingehîn ya evîndariyê amade dikin.

Her sal, li Heskîfê navê evînekê li salan tê kirin, wekî Sala Mem û Zîn... Ê pirtûkxaneyek Heksîfê hebe ku bi tenê pirtûkên derbarê evîn û evîndariyê tê de hebin. Peyvên hişk, gotinên hişk li wir neyên bikaranîn. Derbirîn û şêweya însanên evîndar gerek karibe newayên di siruştê de bi bîr bîne. Ne newaya bagerê, newaya bayê hênik yê berêvaran.

Her êvarî, li kelehê, ê evîndar behsa evîna xwe bikin; ku çîroka evîndariya wan ne li gorî dilan be ê ew kes Heskîf biterikînin.

Çi kesê/a evîndar bê Heskîfê gerek bi tu awayî cîhanê û jiyana li derî Heskîfê bi bîr neyne. Her însan, bi kêmanî, gerek bi qasî du saetan, bi şev bimîne di nav ava Dîcleyê de. Li kelehê gerek bi kêmanî bi qasî nîvsaetekê li asîman binihêre.

Her kes, gerek ji peyva şûştin hez bike; her kêlî, gavê û saetê karibe hişê xwe û dilê xwe bişo!

Însan li wir gerek tu tişta xirab di hişê xwe de bi cî neke. Gerek însan zanibin fesadiya mezin ew qeydên di hiş de ne.

Mîralî li dû xeyalan gelek xem xwar.

Rabû. Ber bi riya avê a di zinar de çû. Piştî hinekî li çiyayê Raman nihêrî, nêrînan li lingê pirê xweş kir. Xew bi çavên wî ket. Raza bû. Tarî xwe dabû erdê. Dengekî bi ser wî ket:

– Xoce! Mîralî Xoce!

Bi xwe ve hat. Ew zilam. Zilamê bi şewqe! Ji dil Mîralî hat biqîre. Neqîriya lê mîna bi hêrs be axivî:

– Kerem bike. Ma tu karê te nîn e, tu çi dixwazî?

– Ez îja dev ji te bernadim! Tu, deyndarê min î.

– Deyndariya çi?

– Tu pê dizanî; yê ku wê şevê te nekuşt ez bûm!

– Çi xweş! Hem bibin qatil hem jî bikin minet li serê me!

– Tu xoce yî lê hê jî cahil î!

– Tiştê bi te şîrîn be nema ye. Dîsa jî ez ê bêjim, çi bi te şîrîn e, tu bi wê dikî, dev ji min berde êdî.

– Tu bûyî sedem ez carek din bi wijdanê xwe re mijûl bim.

– Bawer nakim. Derdên te ên din hene.

– Bi sond û qesem tu derdek min ê din tune ye. Hew êdî naxwazim kesî bikujim. Te fam kir? Naxwazim kesî bikujim.

– Nekuje. Ma zor e?

– Çi gotinek beredayî!

– Çima beredayî ye?

– Nekuje. Ma zor ê, ew qas; kuro, ew qas rehet ê, ez jî hatime tu rê li ber min bixî. Belê ez ê karibim nekujim. Dixwazim tu eleqeya min û wan bikujan nemîne. Ê tiştinan bînin serê min. Tirsa min ne ji wê tirsê ye, ditirsim ku piştî ez dev ji wan berdim, ew tiştekî bînin serê min û nema ez karibim lawê xwe bibînim.

– De bêje. Ez êdî meseleya lawê te mereq dikim. Bêje bila têkiliya me bi hêlekê bikeve. Bes e êdî. Navê xwe jî bêje.

Bêhn bi zilam sivik bû. Tebeqe derxist. Cixare pêça. Piştî cixare vêxist bi dengekî bi xemgîn axivî:

– Navê Min Elî ye. Lawê min wa ye li nexweşxaneyekê. Bi qansêr e. Êvarekê ez di hêwana nexweşxaneyê de digiriyam ji bo lawê xwe. Yekî nêzikahî li min kir. Cixare da min. Bavê wî di fitiqê de emelîyat bûbû. Me gelek sohbet kir. Min ji wî re behsa destengiya xwe kir. Min nikaribû lawê xwe tedawî bikira. Wî zilamî pêşî li ser namûsê soz ji min girt. Wextê min soz da wî, teklîfatî li min kir. Gote min, ger tu bi min re werî û bi me re bixebitî ez ê alîkariya pereyan bikim. Min pirsî bê ez ê çi bikim. Wî got, karekî bextewariyê ye! Çare ji bo min nema bû. Ez hatim. Ev du sal in ez tevlî operasyonan dibim û kes nizane ez ji ku me. Wî zilamî, şertek din jî dabû

ber min; gerek tu car, bi tu awayî min têkilî bi malbata xwe re lidar nexistiba. Ev e mesele, ez êdî naxwazim kesî bikujim.

Mîralî di halê neçaran de bû, ji neçarî baweriya xwe bi wî anî; ne li benda çîrokeke wanî bû. Şewat bi dilê wî ket. Ji Elî re got: "Biçe Dîyarbekir."

– Ez ê çi bikim li wir?

– Tu bi çi re mijûl bî jî, ji vî karî çêtir e.

– Tu rast dibêjî.

– Îja ez Dîyarbekir nas nakim. Soz bide min ku tuyê ji kesî re nebêjî. Rojekê bi min re were Dîyarbekir, got Elî. Dû re ji van gotinên xwe poşman bû lewre wî hindik be jî Dîyarbekir dinasî. Li gorî xwe, wî wekî hincet wanî got da karibe Mîralî jî bi xwe re bibe Dîyarbekir.

Mîralî bi xem û fikar bû. Xwe bi xwe, "Çi dibe bila be, belkî jî rast dibêje, ez ê xwe li vê çîrokê jî bigirim" got.

Mîralî qebûl kir. Biryar girtin. Ê sibehê pêşî Mîralî biçûya Batmanê. Piştî saetekê jî Elî biçûya. Li wir hevudu bidîtana. Wexta Elî ji wî bi dûr ket wiha got:

– Xoce, bi qasî ku ez karibim salekê, bi nanozikî, debara xwe bikim pereyên min hene.

16

Li Batmanê herdu li erebê siwar bûn. Elî carna devpanî dikir û dixwest pesnê Mîralî bide:

– Mîralî, te bi wan kirinên xwe gelek bêhn li wan teng kir. Serbazî digot, ew kar ne karê yekî ye, li dû wan gavan ê gelek gavên din jî biavêjin. Ger wan ji jiyana rojane de dest pê kiribe ê mesele kûr û dûr be.

Mîralî xwe li gotinên wî nekir xwedî. Tirs jî pê re hebû. Xwe bi xwe, "Ev çi aqil e, ez bi qatilekî re diçim Dîyarbekir. Lê wan pîlan ji bo min çêkiribe? Lê ev zilam li cihekê guleyekê berde serê min!.. Elî wê şevê ez nekuştim. Ger Elî tirsandibin û peywira kuştina min dabin Elî! Ev e, dibêje te fikar xistiye dilê wan!.."

Nizanibû ê çi bi serê wî de bihata. Jiyana wî çawa biguheriya. Ê li ku nefes bigirta, çawa nefes bigirta. Mereq dikir bê ew rêwîtî bi çi awayî bi dawî bûya. Heya Dîyarbekir di nav xeyal, metirsî û şîroveyan de bû. Carna mîna kabûsekê kuştina wî a bi destê Elî dihat ber çavên wî. Kelxwêdan bi ser wî diket. Ez bi vî kesê nemerd re diçim ku? Da ber dilê xwe, bavekî ku we şibandibe lawê xwe zor e ku xisarê bide însan, got. Hinekî bi xwe ve hat.

Li Deriyê Çiyê peya bûn. Mîralî, çendî caran çûbû Dîyarbekirê lê dîsa jî baş nas nedikir. Ji Elî re got:

– Ev e Dîyarbekir. Îja bêje. Tu çi difikirî?

– Ka em li cihekê çayekê vexwin, bê çi be.

Meşiyan. Li ber sûrê, qehwexaneyekî bi navê, ‘Mala Piçûk’hebû. Bi tesadifî li wir rûniştin. Giş ciwan bûn. Ji bilî Elî tu kesê kalepîr tunebû. Rewşê bala Elî jî kişand. Piştî çay xwarin rabûn.

Elî li cil û kincên xwe miqate bû; ji Mîralî xwest ku solên xwe bidin boyax kirin. Mîralî dengê xwe nekir. Wextê sol dihatin boyax kirin Elî bi sohbet bû.

Bi nav sikakan ketin. Mîralî xwe ranegirt:

– Bi ku de diçî? Te çi kiriye serê xwe? Ez hê jî baş nizanim te ez ji bo çi bi xwe re anîm?

– Cihê ku ez lê bimînim hê ne belî ye. Lê kesek heye, ew ê min bi cî bike. Dixwazim tu jî cihê min bibînî. Qe nebe tu yê bizanibî ez li ku me.

– Ez ê ji bo çi mereqa te bikim? Ez ne birayê te me ne jî lawê te me?

– Ez bi dilê te dizanim, tu ne ew kesî bêbextî li însan bikî. Ev e, ez dev ji kuştinê jî ber didim.

Mîralî mîna wî biceribîne axivî:

– Ne kifş e. Belkî jî tu min dibî li cihekê dikujî. Ji kesên wekî te însan hêviya her neqenciyê dike!

Elî, li wî zivirî. Bi diltenikî û gazin axivî:

– Heqê te heye tu wanî bifikirî. Fam bike kuro, tu dişibî lawê min, deng bêtir bilind kir, ne ez dibêjim tu dişibî lawê min, gidî!

Mîralî, bêdeng, li dû wî meşiya. Her ku dilekî wî, rihet be, dilê din metirsî bi ser wî dixist.

Di sikakekî teng de, kesekî alavên xurdeyî dikirî bi erebeya textinî a bi du totik diqîrîya:

– Xurdecî, xurdecîîî!

Du kes hatin cem xurdecî. Di dest yekî de makîneya pê por dihat ziwa kirin hebû. Ji xurdecî pirsî, ev bi çi dike? Xurdecî, bi qasî buhayê benîştekê buha da. Kesê din, ku temenê wî derdora sîyî bû, ma dibe, got. Xurdecî, incax

kîloyek be ew makîne. Kesê din, mîna xwe li henekan bigire, de ka em bikişînin bê çend kîlo ye, got.

Axaftinên din ji alî Mîralî û Elî ve êdî nedihatin bihîstin. Elî xwest wî halî şîrove bike:

– Ew ê niha her sohbet bikin. Ew henek ê bibe sedem ku ew çi û çi ji hev pirs bikin.

– Ji bo çi?

– Sohbet û têkilî li xweşiya însanan diçe. Sohbet li van deveran derman e.

– Bavê min her bi hesret bû ku rojekê bihata li vir bijiya. Ax, digot, însan li Amedê be û bi zimanê xwe biaxive.

– Kurd wanî ne, ên "şeherlî "ne, ên ku bi tirkî re mijûl in!

– Mîna tu jî bi xem bî ji bo kurmancî. Ecêb e!

– Wîîî, gîdî, ma ez jî kurdim kuro!

Mîralî keniya. Kenê Mîralî Elî êşand. Çi tiştên ji xwe re kiribûn hincet got:

– Haylo, te hay jê nîn e. Kuro ev, ên çend sal in rahiştine sîlehê ne Kurd in, giş Ermen in, xwedênenas in!

– De tu xwe bixapîne. Haylo, çi rûspiyek!

Elî bi dengekî bilind û bi pevçûn bersiv dida:

– De îja!

– Çend xortên ji gundekî nêzî gundê ez lê mamostetî dikim çûn çiyê. Giş jî zarokên kurd in.

– Heyra, ez hêvî ji te dikim, êdî behsa tiştên wanî neke! Ka ez karibim serê xwe li cihekê bi cî bikim û bisitirim, ez êdî kesî nekujim, bes e, wekî din bihêle.

– Ji bo ku tu êdî kesî nekujî ez bi dû te ketime. Ma ne wanîbûya…

Xuya bû Elî wan sikak û derdoran baş dinasî. Çû ber deriyekî. Deriyê pêş hinek vekirî bû. Elî bi kêf axivî:

– Şensê me heye. Derî bi vî awayî vekirî be ê Xanim li mal be.

– Xanim?

– Belê Xanim. Ya ku çare ji min re bibîne ew e.

Deriyê alî hundur girtî bû. Elî li derî da. A ku derî vekir Xanim bû. Xanim bi wechê tirş li wan nihêrî. Her ku heyirî ku kesekî mîna Mîralî xort bi wî re ye jî xwe li wan nekir xwedî û meşiya. Elî fam kir ku bê mesele heye. Bi dû Xanimê ket. Li odeyê, Xanim rûnişt. Elî li ser qoltixê rûnişt. Qoltixa din jî rê Mîralî da. Xanimê bi hêrs pekand ser Elî:

– Ew herdu hevalên te, beriya bi çend deqîqeyan, ji vir çûn. Mîna gurên har li te digeriyan. Ev hûn çi rêxê belav dikin? Hûn kî ne? Binihêre, an her tiştî ji min re vebêje an jî ji vir biçe!

– Hêdî keçê, hêdî. Ez îja ne hatime bi te re razêm ne jî hatime heya qatê şevan bi te re sohbet bikim. Ji bo rica û dexalet hatim. Mîralî jî, ji bo min ji derdekî bike, bi min re hat. Mamoste ye.

Du jinên din ên ku temenê wan jî li derdora çil û pêncan bûn hatin hundur. Xêrhatin bi Elî dan. Xanim îşaret da wan da ku ew ji wir biçin. Herdu jin çûn odeya din. Xanim hê jî bi hêrs bû:

– Hevalên te, îro, bêhurmetî kirin. Ka hûn giş li Heskîfê bi bazirganiyê re mijûl bûn? Ka hûn bêxisar bûn? Rabin û biçin, got. Li Mîralî zivirî, ez nizanim tu çi isn û cisn î, çi karê te bi vî re heye. Mîralî bêdeng ma.

Elî dît ku çare nîn e. Ji Xanimê re, bi dengekî lavatî got:

– Ka şerabê bîne. Çare tune, ezê her tiştî ji te re bêjim.

– Nabe. Gere tu karibî bêyî şerabê vexwî her tiştî, aniha, bêj. Ger dîsa ne derew be, heya tu karibî em ê şerabê vexwin.

Elî, sako ji xwe kir. Pêjgîr avêt ser stûyê xwe. Cixareyekê pêça. Yek jî ji bo Xanim pêça lê Xanimê cixare negirt. Li benda axaftinên Elî bû. Elî bi dengekî xerîb dest pê kir:

– Xanim, ez mêran dikujim!

Xanimê veceniqî. Bi metelmayînî û bi wate li Elî nihêrî. Pirs ji wî kir:

– Qey tu jî ji wan kesên xwedî dijmin î?

– Nizanim. Na. Hew ez dizanim ez mêran dikujim.

Elî çîroka ji Mîralî re vegotibû yek bi yek ji Xanimê re vegot. Dirêjahî da axaftina xwe.

– Ez nizanim aniha ez ji bo çi alîkarî ji te dixwazim û herwiha ji Mîralî jî. Ez dizanim ez ê nema karibim mêran bikujim.

Xanim li Mîralî nihêrî. Mîralî, mîna bi nêrînan alîkarî ji wê bike tevgeriya. Xanim bêdeng ma. Çû şerab anî. Mîralî venexwar. Bêhnteng û bi hêrs bû. Nedixwest li wir bimîne. Xwest xatir bixwaze:

– Baş e, ez ê êdî biçim. Hêvî dikim da tu xwe li tiştên xweş bigirî, bi saya vê xatûnê.

Elî, rûnê, hê tu tişt hel nebûye, got. Xanim ji wextê Mîralî hatibû de bi rehm li Mîralî dinihêrî. Mîna fersend bi destê wê bikeve axivî:

– Tu xort î, ji însanan nereve. Ên wekî min jî parçeyek ji jiyana we ne. Hûn birevin jî ev rastiyek e! Baş e, werin di nav nivînan de bikin helkehelk, bi nav jiyanê kevin û gotinên xweşik û bi namûs bêjin! Peh! Axx, we bizanibûya bê em çiqas we dinasin!

– Mîralî, ne henek e, got. Xanim li dû van gotinan hinek ji hêrsê de ket. Mîralî dom kir. Qehpiktî jî ne henek e…

Bêyî ji Xanimê destûrê bixwaze, qedehek şerab dagirt û bi yekcarî vexwar. Gotina, ne henek e, di dil û hişê Xanimê de diçû û dihat. Ji Mîralî xwest ku Mîralî biçe li cem wê rûne. Elî mîna dexesî bike rê da ber:

– Ka bila herdu xatûnên din jî werin.

Xanim mîna her tiştî fikirî be axivî:

– Min çare ji bo te dîtiye. Sibeh, em ê hel bikin. Îşev tu û herdu jin li odeya din bimînin. Ger Mîralî jî bixwaze, ez û Mîralî jî em ê li vî odeyî bimînin.

Reng li Mîralî çû. Lê her tişt bi wî bi seyr dihat. Bêdeng ma. Xweşhaliyek xwe li rû Xanimê da der. Elî mîna bêçareyekî tu tişt negot.

17

Xaniyê Xanimê, ne ew mal bû her kes bi awayekî serbest biçûna; mişteriyên wan ên herwext hebûn. Jixwe şeş meh bûn Xanim û wan jinan xwe li wî karê gunehkaran girtibûn! Xanim li gorî hişê xwe, dixwest di heman demê de alikarî bide zilaman; ji wan re behsa hêvî û daxwazên jinan bike; ê mêr jî li hember jinên xwe bi hurmet bûna! Beriya ku bi hin mişteriyan re razê gelek tişt ji wan re digot da ew li xwe mukir bên û biçin ji jinên xwe hez bikin. Ecêb bû, Xanim her ku wanî dikir, ew bêtir li xweşiya mişteriyan diçû, mişterî bi wê re radizan û ji buhayê razanê bêtir pere didan wê. Her mişteriyê ji mal derdiket bi bal derdiket da kes wan nebîne. Bi tevî Elî û hevalên xwe, nêzî bîst mişteriyên wan hebûn. Xanim carna ditirsiya ku kesên taxê haydar bin û bela bi serê wan de bînin.

Êvarî, piştî xwarinê, Elî û herdu jin çûn odeya din. Mîralî û Xanim mabûn li wê odeyê. Xanim şîret li Mîralî jî kir da ji kesî re behsa wan neke. Mîralî soz da ku ê ji kesî re nebêje.

Şerab vedixwarin. Mîralî pirsekê ji Xanimê kir:

– Heya niha, we çi peyam ji jiyanê bi dest xistine?

Xanim nedizanî ji ku de mabû di serê wê de an jî gotin bi çi awayî xwe da der:

– Jiyan her tiştî efû dike lê gêjekiyê efû nake!

Mîralî dît ku jinik gotinên bi seyr dike, nedixwest pirsan ji wê bike. Xanimê dixwest dom bike:

– Mînak jî ez im!

Mîralî, mîna ji tiştên bi seyr ê ku ew pêrgî wan tê zîvêr bibe, tevdigeriya. Xanim têgihîşt ku serê Mîralî bi tiştan re mijûl e, bêdeng ma. Tiştekî negot û ma li benda Mîralî da ew tiştan bêje. Mîralî her şerab vedixwar. Carna dengê ken û axaftinê ji odeya din de dihat. Xanim ew deng û ken ji bo Mîralî şîrove kir:

– Tu li wan dengan nenihêre. Elî pirî caran, ji bo ku deşarj be tê vir. Herdu jin jî ji wî halê wî hez dikin. Pê kêfxweş dibin.

– Ev wextek e, bi awayekî tesadif, tiştên ecêb dijîm. Ne li gorî temenê min in ne jî ez ji bo wan amade me lê bi serê min de tên. Ketime halek wanî ku mîna tiştekî bi ser avê bikeve û av rê bidê. Min di xewnên şevan de jî van tiştana bidîta minê bawer nekira, got Mîralî bi dengekî nerm û fesîh.

– Jiyan hinekî dişibe xewnan; hinek ji me, bi kabûsan şiyar dibin, hinek ji me jî bi halek sivik.

Mîralî xwe ranegirt:

– Ev gotinên te û ev halê te?

Xanim bersiv neda. Guhdariya dengê Eyşe Şanê dikir. Hinek din şerab vexwar. Dest bi vegotinên nostaljîk kir:

– Bavê min, gelek ji dengê Eyşe Şanê hez dikir, got. Mîna lêborînê ji Mîralî bixwaze pê de çû. Mîralî, tu mîna mêvanekî li vir î. Nizanim lê xwîna min li te şîrîn bû. Bibore lê ez dixwazim cil û kincan ji xwe bikim. Bi wî halî ez ê bêtir xwe xweş û sivik hîs bikim.

Halê Alîta bi bîra Mîralî hat, têgihişt:

– Tu serbest î.

Mîralî bi dengekî wanî şêrîn got, ji dil Xanim hat wî hembêz bike. Xanim cil û kincên xwe ji xwe kir. Hew derpê ma li ser. Bi tevî temenê wê ê navsere jî bedena wê ciwan bû. Xanim hinekî rûnişt. Dilê wî bi cî nehat. Çû li cem Mîralî

rûnişt. Bêyî tu tiştî bêje dest avêt fanêreyê Mîralî ê rengekî sor ê vekirî. Mîralî hereket nekir. Ji bilî derpê kinc li ser Mîralî jî nemabû. Xanim bi destê wî girt û ew bir serşokê. Derpê ji xwe nekir. Sabûn da dest Mîralî û got:

– Min bişo.

Xanim jî Mîralî jî sehneyên şûştinê ên di fîlmên tirk de bi bîr anîn. Xanim, ji bo wate bide sehneya ku di wê wextê de ew dijiyan, wanî got, "Mîralî, halê me niha dişibe halê fîlmên tirk, ev şûştin ê min ji vî heyatî xilas neke hew ez ê pirsan li pirsên xwe zêde bikim."

Mîralî av li wê dikir. Her ku av li wê dikir kêliya xwe û Alîta di nav ava Dîcle de bûn bi bîr dianî. Gotinên şêweya Xanim jî Esma bi bîrdianî. Piştî kêliyekê êdî nefikirî û hew bedena Xanim hîs dikir û dişûşt.

Xanim, rabû ser piyan. Sabûnê ji destê Mîralî girt. Di wê kêliyê de Mîralî mîna ne sabûnê, mîna rihê xwe têxe destê wê hîs kir. Mîna serê lawê xwe bişo, serê Mîralî şûşt. Mîralî jî di nav hîsek sivik de bû.

Çûn odeyê. Bedenên xwe ziwa kirin. Xanim ket nav nivînan. Mîralî jî ket nav nivînên wê. Henaseya Mîralî li xweşiya Xanim diçû. Ji şanzdeh saliya xwe de kêliyên wanî xeyal kiribû. Lê nejiyabû. Porê Mîralî misda. Nizanibû ji bo çi bû dixwest çîroka xwe ji Mîralî re vebêje. Dest pê kir:

"Rojekê, ez li pêş derî bûm. Bavê min li hundur, bi awayekî neçar diqîriya; ez êdî nikarim we xwedî bikim, digot.

Em heşt xwişk bûn. Birayê me tunebû. Ez giriyam. Min wê rojê cotek gore kirîbû. Di rengê goşt de bûn. Ez bi wan goreyan şa nebûm. Min dixwest di zûtirîn rojê de bizewicim. Ez hijdehsalî bûm. Min dizanî her kes bi hesret bû da li min binihêriya. Kesî nedixwest rojekê were û min ji bavê min bixwaze. Carê hevaleke min got, keçê, tu hingiya bedew î ew newêrin werin te bixwazin. Ez keniyam.

Rojekê, li ser kolanê, ciwanekî tirk pir li min nihêrî. Min

xwe li nêrînên wî xweş kir. Ew bi dû min ket. Heya nêzî mala me hat. Piştî dît ez ketim mal çû. Bi berdewamî berêvaran dihat, di sikaka me re dimeşiya. Bi wî awayî dom kir. Welhasil ez bi wî re zewicîm.

Mamoste bû. Piştî wextekê tayîna wî derket û em çûn welatê wan. Ne derdek ne deh. Sê zarokên me bûn. Ji alî aborî ve tengasiyan dest pê kirin. Ji derî wan, min hîs dikir ku mêrê min pir poşman bûye ku bi kurdekê re zewiciye. Dest bi vexwarina eraqê kir. Êdî jiyan bi me bûbû dojeh. Carna heqaret li min dikir carna jî li min dida. Gotinek wî êdî da qirikê, di pevçûnekê de, ji min re got, ên wek te ne layîqî tu tiştê ne, li min da! Ez dîn û har bûbûm. Bê hay, min sênik di nav serê wî da. Giliyê min kir. Zarokan ji min girt. Me dev ji hev berda. Ev herdu jin jî yek jê tirk e a din ereb e. Çîrokên wan jî hene."

Xanim bi vegotina çîroka xwe re xemgîn bû. Axîn dikişand. Carna bi wê, mîna kezeba wê bihele dihat. Lê nedixwest gunehê Mîralî bi wê were.

Mîralî, piştî guhdariya çîroka wê kir, mîna bixwaze xem di dilê Xanim de nemîne, dest da ser memikên wê. Xanim bawer nedikir ku tiştekî wanî bijî. Mîralî bi wê şa dibû. Xanim mîna hay ji rihê xwe çêbe, mîna dîsa ji xwe hez bike hîs kir. Saetek bi wî awayî wext li wan bihurî. Herdu bêdeng bûn.

Ji ku hat hişê wê nizanibû. Rabû, deftera xwe û qelem anî. Bi destê Mîralî girt, li ser kaxiz bi cî kir. Tiliyên xwe ji hev kir. Bi qelemê derdor xêz kir. Kenekî zirav xwe li rû Mîralî da der, got:

– Zarokên pola yekem vî tiştî dikin!

Xanim li xwe negirt. Wekî ku li xweşiya wê çûbe axivî:

– Çi bikim. Rihê min hê jî terecan e, got. Min ji heft gulan hê serê gulekê neqetandiye! Li kêleka destê xêzkirî ê Mîralî resmê çavên xwe çê kir. Nehişt Mîralî lê binihêre.

Piştî qedand, rê Mîralî da. Metelmayî ma Mîralî. Bi dengê heyîrî got:

– Wênesazên bi nav û deng incax dikarin bi vî awayî saz bikin!

– Şelafî meke! Henek dikim, şelafî jî carna li xweşiya însên diçin... Na. Ew feraset bi min re tune. Ji ber kedeke mezin e; êdî min sazkirina çavên xwe, ên xwişkên xwe, dê û bavê xwe jiber kiriye, got Xanim, bi rûkenî, lê ez nikarim ciyên din ên laş saz bikim!

– Ji bo çi?

– Piştî tayîna wî zilamî, ango mêrê min ê demekê derket, min li xerîbiyê bêriya malbata xwe dikir. Wêneyek malbata min hebû li cem min. Wexta bi roj zarokên min ders dixebitîn min jî hewl dida wêneyê çavan, çavên xwişkên xwe, ên dê û bavê xwe saz bikim. Ji bo min bûbû sebir. Û min her çav saz dikir.

Xanim defter da dest wî. Mîralî, li wêneyên çavan dinihêrî. Xanim ji bêriya zarokên xwe diltenik bûbû. Bi wê hesretê Mîralî hembêz kir. Heya razan jî dest û milên Xanim li bedena wî, bi awayek şidyayî rapêçayîbûn

18

Roja mayîn, Elî wextê Xanim bi kêf û halek sivik dît qehirî. Ger yekî Mêrdînî wê çaxê rûyê Elî bidîta teqez ê bigota, rûyê Elî mîna tuyên şêmî tirş e. Bi wechê wanî tirş û bi dengekî sar bi Mîralî re diaxivî.

Elî li xwe mukir hat; ma gelek kes bi wê re radizê, çima raketina Mîralî li zora min diçe, got. Gotin digot lê dîsa jî ray li dilê xwe nedikir. Dexesî dikir, bi hêrs diket, li ku bû ê êrîş bibira ser Mîralî. Hewl dida dilê xwe bi sebir bike.

Xanimê, Elî û Mîralî xwe li sikakan girtin. Çûn sikakekê. Xêniyek kevnar hebû. Deriy pêş hesinî bû. Xanimê derî vekir. Kesekî li hêwanê li ser piyan bi pisîkê re dilîst; ben li teşiyê kiribû. Tezbiha xwe bi serê ben ve kiribû. Pisîk bi tezbihê digirt û bi pencikan pê dilîst.

Xanimê silav li wî da:

– Merheba Bişar.

Bişar biken, merheba, got. Rûniştin. Xanim hal û meseleyê ji wî re got. Jê xwest ku gerek ew tu car behsa Elî neke û ê Elî li cem wî bimîne.

Bişar, baş e, got. Dîsa bi pisîkê re lîst. Xanim çû. Li çûyînê ji Mîralî re got, tuyê jî karibî li cem wan bimînî. Mîralî, ne belî ye bê ez çi bikim, got. Mîralî û Elî li ser qenepeya li hêwanê rûniştin. Elî her ku mîna bi henek bipirse jî ji xwe re kiribû xem:

– Mîralî, tu û Xanim bi şev razan?

Mîralî fedî kir. Bê bersiv hişt. Elî, bi xwe, bersiva xwe da:

– Helbet ê Xanim bi yekî mîna te re razê. Kî dizane, niha çi derew ji te re kirine û xwestiye dilê te li xwe germ bike!

Elî dizanibû ku Xanim ne ew kes e dilê kesî bi xwe bide şewitandin. Dizanibû Xanim ew kes e di heman demê de bi axaftinên xwe û bi tecrubeyên xwe dixwest alîkariya mişteriyan bike. Lê di dil û hişê Elî de kurmekî diliviya; dexesî dikir, nedixwest Mîralî bi Xanimê şîrîn bibe! Lewre jî çareyan difikirî da çawa Mîralî ji wir bi dûr bixe û nema Mîralî were wan deveran. Bêhnteng bû. Di dengê wî de hêrsê xwe dida der:

– Mîralî, êdî tu biçe Heskîfê. Ger ew texmîn bikin tu bi min re yî, piştî çûyîna te ê bela bînin serê te; ez wan herdu qebraxan baş dinasim. Ger kar bidin wan, ji bo bi cî bînin ê her tiştî bikin. Ê texmîn bikin tu bi min re yî. Ji wan wetir te ez qanih kirime.

– Tişt pê nayê. Ez ê çendekî bimînim li vir. Lê ez ê neyêm cem te.

– Tuyê biçî otêlê, ne? Ha, min bihîstibû mala we mamosteyan heye li vir. A çêtir ew e, biçe wir lawo. Her teyr bi refê xwe re. Gelek mamosteyên ciwan ên keç hene li van deveran.

– Ka ez bifikirim. Belî nabe ez ê li ku bimînim!

Elî qehirî. A di dil de da der:

– Tu fam nakî ne? Binihêre, ez carek din te li cem Xanim bibînim îja ez ê bira bira te bikujim! Elî mîna conegayek di arenayê de, pêşî bêdeng ma dû re êrîşî wî kir.

Mîralî rabû ser piyan û kir qîrîn:

– Ma jina te ye? Çi karê te bi wê ketiye?

Elî sîleyekê li rû Mîralî da. Mîralî dest bilind kir ku li wî bide. Bişar ket navbeynkariyê. Êgir ji Mîralî dibarî. Di wê kêliyê de bavê xwe, bavê Esma, kesên di bin çav de ku îşkence

li wî kiribûn bi bîr anî. Bêtir qehirî. Mîna xwe weinda bike kulmek li çavê Elî yê rastê da. Elî bi çavên xwe girt û rûnişt. Li hêlekê jî bi axîn diaxivî:

– Xwezî min çek neavêtibûya ava Dîcle. Xwezî aniha li vir bûya. Min guleyek berda eniya te da, ez ji te xilas bûma. Ez nizanim tu li ku bû bela serê min. Ax, ax. Ax lawê min, ax nexweşiya bêbext…

Mîralî serî xistibû nav destan û hêsir ji çavên wî de diherikîn. Elî rabû û meşiya. Mîralî bi dengekî bi xem pirsî:

– Ku de diçî?

Elî, li wî zivirî. Hinekî li wî nihêrî. Bi xeyd bersiv da:

– Ez ê biçim cem Xanimê. Çi tê bila êdî were serê min. Tu dixwazî çendekî li cem Bişar bimîne.

Mîralî, mîna bêçare bimîne, baweriya xwe bi wî anî:

– Baş e, bila mîna te be.

19

Bişar, çay amade kir. Dengê meqamê "kurdîlî hîcazkar" ji radyonê bi ser hêwanê diket. Derdora xaniyê kevnare bi sûr bû. Tu kesî ew nedidîtin. Pisîka wî, çû xwe di ber deriyê daşirê de bi cî kir. Daşir li derve bû. Mîralî çû av avêt ser çavên xwe. Bişar çay anî. Bişar hin pirsên ji rêzê ji wî kir. Mîralî yek bi yek bersivand. Mîralî ji Bişar re got:

– Mam, tu bi tena serê xwe dijî?

– Ez û pisîka xwe ne, got. Sohbeta xwe û karkerekî li Almanya bi bîr anî. Karkerî behsa berhemek Kafka ji wî re kiribû. Karkerî gotibû, di berhema wî de leheng bûye bihuk. Bişar xwest ji wan gotinan tiştekî derîne. Bi dengekî fesîh berdewam kir. Mîralî, ger însan bibin bihuk gerek bihuk û pisîk jî karibin bibin tiştekî din! A, ew ne bin jî, ew bi min melek in, melekên wanî ne gunehan nanivîsînin.

Mîralî bersiv neda. Li porê wî yê dirêj û li guharên di guhên wî de nihêrî. Tişt jê neket serî. Bi deqîqeyan bi wî awayî man.

Mîralî kêliyekê mereqa çavên Elî kir. Ji a xwe poşman bûbû. Bişar tê derdixist Mîralî xemgîn e. Teşî da dest Mîralî. Jê re got:

– Bi pisîkê re bilîze.

Mîralî xwest bi pisîkê re bilîze lê pisîk ji cihê xwe ranebû. Mîralî rûnişt. Ji Bişar re got:

– Mereqê xwe li min da der, mamo, ji bo çi tu bi tena serê xwe yî?

Bişar porê xwe bi benekî kendîrî ê zirav baş girê da. Xwe, li serpêhatiya xwe girt:

"Ez, di dibistanê de, serkeftî bûm. Min li Enqere zanîngeh dixwend. Piştî du salan min dev jê berda. Ez çûm Almanyayê. Li wir, min dest bi xebatê kir. Qezayek bi serê min de hat. Destê xwe ê çepê nîşanê wî da hê pêde çû. Her sê tiliyên min jê bûn. Pereyekî mezin dan min. Maeşê min jî dişixulî. Tiştê min xwestibû bi destê min ketibû, ez azad bûm."

– Derbasî be, got Mîralî. Nexwest sedemê devjêberdana wî a zanîngehê jê bipirse.

Bişar, li dû sipasiyê, mîna ji derewa xwe poşman bûbe, bi ken carek din behsa qezayê kir:

– Mîralî, ma ez ê çi ji te veşêrim, ne qeza bû, min bi qestî bi serê xwe de anî. Kuro ne wanî bûya heta hetayê ez ê bixebitiyama. Nedibû, ev e, ez bi tena serê xwe me û ji tenêtiyê hez dikim.

– Tu bi çi re mijûl î?

Bişar ew bir odeyekê. Di odeyê de, bi dehan cûreyên tovan hebûn. Tovên sebze û mêweyan, tovên kulîlkan. Yek bi yek navê wan got. Tov li ku, bi çi awayî bidest xistibûn ji Mîralî re got.. Dû re karê xwe got:

– Derê biharan, ez ji derdora Dîyarbekir de dest pê dikim, bi meş, ber bi alî Serhedê ve dimeşim. Li ku xweşiya min biçe, ez li wir tov diajom û diçim. Li devê riyan, li ber zinar û keviran… Ev çend sal in ez vî karî dikim. Tu dizanî, min îsal bi çavên serê xwe dît, gelek darên mêweyan şîn hatine. Hay kesî jê nîn e ku ez wî karî dikim.

Mîralî, bi heyranî, li wî dinihêrî, mamo, ji rewşa hêwanê xuya ye, ev hêwan bi min mîna parçeyek ji bihuştê ye. Însan naxwaze ji vir biçe, got.

– Mala te ye. Ez ji mexdûran hez dikim. Ger Xanimê te anîbe vir, xuya ye tu jî mexdûr î.

Mîralî bêdeng ma. Li koka darê nihêrî. Bişar kokekî mezin bi heya nîvê gewde ve anîbû. Alî gewde di varîlekî de bi cî kiribû. Derdor bi bêton dagirtibû. Kok mabû li alî hewa. Mîna hêlînekê xuya dikir. Kok bi tevî rehên xwe ên hişk dişibiya tabloyekê. Mîralî pirsî:

– Mam, ew kok ji bo çi ye?

Bişar axîneke sivik kişand. Qedeh dîsa dagirt û axivî:

– Bi dehan pisîkên min hebû. Kevokeke min jî hebûn. Min her êvarî diçû kezeb û goşt dianî ji bo pisîkan. Ew kok, mîna hêlîn bû ji bo kevoka min. Rojekê ez şiyar bûm ku pisîkan kevok xwarî ye. Êş da min.

– Balkêş e, kok û rehên hişk. Te ew mîna hêlîn bi cî kiriye lê pirî caran ez dixwazim fêm bikim. Têbigihîjim… Ez dibêjim sedemên din jî hene?

– Na, got, cixare vêxist. Wî jî careke din li kokê nihêrî hê axivî. Ez fikirîm ku ê tiştekî balkêş be. Hew wekî sûs û nexşekê ye. Ne bi tenê tu, kes dixwazin wate lê bar bikin. Bala min dikişîne, çi kes lê dinihêrin bi deqîqeyan difikirin. Halbûkî tu nîyetek min a din tunebû.

– Ê baş e, te bi pisîkan çi kir?

– Ma ne min got, min her roj diçû ji bo pisîkan goşt dianî. Min wan xwedî kir. Li welatê me di meha Adarê de ew girnewkî dibin. Ez hay jê çêbûm ên nêr pisîkên têjik dixwin da pisîkên mê girnewkî bin! Min nema êdî goşt da wan. Li vir, giş birçî man. Aniha, yek ji wan nema tê vir. Hew ev pisîk e, ez xwedî dikim.

Mîralî bi wate, pirsa jiyana wî a li Ewropa kir:

– Mam, bi vî halê alûs, niha li Ewropa tu ji jiyanê kêfxweşbûyî!..

Bişar mîna bimîne di mala matê de; nedixwest tiştên jiya ye ji Mîralî re bêje. Difikirî ku ê Mîralî bawerî bi wî neyne. Bişar dizanibû ku wan çaxan çi kesên ji Ewropa bihata behsa xwe û jinan dikir bê çi aniye serê jinan! Xwe bi xwe, ne xem e, dixwa-

ze bawer bike naxwaze jî bila bawer neke, got. Bi heman dengî dewam kir. Ez hem alûs bûm hem jî karîzmatîk. Bêdengiya min, nêrînên min ên kûr û bi rehm bandor li jinan dikir. Roj hebû ez bi du heban re radizam. Piştî wextekê tu wateya razanê ji bo min nema. Valahiyê dîsa xwe di dilê min de da der. De bifikire, hûn bi jinekê re radizên, bedena wê bi we re ye lê dilê wê ji bo we mîna sindoqekê ye. Çi fêdeya wê heye. Tişta ez lê digeriyam herhal ne ew bû… Tu dizanî, wextekê hukmê ba û agir li eşqa ax û avê nebûye. Wext hatiye, ba bûye xezeba evîna ax û avê. Ev ji bo agir jî bûye wêrekî. Ji wê rojê de ye agir evînan dişewitîne. Hem li Ewropa hem jî li van deveran min ew rastî dît.

Mîralî kûr û dûr fikirî. Wî, bêyî tiştekî bêje, pirs ji xwe kir. Her çi gava pirs ji xwe dikir tu peyv di hişê wî de nedima. Di wê kêliyê de jî di wî halî de bû. Ew mekanê ku lê bûbû mêvan hizûrekê da dilê wî. Nedixwest ew hal cî bide tiştekî din. Li Bişar nihêrî, li mekanê bi kulîlk, bi hewa hênik. Nihêrî û xwest têbigihîje bê çi têkiliya wan heye.

20

Mîralî ji mala Bişar derket. Xwe, li riya çarşiyê girt. Çû Deriyê Çiyê. Li ber sûrê rûnişt. Pişt bi alî kolanê ve kir. Li sûrê nihêrî. Li cihekê, aliyek sûrê hilweşiyabû. Bêyî bifikire li cihê hilweşiyayî nihêrî. Bi qasî saetekê bi wî halî ma. Zarokek li hember wî rawestiya bû. Benişt dicût. Çend caran zarok hewl da, bi quretî, benişte xwe rê Mîralî bide. Mîralî hewlên lawik tênegihîşt. Di wê kêliyê de, lawik mîna bêhnteng be, bi her du tilîkan, benişt ji nava lêvan de ber bi devê xwe ve tavn da. Mîralî keniya. Zarok dilşad bû. Bi kêfxweşî meşiya.

Kêliyekê, çavên wî bi kevirekî ket. Kevirekî bi çavî bû. Ger hêdî jî dest bida kevir ê biketa! Rabû ser piyan. Çû. Li kevir nihêrî. Newiribû destê xwe bidê. Ditirsiya ku dest bidayê ê kevir biketa. Li kevir nihêrî. Rewşa kevirî ji xwe re kir xem. Biryar da. Ê bi kevirên piçûk cihê wî kevirî biedilanda. Nabe, got û rabû.

Birçî bûbû. Di sikakek teng de, di dikanekî bi qasî çarmetrekare de kezeb xwar. Ji Deriyê Çiyê de dest pê kir, ber û berê sûrê meşiya. Her ku li sûrê dinihêrî ew kevir bi bîr dianî. Esma bi bîr dianî, Alîta bi bîr dianî. Xanim, Elî, Bişar û rewşa Heskîfê jî ew mijûl dikir.

Êvarî çû mala Bişar. Çawa ket hundur bêhnek xweş ya xwarinê bi ser wî ket. Bişar savar û kezeb amade kiribû.

Haya Mîralî jê tunebû ku Bişar teklîfatî li her sê jinan û Elî jî kiriye. Merhebayî da gişan.

Giş li ser sifreyê bûn. Elî carna bi madê tirş li Mîralî dinihêrî. Carna jî Mîralî û Xanim kontrol dikir. Jinên din û Bişar bi kêf û bi henek bûn. Kêliyekê Xanim ji her kesî xwest da bêdeng bin. Her kes ma li benda Xanimê. Wê li Mîralî nihêrî û got:

– Mîralî, ma peyamên te ji bo vî bajarî jî nîn in?

Mîralî nizanibû çi bigota. Xanimê li gotina xwe zêde kir:

– Ê te tunebin jî peyamên me hene. Em, ê karibin li vir jî tiştekî wanî bikin?

Mîralî dîsa bêdeng ma. Xanim behsa serpêhatiya Mîralî a li Heskîfê kir. Mîralî bi awirên bi xezeb li Elî nihêrî. Elî xwe li kenê bi wate girt.

Bişar, nabe, got. Li vî bajarî nabe, ê her kes henekên xwe bike. Li van deveran, însan xwe li tiştên mezin digirin. Ê kesên sîyasî jî destûr nedin çalakiyên wanî.

Xanim:

– Ji bo çi?

– Ew ê bêjin, bi van tiştên beredayî, serê gel tevlîhev nekin.

– Tu jî mîna wan difikirî?

– Ez mîna tu kesî nafikirim lê rastî ev e. Ew ê nehêlin. Ê ji we re bêjin, baş e, afîşên we, diruşmeyên we û nêziktêdayîna we a li jiyanê baş e. Ji kerema xwe re, bi nav gel bikevin. Xebata xwe di nav gel de bikin.

Wextê Bişar diaxivî Osman bi bîra Mîralî hat. Osman, bi awayê sergirtî, tiştin ji wî re gotibû. Bişar, bêtir wateya gotinên Osman bi bîra Mîralî xist. Mîralî jî tevlî axaftinê bû:

– Nîyeta min tune, li vir, tiştên wanî bikim. Ez ê vegerim Heskîfê.

Elî ji wan gotinan kêfxweş bû. Xanimê fikra xwe got:

– Bi dor, em ê her yek kilamekê bêjin.

Mîralî ji wê re got, ez ê nebêjim. Xanimê bêyî bi ser Mîralî de biçe, dest pê kir. Li dû Xanim Elî kilamek got. Jinika tirk yeka bi tirkî a ereb jî yeka bi erebî got. Kilamên bi şewat û romantîk, bi dengekî nizm, sivik olan dida. Bişar, beriya kilama xwe bêje bang li pisîkê kir. Tezbîh dîsa bi serê ben ve kir. Teşî xist destê xwe. Bi pisîkê şa bû. Çû ji odeyê kaxiz anî. Helbestekî bi tirkî lê kiribû. Ji wan re xwend:

"*Em xeyalan xweş dikin / ma ew ê karibin qarişî xeyalên me bin/*

Ma ew ê karibin bizanibin em çi xeyalan dikin/ em kilamên xwe dibêjin/

ma ew ê karibin kilaman bikujin / bi bêhn in kilamên me / bi çîrok in kilamên me/

em dinihêrin / ew ê nikaribin qarişî nêrînên me bin/ma ew ê karibin ji me re bêjin, nebînin/

em dikenin / ma ew ê karibin reng bidin kenê me / em dimeşin / ew nizanin wextê em dimeşin sikak hurmet li gavên me digirin / em hez dikin / carna ji qehpikekê/ma ew ê karibin bi qehpikekê re jî bibin yar"

Piştî Bişar helbest xwend her kesî li çepikan xist. Xweşrengî û xweşdengiyekê her kesî, di wê kêliyê de, dilşad kiribû. Jinika tirk ma di nav xeyalan de. Bi melûlî, bi xeyalên jinanî.

Şev gihîştibû wexteke dereng. Xanimê her li Mîralî dinihêrî. Elî, êdî bes e, em rabin, got. Xanimê dîsa hêvî li Elî şikênand:

– Baş e, Bişar rica min ji te heye.

– Bêje Xanim, her gotina te li ser çavan.

– Ez ji te rica dikim; tu, Elî û herdu jin herin xêniyê me. Ez û Mîralî li vir bimînin!

Xwêdaneke sar bi ser Elî ket. Lêv li wî bi lerz bûn. Ber bi guhê Mîralî ve xar bû û axivî:

– Şeva din min kir û nekir Xanim bi min re raneza. Ev

giş bela te ye. Te ev derd li min peyda kir; min diêşîne, ez pê dinalim. Bes e lawo! Bes e kuro, fam bike!.. Bi a wê meke. Ger tu bi a wê bikî ez lawê te bim, ez ê aniha belayekê bînim serê te.

Mîralî hewl da ku biaxive. Xanimê kêm zêde fam kiribû bê Elî bi çi derdî ye. Nedixwest Mîralî biaxive, gotin ji devê Mîralî girt:

– Ê wanî xweş be. Elî tu çi dibêjî?

Elî hay ji xezeb û rika Xanimê hebû. Dizanibû ger Xanim bi hêrs bikeve ê tu car nikaribe dil li wê xweş bike. Elî ji neçarî, tu bi a xwe yî, ma ka tiştê ku ez karibim bêjim maye, got. Xanim bi ken bû. Bişar, Elî û herdu jin derketin.

21

Xanim erd vekola. Çaleke piçûk çêkir. Bi qasî deh metreyan ji çalê bi dûr ket. Du gûz ji bêrîka xwe derxist. Yek jê da Mîralî a din ji bo xwe hişt. Awayê lîstikê jê re vegot:

– Di piçûkatiya me de, di rojên îdan de, xortan ev lîstik dilîst. Ger ez karibim gûza xwe biavêjim çalê û gûz di çalê de bi cî bibe, ez ê bi ser bikevim. Ez ê gûza te ji te bistînim. Her wiha ji bo te jî heman şert heye.

Mîralî, mizawirî kir:

– Baş e, cara pêşî tu bi ser bikevî û gûza min ji min bistînî ê gûz nemîne, em ê çawa lîskê berdewam kin?

– Tu rast dibêjî. Baş e, çare heye; her ku ez bi ser bikevim ez ê ramûsanekê ji te bigirim. Ê te tu çi dixwazî tu dizanî!

– Her cara ku ez bi ser bikevim tuyê kilamekê ji min re bêjî. Min ji dengê te hez kir.

Lîstik lîstin. Cara pêşî Mîralî bi ser ket, Xanimê kilam got. Mîralî hîç nexwest biser bikeve! Her carî Xanim ew ramûsa. Betilî bûn. Cara dawî li ser erdê vezeliyan û pev şad bûn. Mîralî di wê wextê de fikirî, gelo gunehê min bi Xanim tê lewre ez bi wê şad dibim. Hewcedariya wê bi maçên xapînok û ne ji dil nîn e. Lê ez bêjim, ez ji dil û can wê radimûsim vêga jî ê bibe fêdekarî ji bo min. Wan fikran zêde dom nekir. Mîralî pêdivî pê nedît pirsên ji xwe dikir bibersivî ne.

Neçûn odeyê. Derve gelekî hênik bû. Bi kesan sar bihata

jî wan hewa wekî, hewa hênik, binav kir. Li ser genepeyê vezeliyan. Mîralî, kevir, got.

– Kevirê çi?

– Kevirê li sûrê, kevirê li ber ketinê ye, got. Hinek rawestiya. Behsa kevirî kir.

Xanim hem keniya hem heyirî hem jî xwest têbigihîje. Mîralî, mîna ji nişka ve tiştek keşif kiribe axivî:

– Ew kevir peyam e.

– Peyama çi?

– Peyama vî bajarî!

– Kevir nêr bû an mê?

– Nêr û mê?

– Belê. Ger bi çavî be mê ye, ger bê çavî be nêr e.

Mîralî kevir baş bi bîr dianî. Mîna bêriya kevirî kiribe, kevir anî ber çavê xwe. Xwest hinekî nêrtî û mêtiya kevir şîrove bike xwe bi xwe. Bi wate li Xanimê nihêrî,got:

– Mê bû.

Bêdengî, navê wê kêliyê bû. Heryek bi dilê xwe re mijûl bû. Piştî wextekê, Xanim ji bêdengiyê zîvêr bû:

– Mîralî, ger tu neyê, ez ê bêriya te bikim.

– Bawer nakim ez êdî werim. Ez ji te tika dikim, tu biçî mala xwe.

– Ji bo çi?

– Elî dexesî dike. Ez, naxwazim ew biêşe. Ew mîna ji te pir hez bike.

– Te çi tiştekî zor ji min xwest. Bila mîna te be. Her êdî em ê hevudu nebînin, wê çaxê, bila deh deqîqe li gorî dilê min be.

Pev şad bûn. Xanim wexta ji derî de derket maçek li xala li ber xamzeyê da. Bextê te me, li wan deveran bêriya min bike. Însan bimîne di bîra hezkiriyan de baş e, got û derket.

Piştî wextekê, Bişar hat. Sipasiya Mîralî kir:

– Baş bû ku te Xanim şand. Kuro, Elî li ku bû dîn dibû; bira bira pîlan çêdikirin ê tiştek bianiya serê we. Gerçî min ê nehiştiba lê ew har bûbû.

Mîralî bêdeng ma. Bişar, ew vexwend odeyê da ku razê. Mîralî sipasiya wî kir û xwest li ber tîrêjê bi pisîkê re bilîze. Pisîkê êdî bi wî re jî dilîst. Piştî lîstikê çend caran gûz girt û xwest di çalê de bi cî bike.

Mîralî xwe avêt ser genepeyê. Heya sibehê raneket. Çawa bû berbang, bêyî xatir ji Bişar bixwaze, derket. Heya ber sûrê çû. Li kevir nihêrî. Li ber sûrê rûnişt. Tav li bajêr şîrîn dibû. Xew bi çavên wî ket. Bêhay, hinekî raza bû. Bi dengê duajoyê erebeyan re şîyar bû. Çû. Taştê xwar.

Ji wir pirsî bê melzemeyên înşaetê li ku tên firotin. Yekî, cî li ber wî xist. Meşiya. Li dikanê, dused û pêncî giram bêton kirî. Dikandar, bi ecêbmayî, bêton kişand û da wî. Piştî Mîralî meşiya, dikandar xwebixwe got:

– Li vî bajarî, însan çi ecêbiyan dibîne û çi nabîne.

Mîralî meşiya. Li bûfeyekê, av kirî. Xwe li sûrê girt. Hêdîka destê xwe da kevir. Axa di ber kevir de hinekî herikî. Mîralî, her carî, di kefika destê xwe de hinekî bêton amade dikir û berdida derdora kevir. Kevir bi qasî destê wî bû. Hemî bêton xist derdor û bin kevir. Ma li wir. Bi qasî du saetan ma. Dû re derket baniyê sûrê. Li derdor nihêrî. Xwe bi xwe fikirî:

"Evîn şop dihêle. Em bi vê dizanin. Çîrokên eşqê ji bo eşqê dibin temen ev jî baş e. Lê lekeyên ku eşq li rih dihêle. Lekeyên eşqê jî hene; hûn tu car naxwazin wan lekeyan bişon. A rast, kesên bi eşqê ketine, dizanin lekeyên eşqê nayên şûştin. Kesên bi eşqê nizanibin, mîna tûka li dest xwe bişon, rihet in."

Sûrê Heskîfê bi bîra wî anî. Dom kir:

"Heskîf jî lekeyek eşqek şaristanî ye. Gelo ê karibin lekeyên eşqê bişon?" got. Meşiya. Çû. Li erebeya Batmanê siwar bû.

Li Batmanê bû. Kenê Esma ên di wextê sohbetê de bi bîr anî. Kenê Alîta ên wextê gerê. Wextê pevşadbûnê, xwe li ber çavên wî da der. Bi dilekî bi kul û bi xem, rengê bedena Xanimê fikirî. Her tişt mîna siyê mabû li ser rihê wî.

Li vî alîyî li erdê nihêrî li wî alîyî li erdê nihêrî. Tirs di dil de hebû. Ditirsiya ku li însanan, li wechê însanan binihêre. Lê, digot, ger tesadifek din xwe bide der!.. Li erebeya Midyadê siwar bû da biçe Heskîfê.

Di rê de, çend caran li pompeyên ku li çiyayê Raman neft derdixist nihêrî. Bi awayekî peroyîdîk dadiket û radibû pompe; ew halê makîneyan şiband karê xwe. Karê xwe jî mîna saetekê, mîna makîneyekê fikirî. Hew şagirtan carna sebir dida wî. Şagirtên xwe bi bîr anî. Bêriya wan kiribû. Da hişê xwe ku ê li dibistanê ji zarokên pola pêncan bixwaze ku ew çîrokan lê bikin. Ê navê karekteran wî bigota û zarokan, wan navan, mîna karekterên çîrokên xwe bifikiriyana. Di serî de Esma. Xanim, Bişar, Elî, Osman, Alîta... Fikir bi wî xweş nehat. Dev ji wê fikrê berda. Li xweşiya wî nediçû ku navê Xanim wekî, Hanim bida nivîsandin. Gerek navê Alîta jî biguherta. Xem ji bo navê Elî nexwar, çi Elî çi Alî bihata nivîsîn, ne xem bû!

Li dû navê Elî bira bira mereq dikir, bê di wê kêliyê de, Elî çi dikir. Ken xwe li rû wî da der. Xwe bi xwe, ger Elî ez nas nekirima, ez bi dehan caran bi Xanim re razama jî ê dexesî xwe li wî neda der. Ji ber ku ez nas dikirim dexesî dikir.

Baş bû ku ez nemam li wir, hîç nebe niha dil li wî rihet e, got. Rengê kevirê di sûrê de ji ber çavên wî nediçû. Li kevirên derdora rê, li zinaran dinihêrî. Kevirê di sûrê de, mabû di dilê wî de. Bêriya wî kevirî dikir.

22

Li Heskîfê peya bû. Ji dil dihat biçe cem dikandarekî ciwan. Ê bi eslê xwe Sûryanî ku bi erebî diaxivî. Ew kesê ciwan ê çavşîn, her wext, şeraba sûryanî peyde dikir. Her cara ku Mîralî şerab vedixwar ji bo Osman xem dixwar. Osman tu tiştî venedixwar. Mîralî, ez ê şerabê nebim mal, li dikanê qedehekê vexwim hê biçim mala Osman", got.

Wanî jî kir. Çû dikanê. Wî û dikandar ê ciwan sohbet kir. Li ber qoltixê, bi awayê ku rêz li karê dikandar bigire, bi dizî, qedehek şerab vexwar. Kir û nekir dikandar pere ji wî negirt. Ji ber ku her tiştên xwe ji wir dikirîn, dikandar mîna xatir li wî girt.

Ji dikanê derket. Ji qesabî hinekî goşt kirî. Osman li mal bû. Li halê hev pirsîn. Mîralî bêyî behsa serpêhatiyên li Dîyarbekir bike hew sedema çûyîna xwe bi vî awayî got:

– Bila haya kesî jê çênebe. Elî nedixwest êdî kesî bikuje. Ez bi wî re çûm. Ê nema were van deveran.

Osman bawer nekir. Mîralî, çîroka Elî jê re vegot. Osman lovî amade kiribû. Goşt hiştin ji bo roja mayî. Loviyên hişk xwarin. Bi nav sohbetê ketin. Osman carna bi ajîteyî, carna jî mîna şîret li wî bigire diaxivî. Osman, xwe westiyayî hîs dikir. Li ber şibakeyê rûnişt. Gelek wext derbas nebû Osman raza. Mîralî, li ber şibakeyê bû. Bêriya diya xwe kiribû. Li îhtîmalan difikirî bê malbata Esma bi ku ve çûye, li kîjan welatî bi cî bûye.

Ji pirs û texmînên xwe tu encam bi dest nexist. Xem dixwar ku diya wî jî bi çûyîna Esma û diya Esma re niha gelek xeman dixwe. Halê diya xwe, di kûrahiya rihê xwe de, hîs dikir. Dayikek ku bi halê xemgîn be ji bo zarokan tiştê herî zor e. Mîralî jî bi wî halî êş dikişand. Her tişt ji bîr ve kiribû. Bi dengê avê re serpêhatiyên xwe ê zarokatî bi bîr dianî. Di zarokatî de, her carî, ji bo serşûştinê pevçûn derdixist; diya wî ew bi çi halî dixist serşokê, piştî xwe dişûşt av li xweşiya wî diçû û nedixwest derkeve. Diya wî bi hêrs diket:

– Ez bi çi halî te dixim serşokê. Ji bo çi îja dernayê, ma ev av bê pere ye!

Xewê zor li wî dikir. Baskên çavên wî giran bûbûn. Serê wî li camê asê mabû. Mîna deriyê xewê wê di hişê xwe de dade, xwe da rikê. Carna ku baskên çavan li wî giran dibû, bask lê ziwa dibûn ew diqirpand û bi xeyalan de diçû. Xweziya xwe bi şeva ku li şikeftê raza bû dianî." Ezê dîsa şevekê li wir razêm, na, ezê ranezêm heya sibehê rihê xwe serberedayî bihêlim da ew bi nav xewn û xeyalan bikeve." got di dilê xwe de. Deng bi derî ket. Serbaz û hin leşker li ber derî bûn. Osman jî şiyar bû. Ji Mîralî xwestin da biçin Qereqolê. Li qereqolê heya destê sibehê derbarê Elî de pirs ji wî kirin. Mîralî tu tişt negot. Jê pirsîn bê ew çûye ku û li ku maye. Mîralî bê bersiv hişt. Dev ji wê pirsê bernedan:

– Cihê ku tu lê mayî ji me re bêje! Tu li ku bû û li ku mayî?

Nedixwest bêje ew çûye mala Xanim lê tu çare nedît. Bersiv da:

– Malek hebû, li wir jin… Jin hene, bi pereyan… Ez mam li wir.

Gef li wî xwarin. Ger ku ji derî mamostetiyê tu xwe li tiştên din bigirî, em ê çi bînin serê te! Ji Mîralî xwestin da ew biçe. Li derketinê ji Mîralî re, dostaniya te û Osman jî bala me dikişîne, got serbaz!

Mîralî, bêdeng derket. Sibeh zelal dibû. Halê Heskîfê ê

di wan saetan de beden li wî sivik kir. Nedixwest biçe mal. Ji bo Osman xem nexwe çû agahî da wî. Xwe li riya kelehê girt. Li kelehê li çarhêl dinihêrî. Nihêrînên wî mîna bêwate bin. Di rastiyê de wî nikaribû hin tiştên di dil û hişê xwe de bi nav bikira, li cihekê bi cî bikira. Carna bi deqîqeyan xwe li kevirekî, li kavilekî, li deriyekî xirabeyan digirt. Dinihêrî û bêhnên kûr xwe li wî didan der.

Rastgele serê xwe hilanî. Dimeşiya. Li kelehê ber bi alî jorîn ve meşiya. Ji nav xirabeyan derketibû. Ji kelehê hinekî dûr, li cihekê rûniştst. Ew cî ne dişibiya xirabeyan ne jî dişibiya erda normal. Ji wir rabû. Ber bi alî zinar ve meşiya. Mîna bizinekê, xwe li riyên asê ên zinêr girt. Ji nişka ve, li ser piyan sar bû û ma! Dengekî bi newa ê gelek nizm bi ser wî ket. Li alî gelî nihêrî, li derdor nihêrî tu tişt nedît. Ji dil hat ku, bi lez, ji wir bi dûr bikeve. Nedixwest tesadifek din bi nav jiyana wî bikeve. Lê, got, ger tu naxwazî pêrgî tesadifan werî ma ev çi halê te ye, ev çi hal e? Na, gerek tu neçî û ew çi be jî bi serê te de were, raweste û xwe li deng bigire!

Rawestiya û xwe li deng girt. Deng ji alî hundur ê şikeftê de dihat. Baş bala xwe dayê. Cihekî mîna derî be û bi selên mezin hatibe nixumandin dît. Dest da selî. Selekî gelekî tenik û sivik bû. Deng êdî nedihat. Sel da alîyekî. Bawer nekir! Keçikeke temenê wê li derdora bîst û pêncan razayî bû. Mîralî li cîh rûniştst. Bi awayek ecêbmayî rawestiya. Wate li dîmenê negirt. Mîna siûdekê hesiband ku keçik razayî ye. Xwe li riya derî girt da biçe. Gotina ku Xanim ji wî re gotibû bi bîra wî hat: "Ji însanan nereve!" Neçû. Mayîna xwe jî wekî ehmeqî qebûl kir.

Li derdora xwe nihêrî. Çend tenekeyên pênc kîloyî hebûn. Di yekê de penîr, di yekê de av, di yekê de hingiv, di yekê de çay û di yeka din de jî şekir hebû. Li goşeyek jî bi qasî deh kîloyan ard hebû. Li ber serê keçikê tizbîyek ji nod û neh moriyan pêkhatî hebû.

Li goşeyekî jî tûpekî piçûk, xortimek û sêlek ji bo nan

li ser bipêje hebû. Heyecanekê xwe li Mîralî da der. Hebe tunebe ev keçik ji şervanan e, fikirî. Tezbîha nod û nehî û lihêfa ku keçik li ser razayî ew fikir bi wî piştrast nekir. Li halê keçikê nihêrî. Ne dişibiya birîndarekê ne jî keseke halê şervanan pê bikeve.

Keçik, bi serpiştî, razayî bû. Keçika bi bejn û bal mîna morika xewê di guhan de be, bi halek sivik û şîrîn razayî bû. Sînga wê wekî sînga dergûşekê hildibû û dadiket. Mîralî li dîwarên şikeftê nihêrî. Li îşaretekê, li hêviyekê digeriya!

Xwe bi xwe axivî, "Ev çi hal e, ev çi halê min û Heskîfê ye, ev çi çîrokên kesan in ez hay jê çêdibim. Ma ev hal e."

Heskîfê wekî Heskîfa di xeyalê xwe de fikirî. Bajarokekî modern, tê de sînema, şanogeh, bi dehan kafe. Însanê tê de azad. Xeyalên xwe ên pêş jî dîsa lê zêde kir, "bajarê huner û eşqê" got.

Baskên çavan li wî ziwa bûn. Xwest keçikê şiyar bike. Ew şiyar nekir. Rûnişt. Birçî bû. Dest neda xwarinê. Pişta xwe spart şikeftê. Xewê zora wî biribû. Ew jî raza.

23

Piştî nîvro bi hîsa birçîbûnê re Semîre ji xewê şiyar bû. Hinekî bi ser halê xwe de fikirî. Dilê wê tenik bû. Lorand. Bi lorandinê re Mîralî şiyar bû. Deng bi xwe nexist. Semîre rabû. Bi qasî kevçiyekî av xist kefika destê xwe û bi ser çavên xwe wer kir. Hinekî ber bi aliyê ronahiyê ve çû. Fistanê xwe hilda. Derpê jî ber bi jêr qat kir. Li navbera navika xwe û canê xwe ê jintiyê nihêrî. Mîralî serî ber bi jêr ve kir. Wextê dengê girînê bi Semîre ket Mîralî nihêrî. Di navbera navik û hinavê wê yê jinanî de deq hebûn. Çar herf û simbilê genim hatibû neqişandin. Mîralî nema li bedena wê nihêrî. Mîralî metelmayî mabû. Keçik bi bedena xwe şa nedibû. Bi girîn bû.

Mîralî mîna di xewê de be tevdigeriya. Nedixwest keçik hay jê çêbe ku wî bedena wê dîtiye. Semîre derpê dîsa li ser xwe bi cî kir. Fistan berda û zivirî! Mîralî dît. Ne kir qêrîn ne jî metelmayî ma! Li Mîralî nihêrî. Xwe bi xwe got, "Dibe ku ew kesê birayê min behsa wî kir ev kes be. Reben, nexwestiye min şiyar bike. Ez li benda yekî bi temen û xirab bûm. Baş e, ciwan e. Qey qisûrên wî ên din hene. Ger ne wanî bûya ev ê tirk ji bo çi ji welatê xwe bi rê biketa û ji bo min bihata."

Bi navê malxweyî, hema dest pê kir û xwarin amade kir. Porê xwe, ser û guhê xwe ediland. Her carê jî li Mîralî dinihêrî. Mîralî her ku xwe li xewê danîbû jî, dû re, bira bira raza bû. Semîreyê piştî xwarin amade kir li hember wî rûniştt.

Bi nav xeyalan ket." Di dinyayê de tu tişt bi qasî biratiyê ne şîrîn e." got û xwe bi xwe axivî:

"Min dizanibû wê birayê min xwedîtî li min bike. Ger qisûrekî wî yê din tunebe xuya ye mirovekî rûşîrîn e. Mala birayê min ava. Nehişt qedera reş bi ser min de were. Tişt pê nayê. Ez ê ji welatê xwe bi dûr biçim. Belkî heya dawiya temenê xwe ez ê nema dê, bav, bira û dostên xwe bibînim. Tişt pê nayê… Piştî zarokên min çê bin ê hêviya jiyanê xwe li min bide der."

Mîralî, mîna kesê hay ji bayê felekê tunebe, bi halek wanî şiyar bû. Semîre, bêyî tiştekî ji Mîralî re bêje, bi nêrînan xwest bala Mîralî bikişîne ser sifreyê. Mîralî şok bûbû. Semîre tu bertekî rê nedabû! Nepirsî bû bê ew kî ye, li wir çi karê wî heye… Bi awayekî ku tu tişt neqewimî be tevdigeriya. Semîre wextê bi tirkî, "kerem kin ser sifreyê", got Mîralî bêtir metelmayî ma. Ji Semîreyê pirsî:

– Hûn tirk in?

Semîre bi fedîkarî, "na, ez kurd im", got.

– Tu ji bo çi bi tirkî diaxivî?

Semîre ket nav şikê. Bêyî bersiva wî bide, pirs bi ser pirsê de ji Mîralî kir:

– Ma tu ne tirk î? Ka birayê min?

– Na, ez ne tirk im. Birayê te…

Semîre hema ji Mîralî bi dûr ket. Bi tirs, bi hêrs, bi metelmayî li wî nihêrî. Ji bo bawer bibe dîsa pirsî:

– Niha tu bi kurdî dizanî, ne?

Mîralî bi kurmancî bersiva wê da:

– Belê.

– Çi karê te li vir heye?

Mîralî ê bersiv bida wê. Semîre nema li benda bersiva wî:

– Bavê min te şand vir, ne? Te çawa cihê min dît? Haya birayê min ji te heye?

– Kesî ez neşandim vir. Bi tesadif ez hatim vir. Ez birayê te nas nakim.

Semîre li halê Mîralî nihêrî. Halê wî ne halê kujeran bû. Nexwest pirsên bi wate ji wî bike. Bêdeng ma. Ji wan pirsên xwe jî poşman bû. Mîralî, bi dengekî nerm û xerîb axivî:

– Ez mamoste me. Digeriyam. Sewta dengê te bi ser min ket. Min selî da aliyekî û ez ketim hundur. Ez ne te nas dikim ne jî haya min ji tiştekî heye.

– Wê çaxê rabe. Rabe û biçe, belî nabe bê birayê min çi wext were!

Mîralî, li bîbikên çavên wê en zeytûnî nihêrî. Nêrînên wê melûl bûn. Lêvên hinek stûr û rengê xwînê ê vekirî xwe lê dida der. Bi henûnîya xwe, xem dikir dilê Mîralî. Bi nêrînan dixwest ji halê wê tiştan bi dest bixe. Deq û neqşên li bedena Semîreyê, pirsên Semîreyê, halê Semîreyê bes mereq xistibû dilê wî. Bê biryar bû. Nedixwest hay ji çîroka wê çêbe lê dil û hişê wî nerihet bû.

Navê min, Mîralî ye, got. Keçikê bi dengekî xembar, navê min Semîre ye, got.

– Tu Heskîfî yî?

– Na.

– Binihêre Semîre, bi awayekî tesadif ez hay ji çîrokên însanan çêkdibim. Ev jî, di vî temenî de, hukum li jiyana min dike. Ditirsim ku hay ji çîroka te çêkbim. Baş e, a çêtir ew e ku ez biçim û hay ji çîroka te çêknebim.

Mîralî rabû ser piyan. Semîre nedixwest îtîraf bike ku ji gotina xwe poşman bûye. Lê nêrînên wê her tiştê derdibir; lavakar bûn nêrînên Semîre. Mîna nêrînên wê ji Mîralî re bêjin, “ev çîrok ne ji çîrokên din e”.

Semîre ber bi sifreyê ve çû. Deng li xwe nerm kiribû:

– Ez, bi tenê bi çîrokekê dizanim, got. Reng bi rûyê wê ve hatibû. Bi rengekî şîrîn mîna henek li Mîralî bigire pê de

çû. Qey tu yekî muhîm î lewma Xwedê wan çîrokan bi serê te de tîne.

– Hay lo…

– Ka hinek xwarin bixwe. Hêvî dikim ku birayê min neyê.

Mîralî, ber bi sifreyê ve çû. Behsa birayê wê nekir. Neqşên li bedena Semîre û halê wê ê bi girîn nedihişt Mîralî li gorî birçîbûna xwe xwarin bixwe. Nabe, got, belkî êdî ev çîrok çîroka dawî be. Çi heye ji wan neqşan e, çîroka deqên li bedenê. Laqek nan di hingiv wer kir. Piştî xwar hinekî ji sifreyê bi dûr ket. Pirsî:

– Çi mesele ye? Semîre, çi karê te heye li vir? Wextê te ez dîtim tu metelmayî nemayî. Ger tu bixwazî ez dikarim guhdariya te bikim.

– Xwezî tu aniha keçikek bûya. Tu mêr î, ez naxwazim çi bi serê min de hatiye ji te re bêjim.

– Tiştên tu naxwazî bêjî nebêje.

– Wê çaxê ne hewce ye ez vebêjim. Ka tu bêje, tu bira bira mamoste yî, tu kî yî?

Mîralî dest pê kir. Evîna xwe û Esma û serpêhatiyên dawiyê yek bi yek ji Semîre re vegot. Nizanibû ji bo çi bû, dixwest çi di dilê wî de heye vebêje! Her ku digot dil li wî rihet dibû. Semîre dest dabû ber rûyê xwe. Mîna guhdariya hevaleke xwe a keç bike ji dil û can xwe li vegotinên wî digirtin.

Semîre, carna bi axînên kûr, dixwest tevlî sohbeta Mîralî bibe. Kêliyekê jina cerdevan bi bîra Mîralî hat; Semîre çiqas dişibiya wê jinikê. Hew çavên Semîre ji ên wê jinikê reştir bûn. Bejn, xwînşîrînî, rengê wan dişibiya hev. Mîralî bêdeng bû.

Semîre bê tebat bû. Bêaramiyek hebû di dilê wê de. Ditirsiya ku birayê wê bi ser wan de bê. Li hêlekê jî, Mîralî ji bo hal û tenêtiya xwe, mîna derman hîs dikir. Mîralî ji halê wê têdigihîşt. Mîna bi biryar be, carek din pirsî:

– Semîre, ev tesadif bin jî bi awayekî bi wate ne. De, tu yê meseleyê vebêjî an ez rabim û biçim.

Semîre mîna destê wê li ber rojê be, qey li benda wê wextê bû, hêviya pirsek wanî dikir. Ma ez bibêjim ê çi be nebêjim ê çibe, de ka ez bêjim, got xwe bi xwe. Dest pê kir:

– Tuyê hin pirsan ji min nekî, ne?

– Ez çi dizanim.

– Ger tu bikî jî ez ê bersiva hin pirsan nedim.

– Tu bi a xwe yî.

– Bavê min, dixwaze min bikuje. Qebhetek min heye. Bavê min û birayê min li hev nakin. Birayê min li Heskîfê karmendê tendurustiyê ye. Navê wî Şukrî ye. Belkî tu wî dinasî. Mîralî, na, got. Semîre dom kir. Ez ji gundê me anîm vir. Hevalekî wî heye, yekî tirk e. Birayê min mesele ji wî re gotiye. Hevalê wî jî xeber daye gundê xwe. Lawê xalê wî heye. Wî ji birayê min re gotiye, em Semîre bidin lawê xalê min. Ev du hefte ne, birayê min ji tirsan ez li vir bi cî kirim. Heya lawik î tirk were û min bibe…

– Ji bo çi te anî vir? Ma dikaribû li mala xwe an jî li mala hevalekî xwe te bi cî bikira.

– Hûn bavê min nas nakin. We nas bikira we ê bidîta kesekî çi bi xezeb e. Ji tirsê. Birayê min naxwaze ez bême kuştin.

– Ez ê pirsa qebhetê ji te nekim, texmîn dikim lê dîsa jî nakim!

– Ê tu kes nikaribe texmîn bike.

– Meseleya evîndariyê ye, ma wê qebhetên keç û jinan, li vî welatî, wekî din çi be.

Ev gotin li xweşiya Semîre çû. Hestiyariyê xwe lê da der. Bi halê girî bû. Mîralî, serbest be, girîn ne ew tişt e ku qebhet be, got. Semîre nemabû li benda gotinên Mîralî, digiriya.

Alîta çawa di kêliyek wanî de ew hembêz kiribû, wî jî dixwest bi wî awayî Semîre hembêz bike, wanî nekir.

Semîre gelekî giriya. Mîralî, girîyê ew qas zêde jî ne baş e. Bêje, însan gerek ji xwe nereve. Veneşêre, heya ku em tiştên di dilê xwe de nebêjin wê ew tişt veşarî bimînin, got.

– Qebheta min ne ji wan qebhetan e. Dizanim niha çi di serê te de xwe daye der lê ne wanî ye. Li alîyekî ve kenê guran bi halê min tê ji alî din ve jî li serê min bûye bela.

Mîralî, bi ber bayê gotinan ketibû. Nedixwest texmînan bike. Dizanibû di çîrokan de, ne belî ye bê kîjan peyv bibe destpêka êşê an jî kîjan peyv bibe bask. Dest xist nav porê xwe. Mîna bi pencikan porê xwe bikêşe hewl da. Semîre her tevgerên wî dişopand. Bi dilsozî, Mîralî, tu dixwazî bi riya xwe de biçe. Bila tiştên biqewimin bi serê min de bên. Li cihekî, ger li tayê min neyê, dilê min bes bişkê ezê karibim ray li xwe bikim, a bavê xwe bi cî bînim, ezê xwe bikujim, got. Mîralî bêtir ma di bin bandora halekî dilînî de. Li çavên Semîreyê nihêrî. Hinekî bi wî awayî ma. Semîre ji wan nêrînan zîvêr bû:

– Çi ye, gunehê te bi min hat. Gunehê xwe bi însanan neynin. Hew dirust bin bes e.

Mîralî, hem şerm kir hem jî li ser gotinên wê fikirî. Peyva "dirust bin", dev ji dil û rihê Mîralî ber nedida. Ma piştî vê gotinê ez ê ji bo çi ji Semîre veşêrim, got. Henaseyek kûr kişand da xwe ji metirsiyan bike. Ling li ber xwe dirêj kirin. Bi dengekî aheng ê bi êş axivî:

– Semîre, li min bibore lê min deq û neqşên li bedena te dît, tu digirîyayî…

Mîralî nizanibû çi bi serê wî de hat! Semîre ew ji defa sînga wî de daf dabû û Mîralî pekiyabû ser kevirê şikeftê. Semîre, bi qêrîn bû:

– Ma ne tu jî mêr î… Ehmeq… Te çawa li bedena min nihêrî, bêbext. Tu niha bextewarî, ne. Waye te li bedena min

nihêrî ye, tu ji bo çi nabêjî tu li dû pîlanan î?.. Mamoste ye, te dîtiye çi însanekî ji dil, him!..

Mîralî neaxivî. Semîre qey dixwest çi heyf û tol hene gişan ji Mîralî bistîne. Diqîriya, bi hêrs diket, heqaret dikir; bicehime, bicehime ji vir... Kurd e... Ma ne bavê min jî Kurd e... Tu jî bi halê wî yî, got.

Mîralî rabû. Semîre li erdê rûniştî bû. Bêhna wê hinekî hatibû ber wê. Mîralî bi gazin axivî. Bi çi awayî bedena wê dîtibû jê re got. Bi heman halê bi gazin dom kir:

– Bedena însan dilê însan e. Ma bi dîtina bedenê tenê dibe. Ez ne ji wan kesan im. Tu car, bi tenê min xwe bi bedenê nexapand. Ez aniha bi dilê te re mijûl im, ne bi bedena te re.

Semîre, hinek ji a xwe poşman bûbû lê tu nîyeta wê tunebû lêborîn bixwaze. Rûnê, got. Bi awayê emir bide axivî bû. Ew halê axaftina wê, ecêb bû, li xweşya Mîralî çû. Rûnişt. Semîre hat li cem wî rûnişt.

Hin çîrokên di zarokatiya xwe de bi bîr anîn Semîre. Di çîrokan de, carna, tiştên wanî diqewimîn, hêzek bi hawara mexdûran de dihat. Nizanibû ji ber çi bû lê hêviyekê xwe di dilê Semîre de da der. Bi destê xwe xwêdana bi ser eniya Mîralî ketibû paqij kir. Mîralî li pêş wê ketibû halê dergûşekî. Semîre bêyî tiştekî ji wî veşêre got:

– Ez çi ji te veşêrim çi ji Xwedê. Qebheta min ew deq û neqş in. Çar tîp û neqşek. Li gund min û xortekî ereb ji hev hez dikir. Ez wê çaxê şanzdehsalî bûm. Sê salan hezkirina me dewam kir. Diya wî jî pir ji min hez dikir. Dû re ez haydar bûm ku diya wî di ezebtiya xwe de bûye dildara bavê min. Lê bavê min ji wê hez nekiriye. Diya lawik ji bo ez bibim bûka wê, şev û roj dia dikir. Çend caran ji diya min hêvî kiriye da ew jî bibe alîkar. Bavê min sond xwaribû, wê tu car zewacek wanî nebûya. Min jî ji lawik gelek hez dikir. Lawik rojekê ez birim mala xwe. Ez nozdehsalî bûm. Wî û diya xwe ez qanih kirim. Ji min re, gotin ger em deq û neqşan li ser bedena te

çêkin ê bavê te neçar bimîne, te bide me. Min ji dildarê xwe xwest da ew ji odeyê derê. Ew derket. Diya wî, ji navê wî du tîp, ji navê min du tîp bi tevî wan neqsan li bedena min neqişandin.

Sal borîn. Çend caran lêwik gelek mereq kir bê wan neqşan bibîne, lê min nehişt.

Bi dehan caran malbata lêwik xwe avêt ber bextê dê û bavê min lê bavê min ez nedam wan. Beriya bi mehekê diya lêwik hal û mesele ji diya min re gotiye:

– Hûn keça xwe nedin lawê min, ma wê kî keçika we bixwaze.

Diya min li hember wan gotinan xem xwar. Ji min pirsî bê lawik bi min re raza ye an na. Min meseleya deqan jê re vegotin. Diya min li çongan da:

– Keçê, ma wê kî ji te bawer bike. Ev çi hal e. Kî bîra tiştekî wanî dikir. Ev çi şeytanî ye ku wê jinikê kiriye. Hey medet, ma emê îjar çi xwelî li serê xwe bikin!

Mîralî keniya. Semîre fam nekir, wate li kenê Mîralî negirt. Çi ye, qey ez ji te re henekan dikim, got. Mîralî,

– Belê, ev tiştên tu dibêjî hew dikarin bibin henek. Ne sedemê kuştinê.

Gotinên Mîralî, her car, ji bo wê dibûn hêz. Semîre piştî van gotinan nexwest çîrokê bi wî awayî bihêle:

– Wanî. Diya min meseleyê ji bavê min re dibêje. Bavê min mîna ji asîmanê heftan de bê, bilind dibe û li erdê dikeve. Radihêje demançeyê. Diya min, bi hawar, baz da cem min. Ez ji mal deranîm. Piştî bavê min ez nedîtim xwe li riya mala jinikê girtiye. Laçika jinikê mîna nîşana heyfa xwe digire û dizîvîre.

Ez çend rojan neçûm mal. Diya min têlefonî birayê min kir. Birayê min kiribû nekiribû nikaribû bavê min qanih bikira. Mîna neçar bimîne ez girtim û anîm vir. Çend rojan li mala wî du rojan jî li mala hevalekî wî mam.

Diya min di têlefonê de got, her kes ji meseleyê haydar bûye. Bavê te bi sê telaqan sond xwariye ê te bikuje. Xew bi çavên birayê min nakeve. Wekî çare ev rê dît. Ji bilî wî û jina wî hay kesî ji min nîn e. Ji hevalên xwe re jî gotiye, min Semîre bir Batmanê, mala nasekî. A ev. Îjar tu dixwazî bikene dixwazî bifikire. Aniha li benda însanekî me. Însanekî ku min di xewên şevan de jî nedîtiye. Gelo ê ker be, lal be, hîledarî be, rind be, xirab be... Ez nizanim Mîralî. Hew rastiyek heye ew jî ev e ku ew çi be jî ezê bibim jina wî!

Gotina dawî mîna li zora Mîralî çû be, reng li wî sor bû. Bi dengekî hinekî bi hêrs got:

– Tu ne jina kesî yî!

Semîre bêdeng ma. Mîralî rabû ser piyan. Dest li kevirên şikeftê da. Dû re,

– Ger min neqş li bedena te çêkira dê min ê li hinarikên rûyê te çêkira, got. Semîre bi bask bû. Pirsî:

– Bi tevî vî halê min, tu dixwazî neqşekê li bedena min çêkî?

Mîralî bêdeng ma. Li çavên Semîre nihêrî. Ji dil dihat wê ramûse. "Ev çi ye, ramûsan ji ku derket," got. Ray li xwesteka dil nedikir. Ji bo ramûsanê dixwest xwe qanih bike, "Ger ez wê ramûsim belkî ev bibe destpêkek, naxwazim êdî tesadifan bijîm. Ezê wê ramûsim; ma şert e ez li benda demê bimînim, na. Ger însan derewan neke di kêliyên pêş de gelek rastî xwe didin der. Kêliyên pêşî û hîsên însan muhîm in. Ma ez ê keçikeke wanî li ku bibînim. Dengê dilê min jî bang li min dike."

Carekê du caran dîsa bi heweskarî li Semîre nihêrî. Bêyî bifikire Semîre ji lêvan ve ramûsa. Semîreya ku heya wê çaxê hew destê wê bi destê xortekî ketibû bi bêhnçikîyayî axivî:

– Ger tu bixwazî neqşekê li dilê min bike. Min neavêje ber bextê kesî! Ez nizanim tu kî yî, te ji bo çi ez ramûsam... tu û bextê xwe...

– Hêvîdar im ev hal nebe siyek û li ser dilê min nemîne. Belkî bi te ecêb hat, lê wextê tu razayî bû wê çaxê dilê min lê da, ji min wetir bi dehan sal in ez te dinasim!

Semîre kêfxweş bû. Mîralî bi destên wê girtin. Derketin derve. Berêvar bû. Mîralî ew cardin anî hundur. Semîre, tuyê min bibî kuderê? pirsî.

– Ez ê te bibim gund. Di lojmanê de bimîne. Heya ku ez ê têkilî bi birayê te re deynim.

– Mîralî, li xwe megire lê ez ê bipirsim, bextê te heye?

– Bihêle, her tiştî di halê xwe de bihêle. Li dû van gotinan Mîralî dest avêt fistanê Semîre. Semîre tirsiya. Mîralî ji wê re got, "netirse, ez ê hew bersivekê bidim te". Semîre qarişî wî nebû. Mîralî bi awayê Semîre pêşî fistanê wê hilkir, derpê wê hinekî qat kir, li deq û neqşan nihêrî. Ramûsanekê li neqşê da. Li tîpan nihêrî lê her ku bi nîyeta tîpan hatibin lê kirin jî nedihat xwendin. Dişibiyan tiştên din ên sayakî.

Bi ramûsanê re lerzek xwe li bedena Semîre da der. Beden li wê germ bûbû. Dilê wê lê dida. Mîralî dîsa fîstan bi ser bedena wê de berda. Semîre nehişt ew derpê bi cî bike. Bi xwe derpê li ser bedena xwe bi cî kir.

Tariyê xwe dabû erdê. Meşiyan. Mîralî li tîrêjên bajêr nihêrî, tîrêjên bajêr jî atmosferek çîrçîrokî bi bîr dixist. Gelo, aniha însan di malên xwe de çi sohbetê dikin, got di dilê xwe de Mîralî. Bersivek kurt û sayakî da xwe, hîç, jiyaneke dubareyî, gotinên ji rêzê û rojane. Jixwe însanên bajêr zêde nedipeyîvîn. Nihêrîn, guhdarkirin û xeyalkirin xuya wan e.

Li şikeftê, heyecan, tirs, kêfxweşî, meraq, şik bûbûn sedem da rengekî ecêb ê belek xwe li rû Semîre bide der. Ew reng ew qas nemabû li rû wê.

Di bin ronahiya tava heyvê de dimeşiyan. Ne kevirên li ber lingên wan diketin ne jî pûş hîs dikirin. Ling li wan sivik bûn. Dilê Semîre şa bû. Her cara xem dixwarin jî xemên xwe sar dikirin. Li ku bû ê ji kêfxweşîyê dilê Semîre bifiriya.

Bi tevî hinekî xem hebû di dilê wê de, dîsa jî dilê wê, heyva çardehşevî bi tevî bayê hênik bi aheng bû.

Carna jî xwe ecêb hîs dikir. Tiştên di hiş û dilê wê de mabûn ji nişka ve û bê wext di bîra wê dihatin. Gêre, kelmêş, sîperik, qurqurik û çi heşereyên dîtibûn bi bîr anî. Ji dil dihat ku deng li wan bike. Bêje wan: "Hûn ne bêqîmet in"!

Wexta şeş salî bû rojek ji rojên biharê bavê Semîre û civata xwe li ber dîwêr rûniştibûn, sohbet kiribûn. Bavê wê, "em însan çi ne", gotibû, kelmêş rê dabû û dirêjahî dabû axaftina xwe. Ferqa me û kelmêşê nîn e. Ew gotin mabû di hişê Semîreyê de. Piştî gotina bavê xwe her û her bi heşereyan lîstibû. Bi wan hewiniya xwe anî bû.

Li tava heyvê nihêrî. Di dilê xwe de, "ez aniha dişibim heyvê, dil li min spî ye" got.

Di nav rezan de, bi dengekî nizm, bi sohbet dimeşiyan. Ne Semîre bawer dikir ne jî Mîralî. Semîre bi destê wî girt. Her pirs ji wî dikir. Mîralî dibersivand. Di ber re jî Mîralî şîret li wê dikir". Wextê em bikevin nav gund, ku kes pirsa te bikin, ez ê bêjim dergîstiya min e. "Semîre rawestiya, gelo dibe ku li darê dinyayê ez ê tu car gotineke sar ji bo te bikim... Gelo dibe ez yeka te bikim dudu... Gelo dibe ku ez dilê xwe, bi carekê be jî, li te sar bikim... Mîralî, xweşmêr, ka raweste, ez bigirîm da janên di dilê min de biherikin...

– Semîre, ne min got, girîyê zêde dibe êş. Bila ev rasthatin jî rasthatinek xweşik be. Rast e, tiştê evînan bi me şîrîn dike û temen dide evînan çîrokên wan in. Êdî negirî.

– Soz be... dê tu car li cem te negirîm.

Gihîştin vesanekê. Xeyalên Mîralî ên di derbarê jina cerdevan de bi bîra wî hat. Ken bi wî ket. Mîralî Semîreyê jî bi halê xeyalî fikirî, li gorî xeyalên xwe Semîre anî ber çavên xwe; li ser Semîre cilên spor, por lê bi şikil, lêvên wê, ser û çavên wê bi halê miqateyî... Bi halê xweşxeyalî ramûsanekê li hinarikên rûyê Semîre da û meşiyan.

Di wan saetan de zor bû ku kes di nav gund de hebûya. Heya lojmanê çûn. Cerdevan û leşker jî ne li wir bûn. Carna mixtêr ew dibirin mala xwe û çay dida wan. Wê şevê jî çûbûn mala mixtêr.

Li hundur, Mîralî Semîre da rûniştin. Çû ber sakoyê ku li dîwêr hilawêstî. Kaxiz ji bêrîka sako derxist. Bêyî li wan binihêre çirand. Semîre li moriyan nihêrî. Rabû ku melkesê bîne û vemale. Mîralî nehişt. Behsa xwe û moriyan kir.

Semîre xema xwe a di derbarê birayê xwe de der bir. Mîralî, xem nexwe, ez ê sibeh biçim, her tiştî ji wî re bêjim. Hevalê min Osman jî ê alîkariya min bike. Ez Şukrî nas nakim lê Osman teqez wî dinase.

– Mîralî, aniha bira bira em ê bizewicin?

– Na, em ê malokê bilîzin!

Semîre bi henekî bi porê wî girt û hinekî vekişand. Şikir kir:

– Şikir Mîralî, şikir ji Xwedê re ku riya te bi derê şikeftê xist.

– Heskîf... Semîre Heskîf bû sebeb ku riya min bi wir bikeve. Min dizanî ê Heskîf deriyekê li ber min bixe.

– Ê biryar a te be, her ku tu bixwazî bimînî ez ê jî li Heskîfê bimînim. Heskîfa ku te xist para min ê li ber dilê min jî gelek şîrîn be.

Herdu mîna ji barekî giran bibin dil li wan rihet bû. Bedenên wan mest bûbû. Xewa wan dihat. Serî dan xewê.

24

Sibehê, taştê amade dikirin. Mîralî dît Semîre bê biryar e bê çi amade bike. Biken, Semîre serê du hêkan li hev de, bes e, got. Semîre bi a wî kir, du hêk qelandin. Piştî taştê Mîralî çû polê.

Mamosteyê din, pir dilşad bû ku Mîralî hatiye. Gazin ji wî nekir:

– Tu xort î, te baş kir ku tu çûyî, li gorî dilê xwe gerîya yî, xem ji bo zarokan nexwe, ez wan mexdûr nakim. Dû re, çerçawa be ez zewicîme, bi qeyd û bend im, got.

– Spasiya te dikim. Dergistiyâ min hat cem min. Heya wextekê jî ez ê nekevim dersê.

– Ya! Çi baş. Te hîç behs nekiribû.

– Belê. Wa ye li lojmanê.

– Ev ji bo me jî mizgîn e, ê jina min bê heval nemîne.

Mîralî merhebayî li şagirtan da. Li lojmanê carek din şîret li Semîre kir:

– Ne hewce ye tu behsa halê xwe û hevnasîna me bikî. Kî ji te pirsî, bêje ji zûde ye em dildarên hev in. Ez hatime wextekê li cem dergistiyâ xwe bimînim, dû re em ê li heskîfê daweta xwe bikin.

– Wey li ser çavên min delalo!

– Semîre, tu ji henekan hez dikî?

– Çawa, keçikek kurd û ji henekan hez neke, ma dibe!..

– Baş e.

– Lê tu?

– Ez ji henekan hez dikim lê ew feraset bi min re tune ye.

– Tu henekên xwe bi qederan dikî. Ma ev hindik e!

Sê hefteyan şev û roj sohbet kirin. Mîralî xweşhal bû ku li şikeftê pêrgî Semîre hatiye. Baş bû ku wê çaxê min ew ramûsa. Xuyak ye ê ev tesadif a dawî be.

Rojekê li Heskîfê, Mîralî çû dibistana ku Osman li wir kar dikir. Heya saet sisiyan ma li benda Osman. Mamosteyên din dizanibûn çi dostaniya Mîralî û Osman heye lewre ew bi wan re nemeşiyan. Di rê de, Osman henek bi wî kirin:

– Bêje Mîralî, ji zûde ye tu ji gund nayê, gerçî ez jî çend hefte ne dawiya hefteyê diçim mala bavê xwe. Gelo tu tesadif bi serê te de hat?

– Mîna tu ji dostaniya me ne kêfxweş bî diaxivî!

– Kuro ez kêfxweş im lê tiştên bi serê te de tên êdî min dixin nav fikaran.

– Ê êdî wanî nebe, Heskîf ne tê de, bi bawer im ê ji vir bi şûn de ez ê bi dilekî rihet serê xwe bidim ser balîfê.

– Mîralî, nebêje min tiştekî din qewimî?

– Ez nebêjim jî qewimî!

– Îja?

Mîralî a ku bi serê wî de hatibû yek bi yek ji Osman re got. Osman nedixwest ji qewimînek wiha bawer bike. Ji hêlek ve jî kêfxweş bû. Mîralî alîkarî jê xwest:

– Tu Şukrî dinasî ne?

– Belê. Kesekî henûn e.

– Aniha pirsgirêk ew e.

– Ma ji bo çi pirsgirêk hebe, gerek ew destên te ramûse.

– Na kekê, wanî nebêje, ew êdî bûrayê min e.

Osman keniya. Li dû kenê got:

– Karê hin kurdan ne belî ye, te hey dît astengiyek wanî derxist ku neyê bîra însan. Ka em biçin cem wî.

Çûn. Şukrî dîtin. Osman, Mîralî bi wî da nasîn. Ji Şukrî re got, destûr bixwaze. Şukrî bi şik li Osman nihêrî. Bêyî tiştekî bipirse destûr ji berpirsiyarên xwe girt. Hersê ketin riya rezan. Şukrî bi halê ham û taman xwe ranegirt:

– Osman, em diçin ku, mesele çi ye?

– Em ê hinekî biaxivin.

– Binihêre, ger mesele sîyaset be ne hewce ye. Ez hay jê heme ku tu bi sîyasetê re eleqedar î. Ez bi dilsozî dibêjim, ez di halê xwe de me, karê min ji tu karî tune!

– Ne sîyaset e, xem nexwe, ez jî baş bi te dizanim!

– Na, ger kesan derbarê min de derew merew kiribin bêje, got Şukrî. Di wê kêliyê de reng li wî spîçolkî bû.

– Malikava ka sebir bike, ne min got mesele ne sîyaset e. Ev tu çi hesas î heyra.

Şukrî li Mîralî nihêrî. Mîralî bi devkenî bi hawara wî de çû. Şukrî hinekî bi xwe ve hat. Li ber rezan rûniştin. Osman bêyî wî di mereqê de bihêle meseleyê got:

– Şukrî, ez Mîralî baş dinasim. Ger xwişkek min hebûya min ê teklîfî li Mîralî bikira da ku bi xwişka min re bizewice.

– Fam nakim hûn çi dibêjin?

– Semîre, xwişka we aniha li cem Mîralî ye.

Şukrî di cî de spîsar bû. Reng li wî sor û mor bû. Bi zor deng bi wî diket:

– Çawa, xwişka min…

Mîralî hel û meselê ji Şukrî re got. Lê behsa deq û neqşan nekir. Ji Osman re jî hin tişt negotibûn.

Şukrî bi xeyd got:

– Ev çi wêrekî ye hûn dikin Mîralî, çawa hûn radihêjin

namûsa însanan û dibin mala xwe? Ev çend hefte ne ne şev bi min şev e ne jî roj bi min rojek; ez û zaroyên xwe bi xem bûn. Me her şev ji bo Semîre şîn dikir, me digot, bê hela çi hat serê wê, ma ev heq e?

Osman henek da ber:

– Mîralî, Şukrî ji şadbûnê wanî dike.

Şukrî hê bi a xwe bû:

– Na, ez ji dil dibêjim, ma ev hal e.

Bêhn li Osman teng bû. Osman nehişt Mîralî bersiv bide:

– Şukrî, maqûl be, tu çawa însan î lawo, ka kêliyekê bifikire, ji sîyasetê dûr bisekine tişt pê nayê lê karibe di derheqa tiştekî wanî sosret de jî bavê xwe qanih bike, baş e!

Şukrî bi keser, bi halê hişekî tevlîhev axivî:

– Na, min soz daye hevalekî xwe. Ê lawê xalê wî were, ji ber vê yekê ye!

– Tu şerm nakî kuro, xwişka te ew hîç nedîye.

– Xwişka min tişt nabêje.

– Ma çi bêje, li hember ew qas bêbextiyan. (Ha ez nizanim mesele çiye jî, bi qasî Mîralî got bêbextî li wê hatiye kirin). Di nav destê we de dîl maye.

Şukrî bi hestiyar bû. Fedî dikir. Bêdeng ma. Bi dubareyî got:

– Ez ji wî hevalî hez dikim. Min soz daye wî. Wê çaxê bihêlin bila lawê xalê wî were, wê çaxê bila Semîre bêje, ji min re nabe.

– Ya sebir! Şukrî, xwişka te ne xema te ye, soza ku te daye wî kesî bi te xem e. Rabe, em diçin!

Şukrî tiştek negot. Meşiyan. Li çarşiyê Osman qehweyekê nîşanê Şukrî da û got:

– De biçe bangî hevalê xwe bike.

Şukrî bi xem dimeşiya. Di dilê xwe de ji Osman diqehirî. Wêrekî di xwe de nedidît ku dijberiya wî bike. Dixwest xwe

qanih bike. Xwe bi xwe, “Osman rast dibêje, ê Semîre bi dilrihetî serî deyne ser balîfê. Dilxweşî mafê wê ye jî.” digot.

Xem jî dixwar, xem dixwar ku ê ew kes meseleya deq û neqşan ji her kesî re bêje, wê çaxê, hem Mîralî dev ji Semîre berde hem jî ew di şermê de bimîne.

Li dû xemên wanî jî, a baş ew e ku Semîre biçe, bi wî kesê tirk re bizewice, ê hay kesî jî jê çênebe, digot.

Hevalê xwe anîbû çayxaneyê. Osman piştî merhebayê ji hevalê Şukrî re, Şukrî sozek ji bo xwişka xwe daye we, tiştekî wanî ne mimkûn e. Zilam li Şukrî nihêrî. Şukrî bêdeng ma. Zilam bi Osman re ket gengeşiyê:

– Belê, lê çi eleqeya we heye? Ê lawê xalê min sibeh dusibe were vir.

– Eleqeya min heye. Ji lawê xalê xwe re bêje bila neyê vir!

– Tênagihîjim?

– Çêtir e. Ne hewce ye hûn her tiştî têbigihîjin!

– Mîrza, hûn mîna bi hêrs bin. Ji kerema xwe re meseleyê bêjin, ne muhîm e.

Osman bi hincet diaxivî. Bê hay, hêrsê xwe li wî dabû der. Mîralî hay ji halê wî hebû lê midexele nedikir. Osman ji pirsên wî zêdetir dixwest tiştên di hişê xwe de bêje:

– Mîrza, xwişkên we hene?

Zilam bi minminî got:

– Belê.

– De baş e, bila bimîne li benda lawê xalê min. Ez ê sibeh lawê xalê xwe ji bo wê bişînim.

– Çawa, tiştekî wanî dibe?

– Nabe ne, lê ji bo xwişka Şukrî dibe ne?

– Hay min jê tunebû, Şukrî got û min xwest alîkarî bikim.

– Mala alîkariyên wanî xirab be!

Dengê Osman ê bi hêrs xem xist dilê zilam. Zilam bi ken pirsî:

– Min hê jî mesele fam nekiriye lê bila mîna we be.

Mîralî dît ku ê Osman hê gelek bi hêrs bikeve tevlî sohbetê bû:

– Ez û Semîre ji hev hez dikin. Mesele ev e.

Zilam xwest serî li her tiştî bigire:

– Hûn ji bo çi nabêjin. Ez pir kêfxweş bûm. Mîralî, li qisûrê nenihêrin, her ku ez we baş nasnakim jî dawiya dawî hûn mamoste ne. Helbet hezkirina te ji bo min jî muhîm e.

Piştî van gotinan zilam bi destûr rabû. Li rabûnê rojnameya bi navê "Cûmhûrîyet" a bi tirkî di bin çengê xwe de mîna bi cî bike bir û anî.

Ew rojname wan çaxan jî hê wekî nîşana demokratiyê be dihat zanîn. Lê Osman xwe li wî halê zilam nekir xwedî.

Şukrî dît ku zilam bi dilkulî rabû, wî jî xwest destûrê bixwaze. Osman, tu ranebe hê karê me heye, got. Şukrî ranebû. Bêminetiya Osman a li hember wî zilamî li xweşiya Şukrî jî çûbû. Bi heweskarî guhdariya Osman kir. Osman bi gazin û şîret ji Şukrî re got:

– Ka ew qas bi hesêb li hember wî tevnegere. Tu çi qas wanî bikî ê ew qas bi ser te de were. Têkiliyên wanî şaş in. Ew qas ne bi xem bin. Hevaltî tiştekî xweş e lê ne bi wî awayî. Dilê me ê gundîtî her carî bela serê me ye. Ne hewce ye hûn bi sîyasetê re eleqedar bin. Binihêre, Mîralî tu eleqeya xwe bi sîyasetê re tuneye lê ez ji wî hez dikim. Ji kerema xwe re hinekî ji xwe hez bikin. Hinekî bi xwe bawer bin. Hinekî xwe li têkiliyên dirust bigirin bes e.

Şukrî tu tişt negot. Her sê bêdeng bûn. Çay vexwarin. Şukrî xwe ranegirt:

– Lê li Heskîfê her kes êdî Mîralî wekî kesekî sîyasî bi nav dike. Heta galegalên din jî hene di derbarê wî de. Dibêjin serbazan gef li wî xwariye.

Osman keniya. Henek li Şukrî girt:

– Ez kêfxweş bûm. Hûn ji niha de ji bo zavayê xwe xeman dixwin!

Her sê keniyan. Şukrî bi kenê re bi kelecan bû. Ji dil dihat ku bigirî. Bêdeng ma. Mîralî axivî:

– Hezkirina ji Heskîfê, xwedîderketina li Heskîfê ne tiştekî sîyasî ye lê belê însanî û wijdanî ye. Ez bizanibim ê sed guleyî jî di kezeba min de bi cî bikin ez ê her ji Heskîfê hez bikim.

Şukrî ji gotinên Mîralî ên bi kerb zîvêr nebû lê li xweşiya wî jî neçû. Osman rê neda da sohbet berdewam be:

– Şukrî, ka rê bide ber me, ez bawer im em ê nikaribin biçin ji bavê te bixwazin.

– Na, eman!

– De tu bêje, tuyê çi rê bidî ber Semîre û Mîralî.

– Ez jî nizanim.

– Mîralî, tu bêje, fikrên te çi ne?

– Em ê mehra xwe a fermî bibirin û piştî wê dawet bikin.

– Baş e.

Şukrî ew fikir xweş pêşwazî nekir:

– Dawet ne hewce ye, bavê min hê jî xem e di dilê min de.

Osman da ber dilê wî:

– Tişt pê nayê.

Mîralî jî xwest bide ber dilê Şukrî:

– Em ê li kelehê dawet lidar bixin.

Osman, kekê mino, çi fikrek xweşik, got.

Bi wî awayî biryar girtin.

25

Şukrî çûbû. Osman pirs ji Mîralî kirin:

– Mîralî, ev zewac e, ne henek e, tu baş fikirî?

– Belê.

– Di rojekê de biryarek wanî, binihêre bi tenê tu ji ber bandora hest biryar bidî ê ne baş be ha!

– Semîre ji min re got, bila gunehê te bi însanan neyê hew li hember wan dirust be bes e.

– Ez çi kêfxweş bûm, baş e, bûka me ne keseke ji rêzê ye.

– Xem nexwe Osman, tu zanî carna hin tiştên diqewimin bes in da însan bikemile, jiyanê têbigihîje.

– Bi hêvî me hûn ê kêfxweş bin. Baş e, ez ê êdî xwarin çê nekim, ev e êdî bûka me heye.

– Savara reşkotî ne tê de.

– Tişt pê nayê bila savar dîsa bimîne aîdî min. De rabe biçe gund.

– Tiştek pê nayê, jina mamosteyê din li wir e.

– Nabe. Ew niha gelek xeman dixwe. Ka em bi texsiyekê wê bînin vir, çêtir e, ê gundî bikevin nav lêpirsîn û galegalan.

– Baş dibe.

Bi texsiya dikandarê sûryanî, Semîre ji gund anîn mala Osman. Semîre êdî ji her tiştî bawer bû.

Li mal Osman xwest dil li wê rihet be. Henek li wî û Mîralî digirtin. Piştî xwarina êvarê ketin nav sohbetê. Behsa daweta wan dikirin. Osman ji Semîre re got:

– Bê tirs û bê xem, çi di dilê te de heye bêje bila Mîralî bike.

Semîre keniya. Halekî cidî xwe li wê da der, na ez naxwazim, em ê bikevin tengasiyê.

Ew gotin li xweşiya Mîralî û Osman çû.

Her sê rabûn ji bo gerê bi rê ketin. Heya keviyê Dîcle çûn. Bê xem, bi dilxweşî li derdorê dinihêrî Semîre. Osman bi dilxweşî got:

– Li kelehê, dawet li dar xistin, ê çi tiştekî xweşik be.

Semîre û Mîralî bi hezkirin û xwezî li hev dinihêrî. Bi rê de pîlanên xwe kirin. Ê roja mayîn Mîralî û Semîre biçûna Batmanê ji bo cil û kincên bûkanî bikirin. Ji bo Mîralî jî pêdivî bi bedil hebû. Osman navê mixazeyan da wan û got ew ê karibin bi texsîd bikirin. Osman bi alikariya Şukrî ê bi awayê devkî kesan vexwenda dawetê. Dîroka daweta li kelehê ji her kesî re bigotana. Mîralî ji Osman re got, wekî mûma dawetê şekirê nav kaxizan bidin kesan.

– Ê xweş be. Mîna nostaljiyekê û tiştekî otantîk ê baş be, got Osman.

Osman û Şukrî bi nav xelkê ketin û mûm –vexwendname dan wan. Mîralî û Semîre heya êvarî man li Batmanê. Mîralî ew bir, bi awayê bûk û zava wêneyê xwe û wê jî da kişandin. Êş dida Mîralî ku hay dê û bavê wî jê çênedibû lê ji dil nedihat hay bavê xwe jê çê bike. Bi bawer bû wê diya wî ew efû bikira. Ev jî besî dilê xwe didît.

Êvarî Şukrî û jina xwe jî hatin mala Osman. Jina Şukrî xwest Mîralî û Semîre biçin mala wan. Şukrî nehişt. Jina Şukrî her carî kêfxweşiya xwe der kir da Semîre bi Mîralî re dizewice.

Semîre, bi serbilindî tevdigeriya. Jinbira wê, beriya dawetê,

ezê te tevgirê bidim, bejn û bala te xweş bikim. Ê çi dawetek xweş be. Heskîfî ji Mîralî hez dikin, got. Ev gotin li xweşiya Semîre çûn, kenekî sivik, rengşîrîn xwe li rûyê wê da der.

Derengî şevê Şukrî û jina xwe çûn. Mîralî xwest bi tevî Semîre biçe gund. Çûn texsiya nasekî Osman anîn. Osman jî bi wan re çû. Ew birin gund û vegeriya.

26

Li mal, Mîralî piştî cil û kincên bûkanî li Semîre kir ew ramûsa. Cil û kinc ji wê kirin. Cil û kincên spor kirîbûn. Li Semîre kir. Semire wekî ji bin barekî derketibe xwe sivik hîs kir. Lê halê wê bi wê ecêb dihat! Mîralî ew hembêz kir. Semîre bi heyecan bû. Ew sawa sivik ku xwe ji metirsiyan dabû der jî li ser Semîre nemabû. Fikrekî hat hişê Mîralî. Bi destê wê girt û derket. Nihêrî, ne cerdevan hebûn ne jî tu kes. Ew keçika piçûk, Siltan li ber şibakeyê bû, perdeya rengîn a şibakeyê geh dida alî geh jî digirt.

Mîralî, Semîre bir şikefta bi tirb. Semîre metelmayî ma. Mîralî got:

– Tu li şikefta din mîna keseke dîl bû. Niha li vir tu azad î. De xwe ji her tiştî bike. Carna divê însan dil û hişê xwe bişo. Ji bo şûştinê an îradeyek xurt divê an jî mekanekî wanî.

Semîre fam nekir. Dîsa jî hewl da her tiştî ji bîr ve bike. Mîralî li ser tirbê rûnişt. Bi xwe jî hewl dida dil û rihê xwe, hişê xwe bişo.

Semîre bi ser wî de xar bû. Ew xala li xamzeyê ramûsa. Mîralî pir xweşhal bû. Li Semîre zivirî.

Qendîl bi xwe re biribû. Li ber şemala qendîlê çavên wê ramûsa. Dilê Semîre bi kulpe kulp bû. Mîralî peyv digotin û dixwest çi bi bîra Semîre tîne da Semîre ji wî re bêje:

– Kevir.

– Dilê hin însanan.

– Şikeft.

– Mîna me jinan e, aramî dide ew jî bê ziman in.

– Av.

– Dilê keçan e, her diherike.

– Heskîf.

Semîre nizanibû çi bibêje. Bêdeng ma… Ew dişibe halê min ê beriya çendekê, got. Îja wê peyv digot, Mîralî tiştên xwe didan der digot:

– Deq!

Mîralî hinekî fikirî. Ew hal li xweşiya Semîre çû ku ne di bîra Mîralî de ye. Mîralî got:

– Ger ne li dil be ne muhîm e,li dil be jî, ger dil ne teng be, dîsa ne xem e.

– "Semîre."

– Çivîkek birîndar, li ser sînga min daniye.

– Bav!

– Ferman.

– Dê.

– Şikeftên li van deveran nebûne cihê eşq û hunerê.

– Eşq.

– Ger nebe sî û nemîne, her tîrêj be xweş e.

– Sî.

– Li gorî demsalan diguhere.

Bêdeng man. Mîralî, behsa şeva li wir razabû ji wê re kir. Semîre bi destê wî girt. Her ku hewa gelek hênik bû jî Mîralî fanêre ji xwe kir. Semîre li wî dinihêrî. Mîralî xwe li pevşabûnê girt. Semîre hew carna lêvên wî radimûsa lê nizanibû bi awayê ku Mîralî bi wê re pevşad dibû xwe li wî xweş bikira. Li ber tirbê, mîna jin û mêr bûn êdî.

Semîre di kêliya ku bibe jina Mîralî de pêjgîrek xistibû bin xwe. Cil û kinc li xwe kirin, Semîre ew pêjgîr xist bêrîka xwe. Ê roja li dû dawetê rê jinbira xwe bida, bi wî awayî ê jinbira

wê bibûya şahid ku heya şeva pêşî Semîre keç bû ye, bi kesî re raneza ye!

Ji şikeftê derketin. Di nav kevir û daran de meşiyan. Bi rê de Mîralî pirsa tezbihê ji wê kir:

– Semîre, li şikeftê li cem te tizbiyek hebû. Tezbiha kal û pîran, ew ji bo çi bû?

Semîre bê wate li derdor nihêrî. Xwe bi xwe, xwezî Mîralî aniha ew pirs ji min nekira, got. Li Mîralî nihêrî. Bi dengekî bi şewat bersiva wî da:

– Mîralî, ew tizbi ya bavê min e. Wextekê min ji halê bavê xwe ê ku tizbi di dest de gelek hez dikir. Ew li odeyê rûdinişt, tizbi di dest de, her gotinên xweş ji bo me digot û henek bi me dikir. Ew tizbi her ew halê wî bi bîra min tîne. Lê min nizanibû ew tizbi û ew hal ê rojekê cî bidin halek din. Ew halê ku bavê min ji ber hêrsê ne dikaribû Xwedê bi bîr bianiya ne jî dikaribû henek bikira! Êdî wî di dewsa tizbiyê de sebra xwe bi çek dianî! Êdî dizanim tizbi dikare her wext cî bide sîlehê.

– Ez nizanim ev çi hal e?

– Çi Mîralî?

– Qey însan pir bi tiştekî ve girêdayî be dikare zû dev jê berde!

– Min fam nekir.

– Ew însanên roj bîst û çar saet Xwedê bi bîr tînin çawa dikarin ew qas bi rihetî rahêjin sîlehê. Tiştekî ne normal e.

Semîre tu tişt negot. Bi bedena xwe re mijûl bû dîsa. Nedixwest bavê xwe bi bîr bîne, ne tizbiyê û ne jî wan xemên Mîralî. Dengê pelan bi alîkariya wê de hatibû.

Li lojmanê, Mîralî vezeliya bû. Xwe li xeyalan girtibû. Semîre li ber destşokê li neynikeke piçûk dinihêrî. Her li bedena xwe dinihêrî. Li cihên Mîralî maçî kiribû dinihêrî. Di wê kêliyê de pê hesiya ku cara pêşî ye bê ew çiqas ji bedena xwe hez dike. Li neqşên li bin navikê nihêrî. Xweziya xwe dianî, belkî, digot, belkî piştî maçên Mîralî ew neqş winda bûne. Lê neqş li wir bûn. Êdî ji bo neqşan xem nedixwar.

Gotinên mamosteya xwe a dibistana seretayî bi bîr anî. “Semîre,” gotibû mamosteya wê,” tu keçikeke hezkirinê yî, xwîna te şîrîn e, êê, bes jî bedew î tu, ma çi, ma hêviyek em bikin ku di salên azevtiyê de tu pêrgî yekî wanî bê da layîqî te be.”

Semîre piştî van gotinan bi bîr anî hinek diltenik bû. “Xwezî, xwezî ez rojekê pêrgî mamosteya xwe bihatama û min ji wê re bigota, belê Mîralî layîqî min e, ez dixwazim bibim xwîna laşê wî.”

Semîre ji ber neynikê hat. Li cem Mîralî rûnişt. Dest xist nav porê wî. Mîralî pirsa jiyana wê a li şikeftê kir:

– Semîre, ma tu neditirsiyayî?

– Ez, ez ditirsiyam, lê ne ji bo xwe, ji bavê xwe, ji bo dê û birayê xwe ditirsiyam; min digot ger bavê min tiştekî bîne serê min ê heyat li wan bibe jehr û zindan. Şev nedibuhurî, dibû mîna lekeya rûn a li fîstanê spî. Li ber deriyê şikeftê rûdiniştim. Min li stêrkan dinihêrî. Cara pêşî bû min bi çavên serê xwe didît stêrk û asîman ew qas nêzî însan in. Gelek nêz bûn lê yek ji wan danediket, bi min re nediket nav sohbetê. Min çiqas dixwest Mîralî, min çiqas dixwest dengek bi ser min biketa û hinek av bi ser arê dilê min de bikira. Hundurê şikeftê ne reş bû ne jî spî. Wexta min guh dida dilê xwe ê piçûk mîna ez li ber ronahiyê bim. Dilê min ê piçûk her carî hêvî bi bîra min dixist. Ez her bi hêvî bûm, min hêviya xwe ji Xwedê û dilê xwe ê piçûk nekir. Carna jî dilê min ê mezin zevt li min dikir. Ez bêhal dimam. Bêhêvî dimam.

Çend caran ez fikirîm xwe di zinar wer bikim. Rawestiya. Bi fikar bû; gelo serboriya xwe û çivîkê bigota an na. Xem dan aliyekî û pê de çû. Her şev çivîkek dihat şikeftê. Wekî ku bixwaze tiştekî ji min re bêje dikir çîveçîv. Min got, ta ev çivîk were û bike çîveçîv ez ê xwe nekujim. Çi wext çivîk neyê ez ê wê çaxê mirinê bifikirim. Wexta tu hatibû û ez di xewê de bûm min xewn dît ku ez jî bûme çivîkek li ser Heskîfê difirim.

– Însan tiştên bi serê te de hatine bêje ê li dinyayê kes bawer neke.

– Te ji min bawer kir, ev besî min e. Yek baweriyê bi însên bîne bes e însan êşê nekişîne.

Mîralî destê xwe dirêj kir. Semîre bi destê wî girt. Li ber serê wî rûnişt. Mîralî serê tiliyên wê yek bi yek maçî kir. Semîre hîs dikir ku ew êdî di nav dinyayek din de ye. Xeyalên wê guherî bûn.

Xwe ne wekî jineke bê xeyal, bêhêvî û li benda emra mêran, mîna însanek ku hurmet lê tê girtin hîs dikir; bavê wê heya heftsaliya wê hezkirina xwe rê dabû, her carî bi lêv kiribû. Gotina ku wan çaxan ji bo Semîre her digot, sorsorîka min, bû. Carna jî ji bo Semîre, şitla tihokê, digot. Piştî heftsaliyê êdî mîna Semîre bûbe keçikeke gihîştî, bavê wê li hember wê bi awayê fermî tevgeriya bû. Gotinên hişk, ên bi şîret, rola jintiyê, daxwaza edeb û terbîyeyê…

Semîre destê xwe da ber rûyê xwe. Li Mîralî dinihêrî. Ji dil dihat her nihêrîn Mîralî bêtir bi wê şîrîn bike. Bi destê Mîralî girt. Yek bi yek tiliyên wî bi maçîkirinên şil maçî kir. “Mîralî, heya niha ez ditirsiyam xewnan bibînim, her ku min xewn didît jan didan min. Bi roj jî min ew xewn ji bîr ve nedikir. Min mehneya wan an ji diya xwe pirs dikir an jî ji hevaleke xwe. Ez êdî dixwazim her şev xewnan bibînim. Ez dizanim ê xewnên min dilê min şad bike.” got.

Mîralî li biskek porê wê yê bi ser çavê wê de daketibû nihêrî, ew bisk da aliyekê, bi rehm û hesret hinarikên rûyê wê mis da. Tu çi bedew î keçê, got.

– Mîralî, li gund cîraneke me, her carî ji bo min digot, tu dara li devê rê yî, guliyên te bi bar in, ê her kes kevirê xwe biavêje te.

– Helbet jinikê nizanibû yê ku cara dawî kevir biavêje ê ez bim.

Halê Mîralî, gotinên Mîralî, rehma Mîralî bi wê xweş dihat. Cara pêşî bû Semîre, Mîralî bi van gotinan, bi dengekî jidil û bi heyecan, ji bo bedena xwe vedixwend:

– Kerem bike Mîralîyêm, ramûse bi helalî, ramûse, dev û lêvên yara xwe.

27

Di gund de jinan Semîre mereq dikir. Çend jê jî hatibûn serdana wê. Piştî ji lojmanê derdiketin Semîre ew bi hurmet bi rê dikirin. Li hewşê li gund dinihêrî piştî mêvanên xwe bi rê dikir. Xaniyên kevirî bi Semîre ne biyan bûn. Ew gund û gundê wan dişibiyan hev. Ji bilî çend ferqan. Yek jê li gundê Semîre rez tunebûn. Erda wî gundî bi kevir bû. Ferqa herî bi Semîre xuya kir jî ew bû ku li wî gundî qesrek mezin hebû. Mala mixtêr di qesrê de bû. Gundiyên Semîre bi kurmanciyek giran diaxivîn. Kesên wî gundî bêtir bi sivikî diaxivîn. Carna peyvên ku bi wê biyan dihatin xwe didan der. Wê di cî de mehneya wan dipirsî.

Ji derî wexta bi mêvanan û bi jina mamosteyê din re dibuhurand, dixwest teşe bide lojmanê. Pîlan çêdikirin.

Roja dawetê hatibû. Êvarî li Keleha Heskîfê bûn. Her kes bi amadehî hatibû. Dixwestin surprîzekê bikin. Di dest kesan de poşetên lekî hebûn û di poşetan de jî meşaleyên destiyên wan gelek kin.

Li kelehê dawet giran bû. Govend hate gerandin. Piştî govendê her kesî meşale pê xistin û li her deverê kelehê belav bûn! Leşker hatin. Heskîfiyan nehişt ew li wir bimînin. Serbaz, baş e, ji ber ku dawet e, tişt pê nayê, ger wekî çalakî be îja bira bira em ê ji we gelekan bigirin bin çav, got û çû.

Kesî xwe li gotinên wî nekir xwedî. Li her deverî, meşaleyan şewl dida. Şeva nîvê şevê li her deverî pire pira meşaleyan

bû. Her meşale xeml, hêvî û dengek bû ji bo Heskîfê. Heya qatê şevê jî hal wanî bû.

Kêliyekê Mîralî ji nişka ve beziya; Elî, Bişar, bi tevî Xanim ji alî jêrîn ve dihatin. Mîralî hem kêfxweş bû hem jî heyirî. Li halê hev pirsîn. Xanim, "Ji te wetir me te ji bîr kir, ne?" Mîralî bêdeng ma. Xanim domand: "Elî her wext behsa te ji me re dikir. Wî xeber da me." Bişar, eniya Mîralî ramûsa û got: "Mîralî, silavên pisîka min hebû ji bo te." Mîralî bi deng keniya.

Mêvanên nû jî tevlî govendê bûn. Derengî şevê Elî, Bişar û Xanim hatin cem zava û bûkê. Xanimê çarîkek zêr bi Semîreyê ve kir. Xatir xwestin. Bi qasî pêncî metreyî dûr çûn dengê sîlehê hat! Xanimê kir qîrîn, "Elîîî!.. "Her kes ber bi wan ve reviya. Elî miribû. Halê Mîralî ne tu hal bû. Dengê Elî di guhên Mîralî de olan dida: "Tu çiqas dişibî lawê min." Mîralî, di wê kêliyê de bi hestiyarî baskên çavên Elî daxist.

Dikandarê Sûryanî bi tevî Osman, Mîralî, Semîre, mamosteyê din bi tevî jina wî û keça wî û çend gundiyan bi du texsiyan birin gund. Osman di texsiyê de pirs ji Mîralî kir:

– Te ji bo Heskîfê çi kir?

Mîralî ne li benda vê pirsê bû. Dîsa jî amade bû lewre çend caran wî jî ew pirs ji xwe kiribû. Bersiva bi vî awayî, li xweşiya Osman jî çû:

– Min tişt neda Heskîf lê ez dibêjim min gelek tişt ji bo xwe kir; ji xwe problem jî ew bû, min nikaribû ji bo xwe tiştek bikira. Min nizanibû nav li tiştan bikira. Ez dibêjim ji vir bi şûn de ezê karibim hin tiştan bi nav bikim.

Roja mayîn, Mîralî û Semîre çûn mala Şukrî. Semîre ew pêjgîra xwîna rengvekirî lê ziwa bûbû da bûka xwe. Bûka wê:

– Xwedê her û her rû li te sipî bike. Her şad û bextewar bin, got.

Mîralî û Semîre xatir ji wan xwestin. Şukrî pirsî:

– Hûn ê biçin ku?

Semîre bêdeng ma. Mîralî, em ê çend rojan li Dîyarbekirê bimînin, wê ji bo Semîre baş be, got.

Bûka Semîre got:

– Ê ji bo we baş be.

Şukrî, mîna hê jî xemên xwe neşkênandibe, li Semîre dinihêrî. Semîre bi van gotinan xwest dil li wî rihet bike:

– Em ê li wir têlefonê dayê û bavo bikin. Xem nexwe.

– Ger bavo were îmanê ê baş be.

– Xema wî ne ez bûm, gotinên xelkê kul dixist dilê wî. Tu ji min çêtir dizanî. Vêga ew xemên wî jî neman, ger ew haydar be Mîralî kurd e û mamoste ye ê tu dengî dernexe. Belkî heya wextekê nehêle em ê biçin mal.

Mîralî û Semîre bi rê ketin. Li erebeya Batmanê siwar bûn. Li tang û dûşa riya avê a veşarî nihêrî Mîralî. Peyker bi bîra wî hat. Dengê Alîta. Li Semîreyê nihêrî. Xwe bi xwe, ev e, êdî peyker jî her tişt jî Semîre ye, got.

Elî ji bîra wî nediçû. Xwe bi xwe got: "Hîç nebe ew ê êdî nekeve nav qeyranên dexesiyê. Kula lawê wî jî êdî nema di dil de, ew mirî ye, ê nikaribe kesan jî bikuje". Van gotinan ji bo teselî bide xwe got. Hîs dikir ku çîroka Elî êş dide wî.

Li Batmanê peya bûn. Li dolmîşa Dîyarbekir siwar bûn. Ew dolmîş di Silîva re diçû. Mîralî çi tiştên di derbarê Zembîlfiroş de ji bavê xwe bihîstibû ji Semîre re vegot. Semîre bi heweskarî û xweşdilî li wî dinihêrî.

Semîre bi axînekî sivik re wiha got:

– Mîralî, ez êdî bimrim jî ne xema min e!

Mîralî li çend çilkên baranê ên li ser camê nihêrî. Çilk ew qas piçûk bûn nediherikîn. Dinya sayî bû. Mîralî axivî:

– Te dîtiye baran dibare, barana kûsiyan… Behsa tiştên wanî xembar meke. Tu hê gelek ciwan î, te ji heft gulan hê serê gulekê neqetandî ye. Ez dizanim ji ber ku tu gelek bextewar î lewma wanî dibêjî lê bila peyva mirinê di derbirînên bextewariyê de tunebe.

Li Dîyarbekir gelekî geriyan. Mîralî li derdora sûrê ew gerand. Roja mayîn Mîralî ew bir ber wî kevirî. Kevirê ku

Mîralî bêton beredabû derdora wî. Li kevirî nihêrî. Semîre bi wate û bi mereq li halê wî temaşe dikir. Mîralî behsa xwe û kevir nekir. Ji Semîre re got:

– Emê li Heskîfê bi cî bibin. Ji mehê du mehan carê werin Dîyarbekir.

– Ê gelek xweş be.

Rabûn û xwe li riya postaxaneyê girtin, mîna du kesên bextewar meşiyan. Mîralî têlefonê mala bavê Semîre kir. Diya wê rahêştibû têlefonê. Semîre bi diya xwe re axivî. Ahîzeyê da Mîralî. Mîralî jî bi diya wê re axivî. Diya wê gelek kêfxweş bûbû. Di têlefonê de, hûn mereq nekin ez ê bi bavê Semîre re biaxivim, ê ew kêfxweş be, got.

Ji postexaneyê derketin. Du xort li ser dîwêr rûniştibûn. Di wê kêliyê de keçikeke gelek bedew derbas bû. Ji xortan jê yekî, te dîti qîza kurê kerê çi bedew e, got. Semîre û Mîralî ew gotin bihîstin. Mîralî bi ken bû. Ji wan bi dûr ketibûn. Semîre pirsî bê Mîralî ji bo çi dikene. Mîralî pirsa wê bi henekî bersivand:

– Niha gelek kesan ji bo te jî wanî gotiye!

– Çawa?

– Niha ji bo te jî gotine, qîza kurê kerê çi bedew e!

Semîre cara yekem bû ew qas bi deng keniya.

Mîralî dom kir:

– Tu dibêjî qey bedewbûn şerm e.

Semîre meselê ji wî re şîrove kir:

– Na, ne ji bo wê ye; tê wê mehneyê ku ew kesa bedew ê ji wan re nebe yar, mîna biqehirin ku ew a rind ne yara wan e lewma dibêjin, qîza kurê kerê!

– Semîre, tu dizanî carê min wanî gotibû:

Eşq şopê dihêle, em bi vê dizanin. Çîrokên eşqê ji bo eşqê dibin temen ev jî baş e. Lê lekeyên ku eşq li rih dihêle, lekeyên eşqê jî hene; hûn tu car naxwazin wan lekeyan bişon a rast kesên bi eşqê ketine dizanin lekeyên eşqê nayên şûştin. Kesên bi eşqê nizanibin mîna tûka li dest xwe bişon rihet in.

– Min û te li şikefta ku tê de tirb hebû me rihê xwe şuşt. Qey me nikaribû em lekeyên eşqê bişon?

– Na.

Dirustiya Mîralî di dil Semîre de bû hurmet. Mîralî ji wê pirsî:

– Ma te şûşt?

– Belê.

Mîralî mîna bi guman be li wê nihêrî. Semîre sedem der kir:

– Mîralî, min ji wî lawikî hez kiribû. Ez ê ji te veneşêrim, dû re ez haydar bûm ku ew ne evîndarê min bû ye. Ma wanî bûya piştî ew haydar bû ku bavê min li min hatiye xezebê ew ê bi dû min keta. Gerek ew bi xem bûya… Gerek lekeyên eşqên wanî werin şûştin û min jî şûşt.

Mîralî bi destê wê girt. Mîna bêriya tesadifan bike nihêrî! Poşman bû. Min bêriya Heskîfê kir, got. Carek din li sûrê nihêrî. Semîre jî li sûrê dinihêrî. Ev gotin ji devê wê derket:

– Mîralî, qey sûr lekeyên vî bajarî ne.

Mîralî di dilê xwe de, rihê min û Semîre çiqas dişibin hev, got. Xwe bi xwe pê de çû, Semîre her ku bêje jî ew nikare lekeyên eşqê bişo. Belkî rengê lekeya li dilê wê cûda be lê zor e ku ew bişo. Ew hînî hezkirina bi eşq bûye. Baş e ku ew jî bi eşqê dizane ez jî dizanim. Baş e ku lekeya eşqê li dilê wê jî heye li dilê min jî heye, zewacên wanî ê şîrîn bin. Lê li dilê me yekê leke hebûya û li dilê a din tunebûya, wê çaxê wê karê me zor bûya!

Sê sal bihurî bûn. Rojekê Mîralî û Semîre bi tevî dergûşa xwe li Amedê bûn. Rojek ji rojên biharê bû. Mîralî Semîre bir ku ditaştê de kezebê bixwin. Mîralî êdî mişteriyê wê xwaringehê bû. Çawa ketin hundur bi kurmanciyek bi darblêdan, bi dengekî stûr lê şîrîn ew pêşwazî kirin. Ne hewceyî gotinê bû ku bipirsiyana bê Mîralî çi dixwaze. Mase ji bo wan amade kir xwediyê xwaringehê û çû.

Li ser maseyê rojnameyek rojeva wê derbarê qewimîn û jiyana li welatê kurdan bû lê bi tirkî dihat weşandin hebû. Mîralî bi sayakî nihêrî. Rojname da aliyekê. Li rûpela pêşî, bi kurtenûçeyek kulturî hebû. Kurtenûçe wanî bû:

“Romana ku mekanê wê Heskîf e li Fransa nav û deng da.” Mîralî di rûpela çandê de berdewamiya nûçeyê xwend. Nûçe bi wêneyê Alîta hatibû çapkirin. Mîralî nûçe bi baldarî xwend:

“Nivîskara Frensî bi yekem romana xwe nav da. Alîta, di romanê de eşqa du kesan honandiye. Mekan Heksîf e. Di romanê de carek din rastiya peyaman bi bîra însanan hatiye xistin. Nivîskar di hevpeyîvînekê de ji bo Heskîfê gotiye, ji bo eşqê biçin Heskîfê, biçin da Heskîf bibe parçeyek ji jiyana we û hûn karibin li Heskîfê xwedî derên.” Di romanê de însan bi awayekî, carek din li xwe mukir tê ku di her kêliyekê de însan peyamekê bi dest dixe lê bi ser guhê xwe ve dike. Di dawiya romanê de nivîskar ji devê lehengekî xwe pirsek ji her kesî kiriye:

“Hûn ê karibin jiyana xwe, bi çend gotinan bi nav bikin?”

Ji dilê Mîralî hat wê nûçeyê jê bike. Gotinên Semîre bi bîr anîn, Semîre ji wî re wiha gotibû:

“Mîralî, ê tu car dilê min li te sar nebe.”

Mîralî carek din li wêneyê Alîta nihêrî. Rojname da aliyekî û li bîbikên çavên Semîre nihêrî. Di wê kêlîkê de dixwest bedena wî bibe tiştek û di bîbikên çavên Semîre de bên veşartin.

Rabûn. Bi nav sikakan ketin. Li hewa ew kevirê di sûrê de bi ber çavên Mîralî ket. Kevir li hewa difiriya. Dengê kevir mîna xişîna pelan be, bi ber guhê Mîralî diket. Kevir ji Mîralî re digot:

– Mîralî, te xwîn li min jî şîrîn kir. Ez diçim ser ewrên dişibin pembû û kefa sabûnê. Li wir, tu û Alîta hene. Ji wir jî ezê biçim Heskîfa li cihekî din. Hûn aniha nikarin biçin wê deverê. Li Heskîfa ku ezê biçimê darên hejîr, tû û rezê tirî jî hene. Tu û Semîre li wir in. Cihê dawî ezê biçim tu û Esma li wir in; her dever av e û darên qajê û mandalîn li ser avê şîn hatine…

Mîralî, her evîn rihekî din diafirîne û dişîne jiyanekê. Evîn ne henek e, rihekî din diafirîne… Ji derî rihê di bedena te de, sê rihên te ên din hene…

Nameya Esma

Ez im; yekem delalya li ber dilê Mîralî. Çi bû bi min? Çi bi serê min de hat?

Divê hûn bizanibin ez jî, aniha, evîndara yekî me! Însan carekê hînî evînê bibe zor e ku bêyî evîn bijî!

Evîndarê min yekî çil û pênc salî ye. Na, wî kir û nekir ji dest min nefilitî. Min ji wî hez kir. Roja ku min ew dît, di cî de, dilê min li wî germ bû; di nav saetekê de min ew ramûsand! Ne bavê min ne jî diya min bêxatiriya min kir.

Kurdekî kafkasî ye. Ji wanê pisîkek anî ye. Pirî caran ez û ew, kalepîrek şêst salî bi tevî kalemêrek şêst û du salî em li bexçe lîstikên zarokan dilîzin.

Zilamê min hem helbestvan e hem jî mereqdarê lîstikên zarokan e. Gelek lêkolînên wî hene di derbarê lîstikên zarokan de. Di zarokatiya xwe de wî û kalikê xwe, gelek caran, lîstikên zarokan lîstine. Kalikê wî, di zarokatiya xwe de, koçî Kafkasyayê bûye. Di salên şer de, lîstik wekî xem maye di dilê kalikê wî de.

Jiyaneke me ya însanî û hunerî heye. Belkî hûn bawer nakin lê carekê me li bexçe lîstika 'birê' lîst! Îjar ew kalemêr neçar ma min li pişta xwe bike.

Zilamê min, bi carekê be jî, li pişta min siwar nebûye; hîle dike! Her carî hîle dike da ez li pişta wî siwar bim.

Kalik û pîrejin gelek bextewar in. Her carî zarokatiya xwe

bi bîr tînin. Her ku bi bîr tînin çîrokekê ji me re vedibêjin. Em jî çîrokên zarokatiya xwe vedibêjin.

Carekê zilamê min gote min, gerek ev halê me bibe senaryo û wekî fîlm bête kişandin.

Min tu car Mîralî ji bîr nekir. Lê min evîna wî û xwe nekir êş jî; li bin dara mandalînê, me soz dabû hev; ger rojekê em ji hev veqetiyana û mirazê me nebûya wê tu car em xemgîn nebûna. Ez hê li ser soza xwe me.

Ez ê ji we veneşêrim, min çend helbest jî lê kir bi saya mêrê xwe! Na, ezê helbestên xwe ji bo we lê nekim. Bila Mîralî bizanibe rihê mêrê min çi rih e! Bila bizanibe mêrê min jî dizane ji keçikekê hez bike.

Ez im Esma! Min soz daye Mîralî, ezê tu carî evînê li xwe nekim derd û kul; min îro pelek avêt hewa. Pel ber bi asîman ve firiya. Nizanim, wê pel li hewa bibe çi, wê çi bêje ji min re!..